KURDÊN LI ALMANYAYÊ / Dİ NAVBERA ÎNTEGRASYON Û JİXWECİHÊKİRİNÊ DE • Reşad Özkan • ▶ 18

MEXMÛR / Gelo ya li ser tê nihurandin netew e?
Lokman Turgut • ▶ 15

Piştî Auschwitz'ê nivîsandina helbestê
Doğan Akhanlı • ▶ 3

LE MONDE diplomatique kurdî

Almanya: 3,50 Euro
Welatên din: 4,00 Euro

Çile 2010 - Hejmar 3 www.lemondediplo-kurdi.com · info@lemondediplo-kurdi.com 32 Rûpel

Gelo Amerîka dikare biguhere?

SERGE HALIMI*

Şerrên siyasî carinan gellekî bi kêrî muxalefetên şexsî û dijberiya adetî tê. Pêdiviyên şerrê çekdarî dibin sedem ku gellek hêzên cuda ku armanca wan yek e û hilweşandina heman neyarî ye, pişta xwe bidin hevûdû. Çerr ku pişta dijmin bişkê jî, serêşî ji wê û bi şûn ve dest pê dikin. Û bi van sereşiyan re jî, pirsek tê: Îcar em ê çi bikin? Di encama tercîhên siyasî de, cudabendiyên ku dibûn sedema helwêsta muxalefeta kevn divê ji holê rabe; lê, kes bi têgihiştineke weha razî nîne. Êdî demeke dirêj raqîbê ku kes jê hez nake nikare vegere desthilatdariyê. Şerrê wî yê bi muxalefetê re ew şêrîntir nake.Şemayeke bi vî rengî li Îtalyaya Birêz Silvio Berlusconi jî hatibû dîtin. Di sala 1995'an de, Berlusconi li hember çepgirên belawela û bêbername û proje têk çû, lê belê şeş sal paşê dîsa bi ser ket û vegeriya ser hukim. Di van demên dawîn de, li Fransaya Birêz Nicolas Sarkozy jî hevgirtinên li gora rewşê pirr dibin, carinan di nava partiyan de (ekolojîst, navendî, sosyalîst), carinan jî di nava kesayetiyan de. (Gava ku daxuyaniyeke li dijî hikumetê hebe, Birêz Diminique de Villepin xwe dide tengala Birêz Oliver Besancenot ku ev herdu kes ji binî ve dûrî hev in (1)). Armanceke hevpar. Serokkomar. Baş e, lê bi dû re?

Koalîsyona ku li ser lingan ava dibe, siyaseta nezelal, hêvîşikestinên ku hesabê wan ji berê de diyar e rojeva Amerîka tîne bîra mirov. Salek berê, gava ku komarparêzan ji adetê derxist û dawî li serokatiya Birêz George W. Bush hat, hin hevgirtinan xwe nîşan da. Herçend beşekî rayedarên ku rewşa wan baştir nebûye hê jî piştgiriyê didin Birêz Obama, xuya dibe ku heyecana wan kêm bûye. Gurrbûna şerrê li Afganistanê pasîfîstan xemgîn dike, reforma sîstema tendurustiyê gellekî dûrî hêviyên maqûl maye, û siyaseta wargehê jî herweha ye. Fikra *"ne zêde baş e, lê belê ji tunebûnê çêtir e"* di nava xelkê de belav dibe û dibe sedema acizîyekê. Heyecana siyasî ji nû ve berê xwe diguhere.

Rewşeke weha ku hêzan ber bi hev ve tine, pişta lobiyan xurttir dike, lê herweha pirsan jî di derheqê desthilatdariya serokê Amerîkayê ya rasteqîn de dide peydakirin. Ew ne Birêz Bush e, herkes dizane; Birêz Romano Prodi jî nebûbû Birêz Berlusconi. Lê hê mirov baş nizane bê berê Birêz Obama bi ku ve ye û ev jî dibe sedem ku heyecana ji bo wî kêm bibe. Lê belê, welat di nava pirsgirêkan de ye: Rêjeya bêkariyê firriya ye, li hin taxan xaniyên li pey hev seranser ji ber deynan ketine ber hacîzê. Serok tim behsa van

** Edîtorê Le Monde diplomatique*

▶ 6

AŞÎTÎ

Di navbera taktîk û çareseriyê de!

FAYSAL DAĞLI*

Bahram Hajou, (Return of icarus -women-)
(Derbarê hunermend de rûpel 7)

Di çend salên dawîn de konflîkta Kurdistanê ya li nav sînorên siyasî yên Tirkiyeyê ji gelek merheleyan borî. Di demên dawîn de ev konflîkt berbi 'pirsgirêka aştiyê' ye ewule bûye. Belê, niha di navbera tirk û kurdan de pirsgirêka aşitiyê qewimiye. Niha li navekî digerin ku li 'proseya aştiyê' deynin.

Di tecrûbeyên mînak de jî hatiye dîtin ku di serpêhatiyê konflîktên wiha de 'pirsgirêka aştiyê' belkî ji ya şer girantir û aloztir derbas bûye û ew qeder niha di nav tirk û kurdan de jî rûdaye. Ji nîqaş û bûyerên dawîn yê aliyê tirk û kurd diyar e ku wê proseya aştiya vê konflîktê jî ji şerê navbera herdû aliyan girantir û aloztir derbas bibe.

Piştî xesarên mezin ku vî şerî daye kurd û tirkan, niha konflîkt gihîştiye merhele ya axaftina li

** Edîtorê Le Monde Diplomatique kurdî*

▶ 2

ser aştiyê! Ger dûbarekirin pêwîst be; ''axaftina li ser aştiyê!'' Ne aşîtî û ne çareserî bi xwe!

Aşîtî di konflîktên wiha de di navbera şer û çareseriyê de pir a herî hassas e. Civakên ku bi hêzên xwe yên zînde nêzîkî 30 sal in li dijî hevûdû şer dikin, wê çawa li hevûdû aşt bibin? Li welatekî ku pergala desthilatiya dewleta wê li ser têgeha 'afirandina dijmenekî û îmhakirina wî dijmînî' hatibe honandin aşîtî ewçend wê hêsan be? Ji bo tevgerekî netewî ku xwe wek ''rêxistina şer'' binavbike aştbûn wê çiqas guncaw be?

Niha tirk û kurd piştî şerekî dirêj bahsa aştiyê dikin. Lê belê ji ber ku aştiya dixwazin, tarîf nakin, pirsgirêka aştiyê derdikeve holê. Hikûmet û rewşenbîr jî di nav de aliyê tirk heta niha rêya aştiyeke negatîf nîşanê kurdan dide. Ew dixwazin aliyê kurd şîdetê rawestîne, yanê çekên xwe berde, ji çiya dakeve, teslîmê edaleta dewletê bibe û li benda rehma dewletê bisekine. Lêbelê heta niha di derbarê rewş û mercên ku şîdeta kurdan afirandiye de tiştekî biberçaw nîşan nedane. Ji bo hin entelektuelên tirk, ew helwesta hikûmetê jî gavekî êrenî ye. Ji ber ku heta niha formulasyona çareseriya konflîkta Kurdistanê ya siyaseta tirk wiha bû: ''Heta terorîstê dawîn jî bê kuştin!'' Niha guheriye: ''Bila terorîst çekên xwe deynin û ji çiya dakevin,'' li gor wan ev argûment jî guherîneke girîng e. Ji bo akademîsyenan jî ev yek yanê tasfiyekirina şîdeta aliyê kurd û xwesteka xwedîbûna monopola şîdeta dewletê rasterast hewldana ''aştiya negatîf e.''

Di tecrûbeyên dîrokê de diyar e, ku di pirsgirêkên civakî û etnîkî de aştiya pozîtîf yanê li gel tasfiyekirina hemû cûre şîdetê, faktorên ku şîdetê afirandine jî ji holê nayê rakirin, pirsgirêk bidawî nabe. Şîdet û klîmaya şîdetê demekî din dîsa derdikeve meydanê. Gelek polîtologan di teoriyên xwe yên li ser şîdetê de sankî strûktûra dewleta tirk tarîf kirine ku ew pergal çawa sê cûre şîdeta sereke bi aheng bikartîne. Şîdeta rasterast ya dewletê ji alî şîdeta çandî û şîdeta pergala siyasî ve tê xwedîkirin. Ji ber ku dewleta tirk li ser xesbkirina mafên netewî yên kurdan hatiye damezirandin, her neçar e daxwazên netewî yên kurdan bi şîdetê înkar û îmha bike, ji bo yekê strûktûra xwe li ser yasayên şedîd dameziraniye û ji bo parastina van yasayan jî şîdetê bikartîne. Di



Nifteya aştiyê! - Illustration LMD kurdî

fikir, îfade û kiryaran de şîdeteke sêkolî bikartîne. Ne wiha be, 'wê asasê dewletê xerabibe û dewlet perçebibe.' Ji bo dewlet perçebene divê mêjî û laşê kurdan bê perçekirin. Ev formul li Tirkiyeyê ji sinifa yekem ya dibistana serete heta mirinê di mêjiyê her hemwelatî de tê kolan. Ji ber vê yekê tirkekî ji rêzê her yek stranekî dizane; ''Elhamdulillah hepimiz Türk'üz / Elhamdûlîlah em hemû tirk in!''

...

Dema mirov di vê çarçovê de li şerê navbera tirk û kurdan temaşe dike, dibîne 'aştiya negatîf' ya ku wek ''tasfiyekirina şer'' tê zanîn û wiha tê nîqaşkirin esasen dibe rêyeke din ya berdewamkirina pirsgirêkê. Ji ber ku yê diqewime ne şerê navbera dû dewleta ye, şerekî navxweyî, şerekî civakî, şerekî çandî, şerekî netewî ye. Pisporên aştiyê dema ku ji pirsgirêkên navxweyî-civakî-netewî re li çareseriyekî digerin, bahsa aştiya pozîtîf û negatîf dikin. Ji bo çareseriya pirsgirêkeke wiha jî yek rê tenê heye: Bi hemû naveroka xwe aştiya pozîfîf!

Yanê ne tenê çekberdana aliyekî an jî bidawî anîna şîdeta serhildêran, bidawî anîn û rakirina rewş û mercên ku dibe sedemê serhildan û şîdeta serhildêran gerek e. Di hemû nexşereyên heman serpêhatiyan de deriyê xezîne ya aştiyê bi van peyvan vebûye: Wekhevî û edalet, ji bo herkesî!

...

Li aliyê din çavderên pirsgirêkê dizanin ku êdî mesele ne di navbera Dewleta Tirkiye û Partiya Karkerên Kurdistanê de ye, lêbelê di navbera civaka tirk û kurd de ye jî. Leşker û gêrîlla êdî ne tenê li ser navê xwe, li ser navê hêrsa civaka xwe jî şer dikin. Xeter jî ji vir destpêdike. Li cîhekî ku kanalên axaftinê têkdiçin, şer êdî berwarî ye, yanê hemû civak ketiye nav avzêla şîdetê û her cûre têkiliya navbera civakan ji aliyê şîdetê ve hatiye dîlgirtin. Ji ber vê yekê jî êdî li kolanên Tirkiyeyê lînckirina kurdan an jî kuştina zarokan ji alî hêzên dewletê ve, an jî molotofkirina dikan û seyarayen ji alî gêncên kurdan ve destpêkiriye. Şîdet ji çiya û zindanan daketiye kolanan û ne tenê kes û hêzên fermî, hemwelatî jî mafê bikaranîna şîdetê ji bo xwe rewa dibînin. Dema ku bi vî awayî li meselê neyê temaşekirin, ne axaftinên li ser çekberdana gerîla û daketina ji çiya ne jî efûkirina wan an jî serbestberdana Birêz Öcalan meseleyê çareser nake.

...

Ji ber di konflîkta Kurdistanê de strûktûra dewleta tirk fail e, yanê sebeb û kirdarê pirsgirêkê ye di axaftina li ser mijarê de jî berê tîrê ber bi xwe ve dikşîne. Gelo çima dewleta tirk di sedsala 21'an de di vî şerê ku hemû nirx û serweta wê mehû dike de bi israr e? Çima heta niha jî ''înkara kurdan'' di yasayên vê dewletê de bi hemû rûyên xwe cîh digrin û artêşa tirk ji bo ''îmhakirina kurdan'' heta niha jî ji ya xwe nehatiye xwarê? Çima di proseya axaftina li ser aştiyê de cesedê gerîlayên kurd li pişt panzeran girêdide û kaşdike û dîmenê vê kiryara xwe li cîhanê belavdike, çima polîsên tirk siyasetmedarên hilbijatî yên kurd li pişt hevûdû rêz dike û weneyê wan yê kelepçekirî li medyayê belavdike? Çima partiya qanûnî ya kurdan -ku nikare xwe wek 'partiyeke kurd' jî binavbike- tê qedexekirin û aşîtîxwazekî wek Birêz Ahmet Türk ji meydana siyasetê tê avêtin?

Û bi îzna we çend pirsên din;

Di meclîsa Tirkiyeyê de mebûsekî bi kurdî bahsa budçeya kêm ya bajarê xwe bike an jî zarokekî kurd bi zimanê xwe di dibistanê de fêrî matematîkê bibe an jî navê ''Diyarbakir'ê'' bibe ''Amed'' wê çibibe? Ger polîsekî tirk dema guh li straneke kurdî bike yekcarî destê xwe navêje demança xwe, ger leşkerekî tirk dema rengên keskesora kurdan bibîne bê hemdê xwe ne vecinîqe wê çi bibe? Wê asîman werin xwarê? Wê tsûnamî rabe? Wê zivistana nukleer biqewime? Wê tofana Nûh dûbare bibe?

Çima li vî welatî De Gaulle'kî dernakeve? Çima ev pevçûnên ku êdî bûye ''şerên xaçparêziyê'' nikare bi dawî bibe? Tirk û kurd ne layiqê aştiyê ne? Xwediyê projeyên 'vebûnan' Serokwezîr Birêz Erdoğan wê heta kengê li dervayê mîndarê gulaşê bike?

...

Bersiva van pirsan ji bo ku psîkolojiya aliyan dide der, giring in. Belê, dû aliyên ku 30 sal şerê hevûdû kirin, divê berî hertiştî ji nefreta xwe xelas bibin. Ne hêsan e ku du civakên salên dirêj ji bo mehûkirina hevûdû têkoşiyabin zû bi zû werin rûyê hev. Hingê tecrûbe rêyekî nîşan dide, divê aqil û ûcdan derkeve pêş. Aqil û ûcdan jî rêya terapiya civakî nîşan dide! Tîpa yekem yê alfabeya terapiyê jî, ji holê rakirina stûktûra şedîd ya dewletê destpêdike. Ne tênê dewlet hêzên xwe yên ewlekariyê ji dewreyê derxîne, ew bingeha ku hêzên xwe berî sînga kurdan dide divê ji holê rake. Hingê axaftina li ser aştiyeke pozîtîf mimkûn dibe. Yanê strûktûra xwe ya ku li ser şîdetê hatiye damezirnadin ji holê raneke û bingeha edaleteke mayinde ne damezrîne, wê ev pirsgirêk hîn gelek bajo.

Dema mirov li vî aliyê meselê temaşe dike, tiştê ku li holê ye ne 'pirsgirêka kurd e', bileqs 'pirsgirêka tirk e.' Ji bo ku tirkekî bi cîranê we yê kurd re aşt bibe, divê terapiya aştiyê bibîne. Di konflîktên wiha de terapî çawa dibe, ew karê pispora ye. Ger Kurdistan û Tirkiye wek Cezayîr û Fransa wek Hollanda û Endonezya wek Kongo û Belçîka dûrî hevûdû bûya mimkûn bû ku ew merhele ewçend dirêj û aloz najota, ger aqil û strûktûra dewleta tirk wek ya Îspanya an jî Brîtanya bûna belkî ev konflîkt jî wek ya Euskadî û Îrlanda bi awayekî çareser bibûya. Lê diyar e ku ne Kurdistan û ne kurd ne ji Tirkiye û tirk nikarin ji nexşeyê barbikin û biçin cîhekî din!

...

Realîte cuda ye, berî ku li ser xaka Tirkiye û Kurdistanê şerekî berbilav û germ di navbera aliyan de biqewime divê taktîkên bi navê aştiyê ku rasterast hewldanên tasfiyekirina aliyê din e, bê terikandin. Ji tecrûbeya 'proseya vebûnên' Hikûmeta AKP'ê jî ev yek têra xwe derdikeve holê. Hêvî û xeyalên aştiyê ya navbera tirk û kurdan de gelek car şikest xwariye, lê hîn jî zindî ye. Ji bo ku kevoka aştiyê cara dawîn û heta hetayê asîmanên vê xakê neterikîne, divê pîroziya aştiyê neyê lewitandin. Herwiha aşîtî ewçend karekî cidî ye ku pergala sitemkar ya dewletê nikare ji binê vî barî rabe û divê ûcdanê civakê vê rolê bilîze. Ez naxwazim vê hevokeke wiha bidomînim: Mixabin ûc-dan ku di dilê însan de ye û dilê însan jî di laşê însan de li aliyê çepê ye û çepê Tirkiyeyê jî riziyaye, niha ji bilî Godot di destê me de tiştek nîne! Ez dixwazim bêjim ku; divê mirov berê xwe ji dîroka xwînî û lewitî vegerîne û ji pêşerojê hêvîdar be. Teyrên aştiyê li ser Tirkiye û Kurdistanê jî digerin!

PİŞTÎ AUSCHWITZ'Ê NIVÎSANDINA HELBESTÊ:

"Kurda ra Azadî!"

DOĞAN AKHANLI*

Bahram Hajou, (Holocaust) - Efekt LMD kurdî

Di sala 1996'an de hevala min beşdarê geryaneke perwerdeyê bû û çû Auschwitz'ê. Dema ew vegeriyabû, bi rojan bi ser xwe ve nehatibû. Tim û tim bahsa kûlîlkên gulesoran ku li seranserê kampa tûnekirinê şîn hatibûn kir. Bahsa îşkenceya mehekê ku di sala 1985'an de me bi hev re dît, kir û got "me serpêhatiyên xwe gelek girîng didît!"

Eger ez ne şahidê serpêhatiyên bi serê me ve hat bûma, ev axaftina di navbêra me de derbasbû wê ewçend min nehajanda. Min dizanî ku qiyas bi êş û azarên şexsî nayê kirin. Lê belê eger jinek ku di dirêjahiya mehekê de bi tevî mêrê xwe û zaroka xwe re êşkence dîtiye, law bêhiş ketiye, bi xwe giran birîndar bûye û rakirine nexweşxanê, bi tevî jan û bîranînên ku heta sax be wê were bîrê,serpêhatiyên xwe li hemberî tiştên li wir hîskiriye biçûk dibîne, wê çaxê diviyabû ew devera ku jêre Auschwitz tê gotin li cem min jî wateyeke xwe hebûya.

Êdî rêwîtiya min a ku hîn jî neqediyaye ya li demboriya Almanya ku bûye welatê bîrhatinê, dest pê kir. Min serdana kampên tunekirinê ku hemû veguhezîne xanî, qebrên mirinê û bîrhatinan kir. Weke mînak, ez çûm kampa komkirinê Sachsenhausenê ya li nêzî Berlînê ku di Sibata 1943'an de li ser daxwaza aliyê tirk, Gerînendeyê

* Nivîskar

Asayîşê yê Stenbolê Nihat Haluk Pepeye û Selahattin Korkud gereke lêkolînê lê kiribûn (1). Ez çûm kampa komkirinê ya jinan Ravensbrück'ê ku di 26'ê Cotmeha 1943'an, de di nav de sê zarok 12 jinên Museviyên tirk hatibûn sewkkirin (2). Ez çûm "Bîrhatingeha Konferansa Wannsee" ya li Postdamê.

Bingeha pîlana Naziyan a "Çareseriya Dawî", di 20'ê Çileya 1942'an de di konferanseke de hate danîn. Di belgeyên konferansê de ku di dîrokê de weke "Protokola Wanssee" tê zanîn, biryar hatibû girtin ku 11 mîlyon cihûyên Ewrûpayê bên îmhakirin. Belge ji aliyê Adolf Eichmann ve hatibû nivîsandin ku di sala 1962'an de li Qûdsê hat darezandin û dardekirin. Belge di sala 1947'an de, di nav dokumentên Wezareta Derve de hatin dîtin. Di rûpela şeşemîn a wê belgeyê de lîsteya şêniya cihûyên Ewrûpayê cîh digirt. 200 cihûyên li Arnawûtlukê jî nehatibûn jibîrkirin. Herweha 55 hezar cihûyên li Tirkiyeyê yên li alî Ewrûpayê jî ketibûn ber pîlana îmhakirinê. (3)

Her ku derbarê jenosîda cihûyan de agahiyên min zêde bûn, serê min bêtir tevlî hev bû. Mesela cihûyên li Tirkiyeyê ku tunekirina wan dihat pêşdîtin, mesela sinetkarekî li Tekirdağ'ê û zarokê wî yê nû-welidî yê ji şer bê xeber, çawa dikare berjewendiyên Almanyayê bixe xeterê? Min li ser vê pirsê mejiyê xwe pir êşand lê min bersiv nedît! Di devê xelkê de bibû benîşt ku alman milletekî rasyonel in, lê belê rasyoneltiya tûnekirina cihûyên Ewrûpayê li kûderê bû? Berî hertiştî komeke însan çawa fikra tûnekirina mirovên li ser rûyê erdê yên wan cûda dibînin, çêdikin? Min wêneyên beşdarên konferansê yek bi yek vekola, lê ez belasebep li bersiva pirsa xwe digeriyam. Rûyê wan rûyê mirovên normal bûn. Saw ket dilê min. Hîna li pêş min rêyeke dirêj hebû.

Piştre diviyabû min rêwîtiyên di vagonên hewyanan de ku Jorge Semprun di "Rêwîtiya Mezin"(4) de bahs dikir, yên bi şev û rojan dewam dikir, yên ji birçîbûnê, ji bê aviyê, bê nefesiyê li ser pêya dimirin, li dawî bihişta, li Chelmno yan jî li Belzec'ê bi gaza yan jî Treblinka'yê bi karbon monoksîtê, li Majdanek yan jî Auschwitz'ê bi Zyklon-B'yê re bihatama fetisandin û kuştin, li krematoryuman vegûhezyama xwelî û dumanê.

Piştî ku min Navenda Gestapoyê ya li Köln'ê dît gelekî piştre, ez hîn bûm ku ermeniyeke bi navê Grigorie Baisonasch di 19 Kanûna 1944'an de ji aliyê Gestapo ve hatiye kuştin. Yek ji rawestgeha rêwîtiya min a li paşerojê, yek ji kampên komkirinê yê herî mezin a li Polonyayê li nêzî bajarê Lublin'ê Maydanek bû. Hey ku ez çûme heta wir, ez çûm ziyareta Sobibor'ê jî ya li nêzî bajarê Wlodawa ku tenê û tenê ji bo tunekirinê hatibû avakirin. Rêyeke trênê di nav daristanan de li deverekê bi dawî dibû. Nîşana tenê ku li wê derê kamp heye ev e. Ji bo bîranîna qurbanan abîdeyek hatiye avakirin, ne ji girê bi xweliya qurbanan hatiye avakirin be, ne mumkîn e mirov xiyal bike ku wê derê Sobibor'a lê 250 hezar mirov lê hatiye kuştin. John Demjanjuk (89) ku di van rojan de li Almanyayê li Dadgeha Eyaleta Munîhê dadgeha wî dewam dike, yek ji gardiyanên bê rehm ê kampa kuştinê bû. Di wan salan de tişta min derheqê Sobibor de tenê dizanî, fîlmeke xirap a bi sernavê 'Ji Sobibor'ê Rev"(5) bû.

Bi rastî jî rev û berxwedana herî mezin a ji kampên mirinê û komkirinê li vê derê çêbûye, 365 girtiyên ku di nav wan de Thomas Blatt (82) jî hebû, reviyabûn û di dawiya şer de tenê 47 ji van sax mabûn. (6) Berxwedana din a çeleng Berxwedana Gettoya Varschova bû ku piştre rêya me lê ket. Rexnekarê ji Gettoyê sax xelas bûye Marcel Reich Ranicki ku li Almanyayê weke ''Papayê Wêjeyê" nav daye, dinivîsîne ku Berxwedanvanên Gettoyê, Berxwerdanvanên ermeniyên li Çiyayê Mûsa (7) çil rojan li ber xwe dane, mînak girtine. (8)

Piştre piştî ku cîhan veguhezî sedsala nû, ez çûm Auschwitz'ê. Ez ji deriyê li ser "Arbeit macht frei / Xebat Mirovan Azad Dike" nivîsandî derbas bûm. Min gav avêtibû cîhekî ku diviyabû ne aîdî vê dinyayê be.

Dûre sal derbas bûn. Lê hîna jî min bi hezaran çente, bi sedhezaran pêlav, bi mîlyonan tayên poran ên ji qurbanan dawî mane jibîr nekir. Min ew agahiyên li ser gaza Zyklan-B jibîr nekir; ji ber ku ji krîstalên rengeşîn pêk tê, jê re her wiha 'asîta şîn' jî tê gotin, gava bigîje hewayê, eger germahî 26 dereceyan derbas kiribe vediguheze gazeke jehrî û mîlîgrameke wê dikare gelek însanan bikûje. Gava ku min bîhîst li Auschwitz'ê di sala 1942an de, 7.5 ton, di sala 1943an de 12 ton asîta şîn hatiye şandin, min hewil dabû bihesibînim ka 12 hezar ton çend însan dike? Şermeke nayê efûkirin kumişî nav dilê min. Min jibîr nekir ku min dixwest bigrîm, lê nikarim bigrîm, dixwest birevim, lê nikarim birevim, dixwest bisekinim, lê nikarim bisekinim. Ez çûm serdana bloka mirinê ya numara 11'an, min jibîr nekir. Min jibîr nekir ku di odeyên gazê de difetisîm, di hûcreyên tarî de kor dibûm, di krematoryuman de dibûm xwelî. Min jibîr nekir dema pêşandana poran di nava min de rûnişt, dema min di nava xwe de dikir miremir ku guneh e por ji pêlavan, ji baholan, ji berçavkan, ji diranan cûdatir were pêşandan. Ez bê xweda bûm, lê min jibîr nekir dema difikirîm ku hedimandina poran wê bibe xêr. Dema ku ez gîhiştim Auschwitz-Birkenau'yê ya sê kîlometre dûrî devera jê re tê gotin"Auschwitz -I", dema ez ji merdîwenên biryargeha ku bûroya fermandar Rudolf Höß jî tê de ye û dîlên cihû, çingene, polonî û dilên şer ên rûs bi trênan derbas dibûn, derdiketim jor, min biçûkbûna odeyan û bi tevî ku dawiya wî hebû jî, ji jibîr nekir ku ji qata jor ve bê dawî xûya dikir kampa mirinê. Piraniya holikan riziyabûn. Li dawiyê kulekên ji tûxlayên weke sawêran diliviyan mabûn, min wan jibîr nekir. Kulekên ji tûxleyan ber bi asoyan ve dirêj dibû, min jibîr nekir. Ez di bin deriyê mirinê re derbas bûm. Di noqteya ku rêya trênê vediqetiya û dibû dido, li wir sekinîm, cemidîm û mam. Min jibîr nekir ên ji vê hêlê dadiketin diçûn odeyên gazê, yên ji aliyê din dadiketin paşê ji odeyên gazê re dihatin şandin. Holikên roman û sintiyan, avahiyên ku zarokên Rudolf Höß lê dijiyan, dara spîndaran a li cem holika jinan min jibîr nekir. Ez ber bi peykerê bîrhatinê yê nikarî bahsa tiştekî bike dimeşiyam, her ku dimeşiyam, deriyê mirinê yê di bin de derbasî mirinê dibû mezin dibû, min jibîr nekir. Min jibîr nekir ku min xwe, raboriya xwe û ramanên xwe gelek xerîb didît. Min jibîr nekir ku hêrs û kîna min bê armanc bû. Min jibîr nekir ku têgehan wateya xwe winda dikir û têgehên Nazî, cihû, çingene, polonî ji nişkê ve bahsa tiştekî nedikirin. Min jibîr nekir ku hestên min ên kerbê û rehmê diqediyan. Ez ne di ferqa wê de bûm ku piyên min ji erdê qût dibûn, gelek dûr ber bi tariyê ve berba dibûm û "ez"ê li dawiyê mabû jî vedigûhezî aferîdeyeke bê hedef, neçar û belengaz, li cîhê rêya trenê diqediya geh wirde diçû geh dihat, winda dibû, lê belê di nav xwe de winda dibû. Min jibîr nekir ku ji aliyekî ve dijî Xwedê radibûm ji aliyê din ve, min xwe diavêt Xwedê. Min jibîr nekir wexta difikirîm Auschwitz madebên çûk û çivîkên şîn û sipî yên serjêkirîne ye. Li cîhê rêya trênê dibû dido, ez ji nişkê ve ji mirovbûnê tirsiyabûm û ber bi dûr ve berba bibûm. Ez ji Auschwitz'ê weke mirovekî ji nû ve trawma derbaskiriye vegeriyam. Min sond xwar ezê careke din lingên xwe navêjim Auschwitz'ê. Lê dîsa jî çûm. Min nexwest stûxwariyê ji tewanê herî sîstematîk ê li hemberî mirovahiya sedsala 20. hatiye kirin re bikim. Vê carê ez ne tenê bûm. Dema di sala 2006'an de çûm, li cem min hevalên min ên çingene yên kal û pîrên wan li wir jiyana wan bi dawî bûbû, hebûn. Hevalên min ên alman ên kalik û pîrên wan ku tevlî sûc û tawanan bibûn hebûn. Hevalên min yûnan hebû yê kalikê wî yê mezin ji İzmîr'ê û bapîrên wan li Auschwitz'ê can dabûn. Hevalekî min ê ji Edenê li ser daxwaza bavê xwe li Auschwitz'ê nimêj dikir, pê re hevaleke min ê din hebû ji İzmîr'ê bi tevî ku bê dîn jî bû pê re nimêj dikir.

Ez du carî çûm serdana Îsraîlê ku ji aliyê kesên ji Holocaust'ê sax mane ve hatiye avakirin. Ez bi çavdêriyên erênî û neyênî vegeriyam ji wir. Lê belê min ferq kir ku li hemberî gefên kesên weke Ahmedînejad yên ji holêrakirina Îsraîlê ji nexşeya cîhanê, li hemberî argûmanên antî-semîtîzmê, li hemberî kesên ku siyaseta ehmeqî ya Îsraîlê bahane nîşan didin û Îsraîlê nasnakin, Îsraîl jî nikare ji wan re tahamûl bike. Bi tevî ku mafê hebûna Komara Tirkiyeyê, ji aliyê rêxistinên radîkal ên dixwazin wê têk bibibin ve nayê lêpirsîn, lê belê bi tirkî 'înkarkirina mafê hebûna Îsraîlê' gelekî hêsan e.Weke sedem jî tê nîşandan ku Îsraîl wek gelek dewlet-netewan bi xwînê hatiye damezirandin. Lê belê jibîr dikin ku Komara Tirkiye li ser qelandina koka Xiristiyanan, înkarkirin û qetilkirina miletê kurd hatiye damezirandin. Bi tevî ku Îsraîl ji roja hatiye damezirandin û vir ve di şer de ye û hawirdora wê bi welatên ereb ên ku Îsraîlê înkar dikin ve pêçaye gelek efser ji nav Îsraîlê derdikevin ku êrîşa hedefên sîvîl naxwazin. Lê belê mixabin di şerê li hemberî kurdan de heta niha efserekî tirk ê wiha derneketiye. Her wiha ji leşkerên xwe yên PKK'ê teslîmî dewletê kirin re jî muamelaya "xayînên welat" layiq dîtin.

Eger kesek ji min bipirse "tu ji Auschwitz'ê çi hîn bûyî", ez dizanim ezê çi bersivê bidim:

Auschwitz'ê fêrî min kir ku bi jenosîda ermenî-sûryaniyan û bi înkarkirina nasnameya kurdan em nikarin bigîjin ti deverê. Auschwitz'ê fêrî min kir ku li hember tawanên dijî mirovahiyê, ku ew tawan li dijî kê dibe bila bibe, divê mirov li dij derdikeve. Auschwitz ji min re bû alîkar ku ez li hebûna kurdan -ku li welatê ez lê ji dayik bûme, tê înkarkirin-, di wateya rasteqîn de baştir fahm bikim. Ez weke tirkekî wateya dirûşma "Ji Kurda ra Azadî" li Auschwitz'ê hîn bûm.

Werger ji tirkî
Nurettin Akad

---

(1) Guttstadt, Corry: Die Türkei, die Juden und der Holocaust. Assoziation A, Berlin - Hamburg 2008, s 317, 318

(2) Age. s 172

(3) "Die Wannsee Konferenz und der Völkermord an den europäischen Juden, Berlin 2006, s.110

(4) Semprun Jorge: Büyük Yolculuk (Rêwîtiya Mezin) Wergera Tirkî Nedim Gürsel, Weşanên Can, 1985

(5) Navê Orjînal: Escape from Sobibor (Regie: Jack Gold, 1987)

(6) Blatt, Thomas, Nur die Schatten bleiben. Der Aufstand im Vernichtungslager Sobibor, Aufbau Taschenbuch-Verlag, Berlin

(7) Werfel, Franz: Musa Dağ'da: Kırk Gün, Belge yayınları, Die vierzig Tage des Musa Dagh, Fischer, Frankfurt; Auflage: 17, 1990

(8) Marcel Reich-Ranicki: Mein Leben, Deutsche dtv, München 2000

KATIB YASÎN

Têkderê ebedî

MARINA DA SILVA*

"Helbestvanê rasteqîne, di nav rewteke pêşverû de jî be dîsa divê dijatiyên xwe derpêş bike. Heke bi têr û bêra xwe hizrên xwe dernebirre, wê bixeniqe. Wiha ye şêwaza xebitîna wî. Şoreşa xwe her di nava şoreşa siyasî de dike; di navenda têkdan û şêwandinê de ye ew, heta hetayê her têkder e. Bedbextiya wî ew e ku xizmeta têkoşîneke şoreşger a wisa dike ku ne dikare û ne jî divê hevaheng be digel çerx û bayê rojgarî. (1)"

Mustapha Boutadjine - artsenliberte galerie - Efekt LMD kurdî

Romannûs û şanonûs Katib Yasîn, ku bi xêra romana xwe *Necma*'yê wekî danerê edebiyata modern a cezayîrî tê nasîn, berî her tiştî helbestvanekî serhildêr bû. Bîst sal piştî wexera xwe, li Cezayîrê"*wekî efsaneyekê dimîne; mîna ku di nav hemû civakan de diqewime, berhemên wî gelek baş nayêne nasîn di nav cemawera cezayîrî de, lê belê cihê xwe di hizr û têgihiştin û gotara civakî de peyt girtiye (2)"*. Herwiha hêj jî yek ji girîngtirîn û diyarkertirîn kesayetên dîroka fransî-cezayîrî ye.

Katib, ku bi erebî tê wateya ''nivîskar", ji malbateke xwenda bû ji binemala Keblout ya Nadhorê (Rojhilatê Cezayîrê). 8 gulan 1945'an -hêj şazdeh salî jî nîne-, beşdarî dike di serhildana cemawerî û serxwebûnxwaz a Konstantînoisê de. Di hengava zext û êrîşên ku bûne sebebê kuştina çil û pênc hezar kesan, li Setîfê tê girtin û sê mehan di zindanê de dimîne. Dayika wî ya ku ji bo wî ji hemû kesî xoşewîsttir bû –lew dayika wî bû ku berê wî da nav kelepûrê devkî û helbestê- li pêş zindanîbûna wî ve dîn û har bûbû. Wê berwara 8'ê gulanê wê tîn û karîgeriya xwe heta hetayê li ser hebûn, doz û nivîsa Yasîn bihiştaya.

Her meha rezbera wê salê, li Annaba'yê, li dotmama xwe aşiq dibe, lê eşq û evîniyeke şêtane… Zuleyxaya dotmam herwiha dibe best û îlhama *Necma*'yê (stêrk), romana bi fransî, berhemeke avakar ku nivîsevaniya mexribî di bingehê re hejandiye. Di vê çîroka metaforîk de çar xortên ciwan, Raşîd, Lexdar, Murad û Mustafa li dora Necmayê diçerixin li dû evîneke namumkun û li pey lihevhatina digel ax û pêşiyên xwe; keçika xama, bedew û dûrîdest, herwiha wê Cezayîrê jî dinimîne ku ji zemanê Romanan heta Fransiyan bi berdewamî li hember dagîrkeran li ber xwe daye. Meseleyên nasname, kesayet û neteweyê, di navenda vê berhema pir-rehend û pir-deng de ne.

Necma di sertaserê serpêhatiya nivîskariya Yasîn de wekî referanseke herdemî dimîne, lê bi taybetî di *Polîgona zêrîn* de û herwiha di şano (*Xeleka tolhildanê*) û helbesta wî de zaltir dibe. Bi ya Moa Abaîdê şanogerê heyranê wî, Katib Yasîn"*derhênerekî nayab û hevalê rastiya heyî bû û wî bi rastî hewl dabû ji bo duristkirina kesayetekê ku bêyî kamûflaj û bêyî makyaj xîtabî gel bike. Derbirrîna wî ya bi metafor û kînayeyan ne bi niyeta xwevedan û strînê ye, lewre jixwe hergav bi dengekî berz û dilêr hizrên xwe derbirrîne, lê belê kana wê tercîha wî kelepûrê kultûrî yê ereb-musulman ye."*

Jiyana Yasîn jî her wekî berhemên wî azad û azadîperwer, cesûr û berhelistkar, sirrdar û şikûdar çû serî. Mîlîtanê dilsoz ê serxwebûnê di nav refên *Partiya gelê cezayîrî* de, paşî di *Partiya komûnîst* de, berî her tiştî dibe hevalbendê"*le'netiyên serzemînî"* û bêsebr û tebat hewl dide da ku wan binase û têkoşîna wan bide zanîn:"*Ji bo gihiştina bi asoya cîhanê, divê em behsa Felestînê bikin, di ber Mexribê re Vîetnamê ji bîr nekin."*

Piştî 1951'an mişextî ye û heta dawiya şerê serxwebûnê (1954-1962) piranî li Fransayê û di nav şert û mercên pir hesas de dijî; bi berdewamî li jêr azar û pêdagîriyên *Rêveberiya zêrevaniya welatî* [saziyeke dewleta Fransayê ji bo ewleyiyê] ye lewma gelek digere û cih diguhure. Di bêserûberiya mezin lê şadker a 1962'an de vedigere Cezayîrê lê belê gelek pê de naçe ku hêvîşkestî dibe. Li wir"*xwe wekî Marsiyekî"* dibîne û dikeve rêya heyameke din a seferê –Moskova, Hanoi, Şam, New York, Qahire:"*Ya rast, min ti caran bawer nekiribû ku serxwebûn wê bibe dawiya nexweşî û zehmetiyan, min baş dizanî ku wê pir dijwar be."*

Gava ku 1970'an biryarê digire ku bo demeke dirêj li Cezayîrê bimîne, dest ji nivîsandina bi fransî dikêşe û xwe dide ezmûneke şanoyî bi zimanê erebiya Cezayîrê ku bi piyesa kult *Mihemed, hilgire walîza xwe* destpêkeke pir baş dike. Danerê Tevgera Çandî ya Karkeran (TKK), piyesên xwe li deverên herî veder û çaverênekirî pêşkêş dike, wekî kargeh, binkeyên leşkerî, depo, stadyûm, deverên giştî…û vî karî bi derfetên pir kêm û sade encam dide –lewma şanoger li ser sehneyê cil û bergan li xwe dikin û her yek ji wan zêdetir ji qerekterekî berceste dike. Stran û muzîk dibin alav ji bo rîtm û bêhndanê.

''Gava min roman an helbest dinivîsîn, ez hîç qayîl nebûm ji karê xwe ji ber ku peyama min bi tenê digihîşte qederê dazdeh hezar fransîaxêvan, halbukî bi şanoyê di nav pênc salan de me xwe gihande nêzîkî milyonek temaşevanan. […] Ez li dijî bikaranîna erebiya klasîk im li Cezayîrê ji ber ku ev ne zimanê gelî ye; ez dixwazim bikarim xîtabî tevahiya gelî bikim, yên nexwenda jî tê de, ez dixwazim têkevime nav cemawera mezin, ne tenê nav ciwanan, bêguman di nav wê cemawera mezin de yên nexwenda jî hene. Divê şoreşeke kultûrî ya rasteqîne bê kirin (3)*."*

Meyl û layengîriya siyasî ya Yasînî, bi awayekî bingehî karîger dibe li ser tercîhên wî yên estetîk: "*Şanoya me, şanoya têkoşînê ye; di şerê çînan [tebeqeyên civakî] de, kes nakeve dû hilbijartina çekê xwe. Şano çekê me ye. Ev ne tenê gotin û axaftin e, em wan gav û serboriyan tînine ber cemawerî yên ku bi serê wan hatine, em hezar ezmûnan têkel dikin û yekê bi tenê jê dertînin, em her bi wêdetir ve dehf didin, her ev e ya em dikin.*

▶ 7

Gelo Amerîka dikare biguhere?

1 ◀

mijaran dike û hewl dide ku xelkê di vî warî de qane bike; axavtinên wî kêm nabin û bi pirranî watedar in jî. Lê, çi ji ber dimîne? Ew li Kahîreyê koloniyên Îsraîlê şermezar dike; gava ku nûçe belav dibin, ew dev ji vê fikra xwe berdide. Ew soza reformeke xurt ya di sîstema tendurustiyê de dide; parlamenter reforma wî nerm dikin, lê ew li dij dernakeve.

Rojekê, ew bi ciwanên *West Point*'ê dide zanîn ku ew ê hêzine zêdetir bişîne Afganistanê; demek kurt bi şûn de, ew xelata Nobelê ya aştiyê distîne. Mirov zêde li ser bifikire, mirov dikare bibe şîzofren. Lê, ev dijberiya rewşên cuda dermanê xwe jî bi awayekî eşkere peyda dike: Êdî bêndereke peyvan diyar dibe ku di nava hemû daxuyaniyan de cihekî ji dijberê wê re jî dihêle. Axir, formuleke weha derdikeve ku êdî dibe adet: *"Hevalên min yên pêşketinxwaz doza vê dikin, hevalên min yên komarparêz weha dibêjin; yên yekem zêde dixwazin, yên duyem baş qane nabin. Yê min, ez biryara xwe li ser rêya nava herduyan didim."*

Birêz Obama cesaret da ciwanên *West Point*'ê ku *"nîşan bidin ku ew di warê bikaranîna hêza çekdarî de li ber xwe didin"* bang li juriya Osloyê kir ku "ji ber ku mirov ne bêqisûr e û nikare li her tiştî bifikire, pêdiviya hêzê" bihesibîne. Juriya Osloyê mecbûr ma ku bîne bîra xwe ku serok Richard Nixon ji ber "zordestiya şoreşa kulturî" qebûl kir ku di sala 1972'an de li Pekînê bi Mao re bicive. Ji ber ku wî jî weke serokê komarparêz yê berê gellekî giringî dida mafê mirovan, ev hevdîtin li serê wî bûbû bela û ji ber wê bêhna xwe bi fermana bombekirina bajarên Vietnamî yên mezin ve fireh kir û bi dû re li Şîliyê jî piştgirî dayê ku general Augusto Pinochet dest deyne ser desthilatdariyê… Dîsa jî, Birêz Obama ji juriya Osloyê re qet behsa van bûyeran nake. Ji ber ku xetta xwe li "navendê" daniye, wî him pesnê Martin Luther King da û him jî yê Ronald Reagan.

VEGER

Lê belê, hertiştî baş dest pê kiribû. Meha Çiriya Paşîn a 2008'an, her ji sê Amerîkiyên ku karîbûn deng bidana du kesan (û % 89.7'ê dengdarên qeydkirî) biryara hilbijartinên serokatiyê da. Wan berendamekî weha antîpîk anî Qesra Sipî ku karên ku wî berê kiribûn, dibûn nîşana guherînên ku wî ê pêk bianiyana: "Çîroka min naşibe ya yên berî min û min kariyera xwe li korîdorên Washingtonê derbas nekiriye." Ji xwe, ji ber vê sedemê ye ku xelkê piştgiriya wî kir ku di nava wan de ciwan, Reşik, Îspanyol û herweha beşekî dengdarên sipî (% 43) ku kesî hêviya wan nedikir jî hebûn. Wî rajeyeke weha bi dest xist ku ji ya dema hilbijartina Reagan ya sala 1980'ê bilindtir bû (% 52.9 li hember % 50.7) û hingê Birêz Obama dikare hesabê hilbjartineke duyem jî bike. Ji xwe, tu raqîb ji wî re diyar nabin. Kes baweriya xwe bi komarparêzan nayne. Felsefeya wan a liberal ku ji aliyê serokê nû ve bi awayekî zelal û pedagojîk hat şîrovekirin – "zêdetir didin dewlemend û xurtan û hêvî dikin ku rehetiya wan wê zora hertiştî bibe" -, êdî bi temamî bêwate ye. Û demokrat li herdu hêlên Kongreyan jî pirrhejmar in.

Sê meh berî hilbijartina xwe, Birêz Obama dabû zanîn: *"Rîska herî mezin ku em dikarin têkevinê ew e ku mirov heman metodên siyasî bi heman lîstikvanan ve bi kar bîne, lê belê mirov encameke cudatir jê hêvî bike. Di rewşên weha de, dîrok nîşanî me dide ku guherîn ji Washingtonê nayê, lê belê tê Washingtonê, ji ber ku xelkê amerîkî radibe ser lingan û doza vê yekê dike."* Milîtaniya di cih de bi vî awayî divê derfetê bide ku zexta konservatoran ya li paytextê qels bibe ku ew jî wargeha fermî ya hemû lobiyên welêt e. Salek bi şûn de, digel ku tu nîşana tevgereke xelkî xuya nabe jî, êdî kes nizane bê çend projeyên qanûnî hatin astengkirin, çend ji wan hatin nermkirin, çend hatin kêmkirin û ev hemû jî bi rêya "heman metodên siyasî û heman lîstikvanan" pêk hatiye.

Lê belê, pirsa li ser çîroka şexsî, ya jiyana serokê niha, nedişibiya jiyana yên berî wî. Sedema wê ji xwe li ber çavan e û herkes pê dizane; lê, herweha ne tiştekî adetî ye ku mirov bizane ku kesê ku niha li Qesra Sipî dimîne di xortaniya xwe de ji dêleva ku li New Yorkê awûqatiyê bike û gellek pereyan qezenc bike, çûye alîkariya xelkê taxên Chicagoyê yên xizan kiriye. Dîsa jî, gava ku mirov bala xwe dide tercîha Birêz Obama ya li ser endamên kabîneya wî, mirov nûbûneke zêde berbiçav nabîne. Erê, Xanim Hilda Solis wezîra karî ye ku nêzîkî sendîkayan e û dixwaze polîtîkaya ku berê hatiye meşandin biguhere, lê li wezareta karên derve Xanim Hillay Clinton heye ku xeta wê ya dîplomatîk ji xeta berê ne gellekî cuda ye û herweha li wezareta parastinê jî Birêz Robert Gates heye ku rasterast ji birêvebiriya dema Bush hatiye. Ji bilî van, li wezareta aboriyê Birêz Timothy Geithner heye ku zêde girêdayî Wall Streetê ye mirov nikare bibêje ku dikare an jî dixwaze wê biguherîne û şêwirmendê aborî jî Lawrence Summers e ku mîmarê siyaseta fînansî ye ku ji sûcê guherînên wî Amerîka hindik mabû ku têk biçûya. Herçî pirrengiya ekîbê ye, ev pirrengî jî ne di warê sosyolojîk de ye. Ji sîh û pênc kesên ku di destpêkê de ji aliyê Birêz Obama ve hatin hilbijartin, bîst û du kes an xwedan dîplomayên unîversîteyên amerîkî yên elît bûn an jî ji kolejên brîtanî yên dewlemend dihatin.

Ji destpêka sedsala 20'an ve ye ku demokrat bi taybetî li hember pisporên siyasî û şiyana wan dixapin û didin nava pragmatîzmê, didin pey birêvebiriya şarezayan (*"the best and the brightest"*), pê diguherin, bi şêwirmend û nirxandêrên weha re dixebitin ku hewl didin ku daxwazên xwe bi derdoreke siyasî ya tawanbariya demagojiya daîmî bidin pejirandin. Ji bo felsefeyeke bi vî rengî ku li gora serboriya xwe bi awayekî navkokî serokê Amerîkayê jî (gelo bi armanca ku kes nebêje qey ew jî milîtanekî afro-amerîkî ye?) dide dû, divê mirov xwe ji piştgiriya xelkê ya bi giştî û ji "populîzmê" biparêze. Di cih de Birêz Obama hêvî kir ku beşê komarprêzan yê maqûl jî wê piştgiriya wî bike û di çareseriya pirsgirêkên welêt de hevkariya wî bike. Ji ber wê, derî ji wan re vekir. Lê belê, piştgirî nehat. Wî vê dawiyê ev helwêst weha nirxand: *"Me di hin mijarên dijwar de biryarine dijwar dan, beyî ku partiya muxalefetê bixwaze alîkariya me bike; lê belê vê partiya ku serokatiya siyaseteke weha kir ku welat ber bi krîzê ve ajot, biryar da ku toqa berpirsiyariyê ji stuyê xwe derxe."* Nirxandineke ecêb e, lê belê watedar e: Ew qet behsa hilbijartinên serokatiyê yên 2008'an nake, lewre piştî wan hilbijartinan, komarparêzan bi xwe "biryar" neda ku rişma birêvebiriyê bidin hinine din; ew ji aliyê dengdaran ve hatin qewirandin. Bêhna xelkê ji wan teng bûye. Dijberiya wan ya tund jî ji ber vê ye. Hê ji Hezîrana 1951'ê ve, demokratekî bi navê Harry Truman desthilatdariya Qesra Sipî bi dest xistibû. Beyî ku zêde serê xwe pê re biêşandaya, dest pê kir û şerrê komunîzmê û Yekîtiya Sovyetan kir û hêz û qeweta *General Electric* parast. Dîsa jî, li cem beşekî rayedarên komarparêz yê giring, şik tê de nebû ku ew xayinek bû. Senator Joseph McCarthy weha digot: *"Heger mirov nebêje ku mirovine ku li devera dewletê ya herî bilind bi cih bûne hewl didin ku me ber bi felaketê ve bibin, ma qey mirov nikare tiştekî ji rewşa heyî fahm bike? Ev têgihiştineke ewqasî mezin û ecêb e ku hemû baweriyên dîrokî yên berî xwe tune dike û diavêje. Têgihiştineke weha bêwate ye ku roja ku eşkere bibe, berpirsiyarê wê heq dike ku mirovên xwedan rûmet heta ku hebe naletê li wî bibarînin."* Bi qasî çar salan, Senator Wisconsin wê tirsê bixe dilê kesên ku weke piştgirê pêşketinê dihatin naskirin, yanî hunermend û sendîkalîst, lê herweha hin berpirsên dewletê yên bilind û yên leşkerî diketin ber xezaba wî.

Ew rewş hê pêk nehatiye. Lê belê, ji nû ve paranoyayeke milîtanên rastgir dest pê kiriye ku bi *talk shows*'ên radyoyan, bi "nûçe"yên *Fox News*'ê yên bêrawestan, bi edîtoryalên Wall Street Journal, bi dêrên fûndamantalîst, bi nirxandinên berradayî ku li ser internetê digerrin û belav dibe. Bayekî bi vî rengî hişê xelkê dixe bin destê xwe û qedexe dike ku mirov li tiştekî din bifikire. Bi vî awayî, bi milyonan Amerîkî êdî bawer dikin serokê wan li ser jiyana xwe derew li wan kiriye û ew li derveyî welêt çêbûye û ji ber wê, ew nikarîbû biketaya hilbijkartinan. Ew sûnd dixwin û bawer dikin ku serkevtina wî, digel ku bi heyşt milyon û pêncsed hezar ray ji raqîbê xwe zêdetir wergirtibûn, encama dewrew û xapandinekê, encama "konspîrasyoneke gellekî mezin" e.

Ew bawer dikin ku serokê wan zilamekî weha ye ku li Endonezyayê du salan çûye dibistaneke musulmanan û kevnemilîtanekî çapgir e û kozmopolît û rewşenbîrekî weha ye û dîsa jî wan bi rê ve dibe. (2) Li gora wan qet şik tê de nîne ku reforma sîstema tendurustiyê wê bibe destpêka "dadgehên mirinê" û bi van dadgehan wê nexweşên ku bikarin tedawî bibin ji yên din cuda bikin. Ev mijar di têkoşîna komarparêzan de bûye kakilê helwêsta muxalefetê. Di bin çengên wan de ewqas parlamenter hene ku Obamayê navendparêz jî ji bo bazara siyaseta xwe ya pêşketinê, refoma xwe ya tendurustiyê û diyarkirina sîstema aborî hesabê wan dikir.

Bernameya ku wan hêvî dikir beyî ku dereng bibe hat fahmkirin. Hê mehek di ser hatina serokê nû ya Qesra Sipî re nebihurîbû, lê gava ku hat, ji sed û heftê û heft nûnerên komarparêz yên parlamentoyê yekî jî piştgirî neda plana wî ya zêdekirina mesrefên dewletê. Meha çiriya paşîn, dora reforma sîstema tendurustiyê bû: vê carê, bi tenê nûnerekî muxalefetê piştgiriya pirrhejmariya demokratan kir. Meha çileya pêşîn jî, qanûna bi armanca parastina xelkê ya li hemberî tevgerên şîrketên krediyan ku ji adetê derdixin hat û ew jî hat qebûlkirin, lê belê tu dengên komarparêzan piştgirî nedayê. Hercar, pêşniyar dihatin qebûlkirin, lê belê hêviya wê dihat kirin ku serok wê bikariya pêşqanûn weke daxwaza herdu partiyan jî bidaya nasandin…

Herçî rewşa aborî ye, hê kes nizane bê îmzeya wî ya di biniya qanûnê de bişine çi. Ji sed senatoran muxalefeta çil senatoran ya ji bo dengdayinê bes e, da ku nîqaş her û her dewam bikin û encam jê dernekeve. Hejmara komarparêzan jî çil e û di vê rewşê de her yek ji wan û her yek ji demokratan dikare dengê xwe bi buhayekî bilind bifiroşe. Demokratekî bi navê Joseph Lieberman ku sala 2008'an bang kiribû ku piştgiriya John McCain were kirin bi vî awayî ji bo peydakirina "formuleke fermî" ya ji bo Amerîkiyên beyî sigortaya tendurustiyê, bû asteng. Şîrketên sigortayên taybetî di navbera piştgirên Senator Lieberman yên aborî de hêzeke xurt in…

Roja 28'ê Îlona 2008'an, digel ku planeke Obamayê berendam ya ji bo alîkariya banqeyan hebû û vê alîkariyê wê bi awayekî acîl

700 milyar dolar bidaya banqeyan, parlamenterekî çepgir yê bi navê Dennis Kucinich bala hemtayên xwe weha kişand: *"Ma gelo em Kongreya Dewletên Yekgirtî ne, an em konseya birêvebiriya Goldman Sachs'ê ne?"* Ev pirs têra xwe xurt û mafdar bû ku serokê amerîkî biryar da ku di cih de rewşê zelal bike: *"Min kampanyaya xwe bi armanca ku alîkariya giregirên Wall Street'ê bikim pêk neaniye."* Lê belê, sala 2008'an, Goldman Sachs, Citigroup, JPMorgan, UBS û Morgan Stanley di nava bîst mezintirîn piştgirên kampanyaya wî yên sereke de bûn. (3) Hevokeke rojnameger William Greider vê rewşê baş diyar dike; *"Demokrat hatine û li ber pirseke giring sekinîne: gelo ew ê karibin xizmeta civakê bikin, beyî ku banqeyên ku kampanyaya wan fînanse kiriye ji xwe sar bikin?"* (4)

Gelo Dewletên Yekgirtî dikarin bên guhertin? Dibêjin ku sîstema wan ew e ku mirov dikare jê re bibêje "dengeya hêzan." Di eslê xwe de, ev sîstem ew e ku gellek qadên di bin desthilatdariya dolarî de hene. Sala 2008'an, bi milyonan ciwanan berê xwe da têkoşîna siyasî û bawer dikir ku bi vî serokî tu tiştê ne weke berê be. Lê, vaye, ew jî weke yên din tev digerre, dengên ku dikarin li serê wî bibin bela bi pereyan dikirre û xwe dike hevalê parlamenterên ku ji wan hez nake. Ma gelo dikare wekî din tev bigerre? Şexsiyeta zilamekî tu carî nikare li hember xezeba dezgehan gellekî xurt be. Tew gava ku muxalefet ewqasî dijber be û "tevgera gel" ji sendîkayên di bin nîrê hinin din de pêk bê, û desthilatdarî piştgiriya milîtanên reşik bike û herweha internotên bêvilbilind bibêjin qey milîtanî li paş klavyeyan jî bi pêş dikeve! Lê belê, li Dewletên Yekgirtî, rêya bipêşxistina tiştan herweha ferz dike ku herkes bi cihê xwe zanibe rola xwe bilîze. Bînin bîra xwe ku ji bo kêmkirina baca dewlemendan, pêdiviya Reagan qet pê nebû ku pirrhejmariya parlamenterên komarparêz hebe…

Biyografiya Birêz Obama bû sedema ku agahî çewt belav bibin. Ji hêlekê ve, ev biyografî bû sedem ku bala herkesî bikeve ser wî û hemû hêvî ji wî bên kirin. Ji hêleke din ve jî, vî serokê Dewletên Yekgirtî êdî naşibe wî xortê tundrew ku ew bi xwe di bîranînên xwe behs dike. Wî xortê ku beşdarî konferansên sosyalîst dibû û li dijî cûntaya antîkomunîst ya 1965'an ya Endonezyayê bû û li Harlemê ji bo komeleyeke nêzîkî Birêz Ralph Nader dixebitî. Tiştekî wî yê hevpar bi wî milîtanî afro-amerîkî re jî nemaye, wî xortê ku digot: *"Ji bo ku kes nebêje xayin, [min] hevalên xwe baş hildibijartin. Reşikên herî çalak. Xwendekarên biyanî. Chicanos. Profesorên marksîst, kesên ji tevgera femînîst û helbestvanên punk rock. Me cixare dikişand û çakêtên me yên ji çerman hebûn. Bi şevan, di nava livînan de me behsa neo-kolonyalîzmê dikir, me behsa Frantz Fanon dikir, me behsa etno-navendîzma ewrûpî û desthilatdariya mêran dikir"* (5).

Li gora komarparêzan, ev rabirdû eşkere dike ku mêrik xeternak e, biyaniyê çanda welêt ya serbixwebûna şexsî ye, hevalê "dijminên azadiyê" ye û amade ye, ji serî ve, ku "sîstema tendurustiya amerîkî sosyalîze bike.'' Ji hêla din ve, beşekî milîtanên demokrat hêvî dikin ku serokê wan, yê ku niha hêviya wan dişikîne, wê çerr ku karibe, di warê siyaseteke pêşketinê de bixebite û nekeve dudiliyê; û ew bawer dikin ku daxwaza wî jî ev e. Gava ku hêlek bitirse, hêviya hêla din jî zêdetir dike. Dîsa jî, weke ku rojnameger Aleksander Cockburn dibêje, çepgirên ku hewl didin ku di nava metnên ku tên Kongreyê de şopa serketinan bibînin û ji ber wê tim li bendê ne, baş dizanin ku dema wan bi sînor e: hilbijartinên giştî yên çiriya paşîn ku hindik ji wan re maye, di nava vê rewşa ya aborî de ku ne gellekî baş e, wê hejmara demokratên Kongreyê jî biguhere.

Bi kurtî, zêde behsa Birêz Obama tê kirin. Îmajeke weha dan wî ku herkesî got qey ew ê bikare hêzên civakî û dezgehan û berjewendiyan xurt bike. Ev taybetmendiya şexsîkirina desthilatdariyê ku hê kamil nebûye li Fransa û Îtalyayê jî heye, lê belê ew li wira bi ser dikeve; heger ev têk biçe, çep rizgar dibe… Berî niha bi qasî pêncî salan, dîroknasê Amerîkî Richard Hofstadter baweriyên siyasî yên bi vî rengî weke "stîla paranoyak" bi nav dikir. Wê demê, ew bêtir li rastgirên makkartîst difikirî û behsa wan û xelefên wan dikir, lê wî herweha digot ku tîpa vê sîstemê ya îdeal wê piştî tecrubeya salan ji xwe re şikline nû jî peyda bike.

Dem êdî hat. Raperîna individualîzmê, tiraliya çapemeniyê, bêastbûna nîqaşan ya hîsterîk, rola medyayan ya ku ji rêyê derketiye, têkçûyina marksîzmê jî di nav de, bûn sedem ku hin bawerî bêtir belav bibin, weke ku Hofstardter sala 1963'an digot: *"Rewşa me ne ew e, lê belê dijmin guh nade dîroka xwe, ew ne qurbanê rabirdûya xwe û daxwaz û sinorên xwe ye. Ew li şûna xwe nasekine, çalak e û dikare hertiştî bike. (…) Qeyranan dide avakirin, banqeyan dide rûxandin, dibe sedema depresyonê, felaketan dide peydakirin û bi dû re jî xwe dide ser hev û ji vê sefaleta ku ew bi xwe bûye sedem destkewtî dibe."* (6) Pêşkêşvanekî radyoyeke ultrakonservator yê bi navê Rush Limbaugh dide zanîn ku hin ji piştgirên Birêz Obama wî mîna Mesîh dibînin. Xebera wî ye. Lê, hingê çima ew herroj diavêje pêxember û kufur dibe?

Axir, mûcîzeya hilbijartina çiriya paşîna 2008'an dikare ew be ku bîne bîra me ku mûcîze nînin. Û qedera Dewletên Yekgirtî jî, ne bi şexsiyeta zilamekî ve û ne jî bi dilsoziya serokekî ve têkildar e.

Werger ji fransî
Îbrahim Seydo Aydoğan

(1) De Villepin kevneserokwezîrê Fransayê ye û di nava partiya rastgir ya desthilatdariyê de weke dijberê Sarkozy tê naskirin, lewre ew ji serî ve hevalê kevneserokkomarê fransî Jacques Chirac e. Nicolas Sarkozy jî ji ber hevaltiya wan a bi Chirac re, piştî ku serokatiya partiya UMP'ê û herweha serokkomariya Fransayê bi dest xist, alîgirên Chirac ji binî ve ji dora xwe bi dûr xistin. Olivier Besancenot jî pêşengê çepgirên tundrew e û bi daxuyaniyên xwe yên gellekî tund tê naskirin. Wî herweha Partiya Sosyalîst jî rexne kiribû û hevgirtina bi vê partiyê re, ji ber ku li gora wî Partiya sosyalîst ji xeta xwe ya çepgiriyê bi dûr ketiye, red kiribû. (Têbiniya wergêr).

(2) Bixwîne: "Stratejiya rastgirên Amerîka, civandina xelkê ya li dijî rewşenbîran e", *Le Monde diplomatique*, Gulan 2006.

(3) Li gora lîsteya ku *Center for Responsive Politics* daye. http:// www.opensecrets.org/pres08/contrib.php?cycle=2008&cid=N00009638

(4) William Greider, "The Money Man's Best Friend", *The Nation*, New York, 30 novembre 2009.

(5) Barack Obama, *Dreams from My Father*, Three Rivers Press, New york, 2004, r. 100.

(6) Richard Hofstadter, *The Paranoid Style in American Politics*, Alfred Knopf, New York, 1966, r. 32.)

Katib Yasîn / Têkderê ebedî

5 ◀

Em berdestkên jiyanê ne. (4)*"* Bi ya wî, bi tenê helbest dikare derheq wan hemû layenan we-re lewre ew di navenda hemû tiştekî de ye; û ji bo wî helbest *"bi rastî bingehîn e ji bo derbirrîna mirovî."* Bi hêma û sembolên xwe rê û rehendeke dîtir vedike."*Qesta min ne razberkirineke* [abstreksiyon] *hêvîşkên a helbesteke bi-ser-xwe-deqetkirî ye, ne jî ewa ku şêwaza derbirrîna bêçaretî û bêhêziyê hilgirtî, belkî her bi yekcarî berevajî wê ye […]. Bi her çi awayî dibe bila bibe, baweriya min bi hêza wê ya têkder heye, her bi qasî ku dilniya me ji derfetên şanoyê yên hişyarane, ji zimanê wê yê çak kontrolkirî û çak birêkxistî* (5)*."*

Yasîn yek ji wan *"hêzên têkder"* di *Cendekê dorpêçkirî* de bi kar tîne, ku roja xwînî ya 8'ê gulana 1945'an, digel talankirina sê gundên rojhilatê Cezayîrê bi navên Guelma, Xerrata û Setîf, ji aliyê hêzên kolonyal ve, di navenda wê qiseta şanoyî de ye; bi wî awayî pêwendiyekê durist dike di navbera çîrokeke şexsî û cemawerî de.

Yasîn kolonîgerî û hewlên neokolonyalî mehkûm kirin lê belê wî herwiha dijatî li wê dîktatoriya piştî serxwebûnê jî kir ku berdewam bû di şelandina gelî de. Bi awayekî tund fanatîzma ereb-îslamî şermezar dikir û li hemû eniyan tê dikoşiya û digot ku divê *"şoreşê li şoreşê bikin"*.

Heger çi wî zimanê fransî wekî *"xenîmeta şerrî"* dîtibe jî, wî hevkat dengê xwe li dijî siyaseta erebîkirinê jî bilind dikir û doza qebûlkirina zimanên erebiya cezayîrî û amazîg (berberî) wekî zimanên Netewî dikir. Yasînê ku nasnavê "Birayên mexber" [wekî rexneyeke xerabker li "Birayên musulman"] li parêzkarên îslamî dikir, doza azadbûna jinan dikir ku ji bo wî jin kirde û barkêşên dîrokê bûn: "*Pirsa jina cezayîrî di dîrokê de hergav ez heyirandime. Ji nûciwaniya min ve wekî pirseke serekî disekine li ber min. Kana serekî ya hemû tiştên bi serê min de hatî, hemû tiştên min heta niha kirî hergav dayika min bûye […]. Çi di warê zimanî de, çi di zindîkirina hişmendiyekê de, her dayik e ku peyvên pêşî bi zarokî dide gotin, her ew e cîhana wî ava dike* (6)*."*

Ba û tundrewiya rexneya wî, bi qasî hestên hezkirin û xoşewîstiyê, yên dijminiyê jî li dora wî kom kirin. Yasînê ku ji yên herî baş bigire heta yên herî xerab objeya her cûre nirxandinekê ye, îro wekî "têkderê ebedî" disekine li ser sehneya roşinbîrî û cemawerî ya Cezayîrê û mîna *Necma*yê, stêrka dûrîdest, bi ti awayî ji payebi- lindiya xwe danakeve.

Werger ji fransî
Ergîn Opengîn

Bahram Hajou

Di sala 1952'an de li Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Di navbera salên 1970-1972'an de li Îraqê li bajarê Bexda'yê û di navbera salên 1978-1984'an de li Almanya li bajarê Münsterê jî di akademiyên hunerî de xwendiye. Di navbera salên 1984-1991'an de li bajarê Gelsenkirchen'ê di Volkshochschule'yê de mamostayiya wenekêşiyê kiriye.

Bahram Haco heta niha li Almanya, li gelek welatên din yên Ewrûpa û Amerîka, Erebistana Siûdî, Dubai û Urdun'ê gelek pêşengehan vekiriye. Haco bi taybetî li welatên Ereb wek hunermendekî kurd naskiriye. Ew di hunera wênekêşî ya kurd de navekî sereke ye. Haco niha li Almanya li bajarê Münster'ê dijî.

www.bahram.de

(1) Suhbeta digel Jean-Marie Serreau, di nav: Le poète comme un boxeur, Seuil, Paris, 1994.

(2) Benamar Mediene, mamosteyê zanîngehê, nivîskarê Kateb Yacine, le coeur entre les dents, pêşgotina Gilles Perrault, Robert Laffont, Paris, 2006.

(3) Hevpeyvîna digel Abdulkader Djeghloul, Actualité de l'immigration, n°72, Paris, 2006.

(4) Colette Godard,"Le théâtre algèrien de Kateb Yacine", Le Monde, 11 Rezber 1975.

(5) Kateb Yacine, "Pourquoi j'ai écrit Le Cadavre encerclé", France-Observateur, Paris, 1958.

(6) Entretien avec El Hassar Benali (1972), di nav: Parce que c'est une femme, Editions des Femmes-Antoinette Fouque, Paris, 2004.

Ev hemû zarok li ku ne?

CLAIRE BRISSET*

(Children's Art Centre) - Efekt LMD kurdî

Dema ku Asambleya Giştî ya Rêxistina Netewên Yekgirtî (RNY), di kombûna 20'ê Mijdara 1989'an de li New Yorkê bi yek dengî Peymana Navnetewî ya derbarê mafên zarokan de ku amadekariya wê piştî deh salên danûstendinên gelekî dijwar ajotibû, qebûl kir, rewşa zarokan li dinyayê, ji xerabbûnê bi wê de bû. Li gel pêkhatina pêşketineke berbiçav di van bîst salên dawîn de – ji dawiya salên 1960'î heta dawiya salên 1980 – nîşaneyên xerabûnê ku mirov xembar dikin jî hene. Gerînendeyê giştî yê Fona Netewên Yekgirtî beşa zarokan (Unicef) Bz James Grant digot "pêşketinê arîze dan.''

Di bin bandora plana sererastkirinê ku Fona Peran a Navnetewî (FPN) û Banka Cîhanê bi mebesta "başkirina" aboriya wan, li ser xizantirîn welatan ferz dikin ku ji Budceya tendurustî û perwerdê hejmareke mezin bibirrin. Deynên welatên sêyemîn bi hawê sembolîk gihîştibû sê hezar milyar dolaran, alîkariya gelêrî ji bo pêşketinê nedigihîşt %0,35ê afirandina brut a Netewên dewlemend, li cihine dinê carcaran %,25 hin salan.

Erêkirina peymanê, bêgûman bi armanca rawestandina vê rewşê bû. Li dinyayê çarde milyon zarokên temen di bin pênc salan re, ji ber kêmxwarin û nexweşiyên ku îroj baş tên naskirin û dikanin bi derzîkirinê derbas bibin, dimirin. Ji bo milyarê mirovên ku ji hemî derfetên tendurustiyê mahrûm û ku temenê nêviyên wan nagihîjin ciwantiya xwe, milyonek xebatkarên tendurustiyê divê.

Pîrozkirina peymaneke bîstsalî, heman demê tê wateya lêpirsîna sedema avakirina wê, pêdiviya wê û analîzkirina tesîra wê ya li ser rastiya jiyanê. Pêkanîna wê ya li vê derê bi taybetî dijwar e: kêm tişt jê, heman demê kirdar, hesteyarî û siyasî ne. Li Fransayê mirov dikane bi nîv-dengî qala salvegerê bike: rêveberiyê di meha Îlonê de bi mebesta rêzgirtina peymanê avakirina enstituyeka sala 2000'î, niyeta xwe ya li ser rakirina karê Parazvanên zarokan bi lêv kir. Lidijrabûn bi hawekî wisa zindî pêk hat, heger bi şiklekî dinê be jî, mejbûr man hêviyê ji piştgiriyê re bihêle. Mirov ji ku ve lê binere ev şermezarkirin girêdana civaka frensewî ya ji bo vê dozê nîşan dide.

Dawiya salên 80'yî, ji bona zarokan, têgeha biçûktirîn mafekî, bi qasî serê derziyê bû. Bêgûman li rojava, tekstên cûrbecûr strandina zarokan ji neheqiyên tim li ber çav, muamela xerab, kuştin û hwd dikir armanca xwe. Hinek qanûnên dinê di dema kirina sûcekî de, li gor plana li ser pîvana perwerdeya cezayî, dihişt ku ew li gorî mezinan cezayekî siviktir bigirin: Ew, li Fransayê, felsefeya qanûna 1945'an a binavûdeng bû ku îroj ji aliyê desthilatdariyê ve dikete meriyetê. Dawiya dawîn, mafê malbatî hate naskirin, bi taybetî başkirineke berbiçav, ji bo muameleya wan a piştî hevberdana wê û bav, û parastina mîrata zarokan.

Qanûna sala 1989'an, jê re dibêjin "a New Yorkê", bi hawekî pir cuda kêmasî û newekheviya di navbera beşan de, guhert. Bi xwespartina ser esasê hişmendiyê, yekser nuh, prensîbekî bingehîn dianî ziman: hemî biryarên derbarê biçûkan de, dixwazî yeke yeko yan kom bi kom, û tevî ku li zerara mezinan jî, li gel hemî tiştî diviya ku "berjewendiyên herî li pêş", bihatina hesabkirin. Bi eşkerekî ev yek ji rêbazên ku qanûna Amerîkî didarizand, û ku îroj jî dadirizîne, nayê qebûlkirin.

Li dora vê prensîba bingehîn, sê celebên lihevrastkirinê hene di vê tekstê de: hemî welat mejbûr in xizmeta ku bêyî wê zarok nikanibin bijîn û mezin bibin (bi taybetî tendurustî, xwarin, perwerde); hemî rêveberî û kesên taybet mejbûr in ku wan ji zordestiyê biparêzin (zordestiya dewletê, zordestiya saziyan, zordestiya malbatê); hemî rêveberî û tevdîrên dadgerî mejbûr in ku di hemî biryarên xwe yên derbarê wan de, rewşa zarokan li ber çav bigirin.

Bi vê qalkirina kurt, ev teksta tevlihev, hêsan xuya dike. Lê belê ferzkirinên wê bê serûber in. Le pey hev, welatên bakur û yên başûrê gerdûnê dest bi erêkirina prosesê kirine, ango erêkirina vê peymanê bi dengdana li parlementoyên xwe, ku dizanin wan divê dawiya dawîn wê li qanûnên xwe bînin. Roja îroj, hema hema li tevayiya gerdûnê

* *Endamê Konseya Bilind a Gel û Malbatê, berê parazvanê mafên zarokan (2000-2006)*

ev peyman hatiye erêkirin. Peymana mafên navnetweyî çêtir naskirî ma. Tenê du welatan guh nedan peymanê: Dewlemendtirînê dinyayê, Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA) ku rêveberiya wê, bi vê mijarê xwe aciz kir, lê dîsa jî Kongrê piştgiriya xwe ya ji bo peymanê nîşan da. Û Somaliya ku ji ber tevliheviya leşkerî-polîtîk ku derfeta parlementoyê tune ye rûniştineke hewce ji bo erêkirina peymanekê pêk bîne.

Carekê qebûlkirî, hema bêje li tevaya cîhanê erêkirî, gelo vê tekstê gelek guhertinên mezin pêk anî? Pêşketinên nayê înkarkirin hatin qeydkirin. Diyardeya dawîn, a derbarê rêjeya mirinê, bi xwe dibêje: hejmara yên di bin pênc salan re ku ji ber kêmxwarin û nexweşiyên têgerîner mirî, a niha daketiye bin 10 milyonan, li gel ku sala 1989'an wek 14 milyonan hate dîtin. Perwerde, nexasim a keçikan, ew jî baş bûye bi taybetî li Afrîqaya bin Saharayê.

Beriya her tiştî, mafên zarokan bû mijareke palîtîkayê. Zordestiya herî mezin, li nava raya giştî ya navnetewî, êdî nema mîna bobelateke xwezayî pêk bê, tê qebûlkirin. Yekser, pirbûna destdirêjiya biçûkan bû mijareke hetîketinê jî. Bi dehan welatan, du jê Fransa û Almanya, kanûnên li derveyî-axa xwe ku miştiriyê biçûkên ku toltiyê dikin bi cezayekî heta niha qet hew qasî giran nebûye ceza dikin, xistin meriyetê.

Dema qeyranê de jî mirov nema wekî berê bi xweşbînî, berhemên li bazarên Bakur ku bi destên biçûkên hema bêje kole, tên firotin, dinerin. Hin fîrmayên Navnetewî ew yek baş fam kirin ku tu tiştên bi destên van zarokan tê afirandin nefiroşin. Gelek sazî û dezgehên dewletan ku dan ser rêya peymanê, çêbûn û bê navber gel hesteyar dikin li ser vê mijarê. Zora tekoşêrên vî karî ya li ser siyasetmedaran, qeraseyekî mezin e ji bo pêşketinê.

Bi şertê ku raya giştî bi rastî bê agahdarkirin. Û yek ji dijwariya vî karî jî ev e. Agahiyeke bê sarsarîk li ser binpêkirina mafên zarokan, sebreke bêhempa dixwaze. Nemaze, ev binpêkirin bêserûber e. Û pirrê wê ji biryarên siyasetmedaran yan ji pergala Navnetewî ya danûstendinê tê.

Xwarina nerast yek ji tiştên herî berbiçav e lê belê yên din jî hene. Li ser rûyê erdê, li dora du sed û heftê milyon zarokên ji hemî cûre derfetên tendurustiyê bêpar hene. Derfetên mîna dîspansêrek yan jî çavîkeke odê ya li çolê jî. Qederê du sed milyonan, li ser kar hatine belavkirin. Nêvî jê di bin şert û mercên ku tendurustiya wan û jiyana wan jî di talûkê de...

Çi dikin ev zarok li ser kar? Ji sedî heftêyê wan li karê çandiniyê belav bûne. Li gel hemî hêviyan, yek ji yên bo wan herî bi talûke: bêstariya wan a ji mekîna, bêhna jahra li dijî gîhayên zexel, li gorî mezinan bêtir tesîrê li canê wan ê ku qelstir e, dike. Û hilgirtina barên gelekî giran ji bo hestiyên wan ên hêj nestewiyane ûhwd. Zarok bi tevayî di madenên gewher de (ên zêr, kevirên bêhempa, madenên hesinî), di çêkirina tekstîlê de, di hûnandina xalîçan de, di karê elektronîkê de, yên teqemenî û hwd de jî tên xebitandin.

Di nava van şert û mercan de, naçin dibistanê, yan jî pir hindik, tenê çend salekî. Belê, pedagog dizanin ku zarokek herî kêm çar salên dibistana seretayî –bê navber- temam nekin, ewê bibe ew kesê ku jê re dibêjin "nexwendî." Ev tê wê maneyê ku çi tiştê fêr bûye ewê ji bîr bike.

Hejmara van zarokên li kar, tevî ya vanên ku li kolanan dijîn e. Hemî celebê zordestiyê pêk tê. A çeteyan yan a tilyakê û ya hêzên polîsan jî ku carcaran li gelek bajarên Amerîkaya Latînî wan ji kolanên mezin "paqij dikin." Hejmara zarokên kuçan qederê sed milyonekî ye li ser rûyê erdê.

A dawîn, zordestiya herî xerab ku pêk tê, carcaran ji mezayiyê de, a mezinana e ku li dijî qirnê li pey xwe, dikin. Ev zordestî tu sînoran nas nake. Malbatê, çînên civakê, mîna ku sînorê dîrokê nas nake. Wek ku Victor Hugo di yek ji helbestên xwe yên herî xweşik de dipirsî. "Ev zarokên ku yek jê ken bi rû neketiye gişk bi ku de çûn?."

Li ber çavan e, ew nakenin. Ewên ku wê û bav lê dixin, neheqiyê lê dikin, ewên ku li destdirêjiyeke ku wan birîndar dihêle, rast tên. Zordestiya taybet, zordestiya dewletê jî di ser de: dora sih dewletên li dinyayê, hîna li zarokan cezayê kuştin û yên mîna recm, qamçîkirin, destjêkirin her dewam e.

Zordestiya şerên artêşan ku zarok tê de gelekî lêxistinê dixwin, dema ku jê birîndar yan jî bi seqetî xelas dibin, bi mebesta ku ji kesî re qala yên di bin bomban de dimirin, nekin. Lê şer ji kesên ku ne rasterast ji nebûna avê, a dermanan, a bijîşk û xwarinê dimirin bêtir mirovan wenda dike. Ew, çi tiştê li ser riya xwe di erdê radike, zarokan ji tiştên ji bo mezinbûnê pêdivî heye, ji dibistan, dispanseran mahrûm dike; heger hezkiriyên wan ên mîna dê, bav û mamosteyên jî tune neke.

Şer wan dike penaber jî: % 60'ê qerebalixa wan kampên bêserûber ku ji ber kêmasiya fînansî, ajansên Rêxistina Netewên Yekgirtî (Komîseriya Bilind a Penaberan, Programa Xwarinê ya Cîhanî) mecbûr dimîne ku para xwarinê ya rojane bi rêkûpêkî kêm bike.

A dawîn, şer zarokan dike leşker dema artêşên gerîllayî û carcaran hêzên hikûmetan bixwe roleke çekdarî dide wan û ji bo ku wan baş bikin kole, zorê dide wan ku bûyerên zordestiyê ku nayên xewnên mirovan bi wan dide kirin.

Piştî tabloyeke bi vî rengî, hûnê bêjin, peymaneke navnetewî ya derbarê mafên zarokan de, dikane çi bike? Pirseke li cih, pirseke neçar e ku problema tesîra norman li ser rastiyê, ya tesîra maf li ser hêzê. Ji bo kesên gûmanbar dinya, bi qasî ku tu carî nebûye, bûye şanoyeke zordariyê ku mafên ên herî ketî bi hawekî bobelat bin pê dike. Ên din, ewên ku ji bo sererastkirin yan jî kêmkirina tesîra wêrankirina bi zordestiyê, heger hew qasî hindik be jî, bawerî yekser bi hewcedariya dezgehên dadwerî tînin, ewê di naveroka vê peymanê de alavên pêşketinê yên bêqisûr bibînin.

Werger ji fransî
Cemil Denli

Tiştê ku zarokên me divê zanibin

Mirov dizane hemû guhertinên fermî yên di qada kifşkirina rola dibistanê de, ên li ser programan, li ser pedagojiyê, bi her hawî, mebesta wê, tevrakirina heyecanê ye. Em ji bîr nekin ku serhildan û heyecan cêwiyên hev in, ku heyecan demeke dirêj tevliheviya gel li ser pê disekinîne. Û ev yek ne dûrî aqil e, û hema bêje kêfxweşî ye, ji ber ku perwerdeya gelêrî perçeyekî bi komarê ve girêdayî ye, timûtim, bernameyeke fesalkirina hemwelatiyan e. Ev tê wê maneyê heger destpêkirina sala 2009'an, "zemîna hevbeş ya zanînê û ya rayedariyê" hêja ye ku em li ser bisekinin. Bêyî ku em hesab bikin bê "ji bo dibistana xwe azweriya Komarê" di wir de ye, ji bo mînakdayina wezîrê perwerdê Luc Chatel bîne ziman. Ev zemîna hevbeş ji naverokek û ji armancekê pêk tê: ew agahiyên ku zarok divê dema qedandina dibistana mejbûrî bi dest bixin, diyar dike, û bi vî hawî hêvî dike ku kultureke hevbeş ragihîne wan. Wek ku bz. Chantal (xwe hinekî tev li sûret dikir) digot, ew zemîna ku tê gotin ji bo "nifte" yeke ji bo serketinê û "rê"yek e ji bo "projeya perwedê ya netewî di nava dilê pakta komarparêzan de." Ev yek hema bêje wek li hevrasthatina sîdankê û ya maseya du bask û buha ya li Lautréamontê, lê belê gelekî dilkêş. Tenê dimîne ku mirov gelekî ji nêzîk de li niftê, li rê û li dil binere.

Nuhbûn, mirovê wêribe vê bêje... nûjeniya rêberxistinê, ev bêgûman qet ne wekhevkirin e, ku pêdiviya wê bi programkirinê tune ye ji bo xistina meriyetê. Terkkirina edebiyatê, bi taybetî ya "zimanê biyanî û zindî" ne avantajek e. Wê çaxê tê kifşkirin ku yê di vê qadê de girîng e, "pratîk" e, bi mebesta gengaziya "danûstendina bi hawekî hêsan lê bitesîr." Ev evolusyoneke yekcar xembar e, lê belê xuya ye ku êdî pêk jî hatiye...

Na, tiştê ku mirov dibehitîne, şolîkirina perwedeya dîrokê, û ya erdnîgarî ye ku navê "çandiniya humanîst" lê kirine. Ev eniyata li amadekirina para "çaniniyeke Ewrûpî" ye, ku wek xuya dike, û heman demê eşkere jî dike. Ev tiştekî ecêb e ku yek tekst li ber çavan du caran hatiye gotin. Mizgînî (tu nivîskar yan jî hunermend nebûye xwedî şerefa ku navê wî li bin nivîsê be, Qur`an tenê caekê hatiye nivîsandin). Ev yek hîna bêtir diyar dike ku nêzîkbûna "rastiya olî" divê bi "hişekî laîkî bi rêzgirtina ûjdan û baweriyê" pêk were. Wek ku rola perwerdeyiyê, ji hevderxistina navbera bawerkirin û zanebûnê tenê bi mebesta zanînê, baş nehatibe zelelkirin...

Ya ku hêj mirov bi fikar dike, ev e ku ev her du seksiyonên ku "rayedariya civakî û sivîlî" dane ser xwe û "serbixwetî û înîsiyatîfê" tev li hev dikin: Hewcedariya "pêşxistina hesteke aîdî welatê xwe, ya Yekgirtina Ewrûpayê." Ê ku gavê têra xwe li ber çav, û mejbûriyeta zanîna alîkariya pêşîn, ji hevderxistina otonomiyê mîna otoevolusyona ducar a zanîna avjeniyê, nîşandana motîvasyonê, a daxwza serketinê, û ya înîsiyatîfê mîna "rabûn û rûniştina bingehîn."

Her tim bi dubarekirina pirsa "entegrasyonê", gûmanbar e ku alîkariya sererastkirina "hemwelatiyekî Ewrûpayî" ji bo werziştê û ji bo amadekariya bazara serbest, bike. Lê belê dilxwaz e ku "rûmetên cîhanî" û "jihevcudabûna çandiniyan" bide ber hev. Ev "xistina lihevanînê" ya rêya dibistanî dişibe ku adaptasyona dezgehekê bêtir bilind bike ji bo nûjeniya lîbêral ku projeyên berê yên îspatkirinê, demeke dirêj sazûmankarê azweriya dibistana gelêrî ye. Li aliyê din, ev tewandina bimeraq ji bernameya dibistana dayikê ku lê bê tirs tê eşkerekirin ku zarok divê hînî "bingeha moral" a sivîlî bibin, balê dikişîne ser xwe. Ango tê vê wateyê ku "hurmeta ji şexs re û ya ji malê kesên din re, mejbûriyeta li gorî qaîdeyên ji aliyê mezinan ve hatiye nivîsandin, xwe sererastkirinê" ye. Em çi bêjin...

Werger ji fransî
Cemil Denli

FRANSA

Hunerê birêvebirina "pirsgirêka penaberiyê"

ERIC FASSIN*

Nicolas Sarkozy'ê ku wê demê serokê rêbaza Yekîtiya ji bo Tevgera Gelî (YTG) (1) ya di derheqê penaberiyê de bû, 9'ê Hazîrana 2005'an, xwest peyveke nû ya polîtîk bicerribîne ku serkeftineke mezin bi dest xist: "Ez dixwazim ji penaberiya ku li me bûye bar derbasî penaberiya hilbijartî bibim." Bê guman, penaberiya ji bo kar berî vê axaftinê jî hebû, lê belê bi vî awayî hate nûkirin: biryar di destê dewletê de ye, ne di destê penaberan de- yanî, vegera ku jê re dibêjin"bi dilê xwe" û dersînorkirina pejirandî ya bi pereyan, wê bi dû vê re were. Birêz Sarkozy bi dû re daxuyand: "Kî çi bêje jî, heqê Fransayê yê bingehîn e ku biryarê bide bê mafê kê heye ku were û li ser axa wê bi cih bibe û bê mafê kê tuneye." Alternatîfa wê bi vî awayî hate pêşniyarkirin, weke bersiveke maqûl ya li ser pirsgirêkeke weha ku him aborî ye û him jî siyasî ye.

Ji hêlekê ve, ev têgihiştin nayê wateya ku penaberî ji binî ve tê redkirin (dijberê wê, bi dengekî bilind tê gotin ku Fransa divê tim weke axa meleziyê bimîne). Ev têgihiştin, beyî heyecana ku jê difûre, awayekî têkelkirina bêgaviyên pragmatîzma aborî û israra xeta polîtîk e. Bi awayekî din jî, ew wê derfetê dide ku xwe bi temamî ji piştgirên vekirina sînoran û herweha ji piştgirên sifir-penaberiyê safî bikin, yanî çepên çep û rastên rast. Derfeta din jî ew e ku, çepên sosyalîst bi vî awayî ji warê xwe yê polîtîk bêpar têne hiştin, yanî xwe li nava herdu hêlên tûndrew dide bicihkirin.

Dîsa jî, dabeşkirina di navbera penaberiya "bar" û ya "hilbijartî" de bi nakokiyeke bingehîn ve dikeve nava xetereyekê: Ev sazkirina polîtîk hevdu nagire û li ser bingehê zanînekê jî nehatiye sazkirin (2). Ya rastîn, penaberiya"hilbijartî" penaberiye-ke weha ye ku bi kar ve têkildar e; ya"bar" jî bi taybetî behsa penaberiya malbatî dike. Lê belê, gava ku mirov li rastiya pirsê binere, herdu penaberî ne dijberên hev in. Ji hêlekê ve karker wê bê guman bibin xwedî malbat: ew bi tenê ji bo pereyan nayên. Ji hêla din ve, malbat bi pirranî li kar jî digerrin: peywendiyên mirovan ne li dijî hişmendiya aborî ne. Yanî, ev mijar him mijara mirovahiyê û him jî mijara hişmendiya rastîn e: Fikra ku dibêje 'qey malbat û kar di nava du cîhanên paralel de dijîn û tu peywendiya wan tuneye', fikreke bêserûber e. Bi kirtî, yanî çareseriya ku Birêz Sarkozy pêşniyar kiriye, ne çareya vê pirsê ye: mirov nikare him rêyê li ber penaberiya"hilbijartî" veke û him jî rêyê li ber penaberiya"bar" bigire.

Bê guman, hikumeta fransî hewl dide ku di nava herduyan de dengeyekê çêbike: ma penaberiya malbatî (hema hema) neh qatan ji penaberiya karî ne zêdetir e? (3) Nameya kar ya ku roja 9'ê Tîrmeha 2007'an ji Brice Hertefeux'ê wezîrê penaberan re hatibû şandin eşkere dibêje: *"Armanca te ew e ku penaberiya aborî bibe % 50'ê hejmara hemû penaberên ku hatine."* Yanî, bi kêmkirina penaberiya malbatî û bi zêdekirina penaberiya karî, weke ku ji rapora salane ya Komîteya Navwezîrî ya Kontrola Penaberiyê jî diyar dibe (4). Herçend di sala 2007'an de, rajeya beşê penaberiyê ya ku bi karî ve têkildar e li gora sala 2006'an zêde bûye jî (ji % 11.3 bûye % 14.1), ev yek bi "xêra" kêmkirina destûra mayi-nê ya ji ber sedemên malbatî ve hatiye bidestxistin. Digel diyarkirina sed û heyştê karên ku "ji ber nebûna daxwaza van karan" ji penaberan re hatine vekirin, rastiya hejmaran gellekî dûrî daxuyaniyên fermî ye: Heta dawiya 2008'an jî bi tenê 160 kesan destûra mayinê ya bi sedema "zanîn û zîrekî" wergirtiye!

Devjêberdana penaberiya "hilbijartî" ne ji ber bandora qeyranê ye. Rewşa nuha bi tenê derfetê dide ku encama ku ji hejmaran derdiket bihataya piştrastkirin. Gava ku mirov nameya ku 31'ê Adara 2009'an ji Eric Besson'ê wezîrê penaberiyê re hatiye şandin dixwîne, divê ev agahî jî di bîra mirov de be. Êdî *"karê bingehîn ew e ku kesên ku li Fransayê bêkar in bikarin kar bi dest bixin."* Gellekî balkêş e ku piştî ku ev name di çapemeniyê de belav bû, dewama vê hevokê ku digot *"yanî, ji ber ku warê desthilatdariya te ye, divê tu berê xwe bidî karên ku biyanî bi qaçaxî tê de dixebitin"* kes nizane çawa, lê ji belgeya fermî hat derxistin (5). Gelo êdî ev têgihiştin nabe biryara "tercîha Netewî"?

Hilbijartî be jî, ne hilbijartî be jî, penaberî tim û daîm weke pirsgirêkekê tê şirovekirin. Heger ne weha be, çima mirov carê qanûnên tûndtir li pey hev derxe? Piştî qanûnên Sarkozy yên 2003 û 2006'an, û qanûna Hortefeux ya 2007'an, nuha jî bê şik wê qanûna Besson jî derkeve. Bi awayekî eşkere xuya dibe ku têgihiştina Birêz Sarkozy ne li ser çareserkirina pirsgirêkê ye, bi tenê birêvebirina wê ye.

Danberheva daxuyaniyên wî yên 9'ê Hezîrana 2005'an û axaftina li ser siyaseta giştî ku Dominique de Villepin'ê serokwezîrê nû û raqîbê wî yê sereke roja berî wê li parlamentoyê kiribû, wê rewşê zelaltir bike. Herçend Birêz de Villepin behsa penaberiya "hilbijartî" (lê, ne ya "bar") dikir jî, wî bi dijberiya penaberiya îllegal û qaçax behsa wê dikir; wî li gora raqîbê xwe peyveke nû ava nedikir (an jî bê kompleks bû), wî êrîşî penaberiya ji ber sedemên malbatî nedikir. Lê belê, Birêz Sarkozy bi xêra hilbijartina xwe ya peyvan du kar bi hev re dikirin. Heta wê çaxê, gava ku behsa penaberiya "bar" dihat kirin, behsa penaberiya qanûnî û heqê dibû. Êdî ya ku diviya siyasetê rê li ber bigirtaya ew bû; yanî, şerrê li dijî penaberiya bi qaçaxî têrê nedikir.

Bi vî awayî, dersînorkirina penaberên ku bi qaçaxî li wira ne, di nava daxuyaniyên hikumetî de cihekî keyfî digirin. Xem nake: Hejmara kesên bêkaxez li Fransayê ne ewqasî zêde ye ku mirov rewşa wan bike pirsgirêkeke sereke. Li gora Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ku duwazde milyon penaberên qaçax nikarîbûn tev li hilbijartinên serokkomariyê bibûna, li Fransayê, ji bo amadekirina nîqaşên civakî yên li ser çend sed hezar penaberên qaçax û di nava xelkekî de ku nifûsa wî ji şêst milyonî zêdetir e, lazim e ku xebateke polîtîk ya mezin bê kirin. Pirsgirêka penaberiyê bi tena serê xwe nayê kirin; mirov çiqas behs bike, ev pirs ewqasî heye, û ji ber ku tim xwe nû dike jî ev pirs her dewam dike.

Birêz Sarkozy sala 2005'an weha behsa pirsê dikir: *"Ji hêlekê rêzgirtina li jiyana malbatî yek ji nirxên me yên bingehîn e û merceke tevlêbûyina civakî ye. Ji hêla din ve jî, anîna xelkê ya ji ber sedem û peywendiyên malbatî di nava penaberiyê de cihekî gellekî giring digire û dibe sedema gellek zexeliyan (zewaca sexte an jî ya bi zorê, zexeliyên li ser nifûsê...)."* Gelo hebûna zexeliyan dibe sedema ku hikumet bixwaze dengeyekê di nava wan de çêbike? Piştî wê jî encamên wê hene: *"Divê mirov biwêre û nîqaşê bi awayekî din bike. Hatina bi peywendiyên malbatî, bê guman mafek e, lê belê ne mafekî weha ye ku mirov bikare zagonan li gora xwe bi kar bîne."* Yanî, ez jî dizanim, lê dîsa jî...

Ji têkoşîna li dijî zexeliyan, em di cih de derbasî şiroveyeke nû ya hiqûqê bûn: *"Divê berî anîna wan bi awayekî ciddîtir li ser nirxandina rewşa kesên ku dizewicin ya aborî û cihê wan yê mayinê û tevlêbûyina civakî were rawestîn."* Jiyana malbatî êdî ne bes e ji bo tevlêbûyina civakî; jê bêtir, tevlêbûyina civakî êdî dibe şertên berî hatinê.

Gelo bi vî awayî behs dibe ku mafê jiyana malbatî li Fransayê xwedî nirxeke destûrî ye û Rêbaza Ewrûpî ya mafên mirovan jî, di xala 8'an de, diyar dike ku mafê her kesî ye ku"rêz li jiyana wî ya taybetî û ya malbatî were girtin? " Rapora komîsyona Mazeaud ya li ser çarçoweya destûrî ya vê polîkaya penaberiya ya nû di tîrmeha 2008'an de weha diyar kir: *"Herçend rêzgirtina li jiyana taybetî û malbatî mafek be jî, kontroleke xurttir dikare li ser bicîhanîna şert û mercên pêkanîna vî mafî were kirin"* û awayê vê kontrolê jî *"ji aliyê Komîsyona Destûrê an jî Dadgeha Yekîtiya Ewrûpa ve hatiye erêkirin."*

Li ser temamê bernameya têkoşîna li dijî penaberiya "bar" jî: *"Ji bo anîna kesên zewicî, divê rastiya zewacê û berdewamiya jiyana wan ya bi hev re bi*

** Sosyolog li Ecole normale supérieure, endamê Komeleya Cette France-là*

Bahram Hajou, (Two maids) - Efekt LMD kurdî

awayekî ciddîtir were kontrolkirin; divê mercên wan yên aborî û cihê mayina zarokan were saxkirin; berî mafê mayinê ya li gora zarokên wan yên ku li Fransayê ne, an jî hemwelatiya wan a fransî hebe, divê li ser peywendiya wê û bavan û peywendiya wan ya bi perwerdehiya zarokan re bi awayekî pirhêl lêkolîn were kirin; divê belgeyên wan yên nifûsê baş werin saxkirin û li wan were pirsîn; divê beyî îstîsna zewacên pirjinî werin redkirin; "Ceseda" [Kanûna hatin û mayina biyaniyan û penaberên polîtîk] civandina malbatî ya li welatê nû bi mafê rêzgirtina li jiyana taybetî û malbatî ve girêdide, divê binpêkirina vî mafî ku ji adetê zêdetir bilind bûye tim were kontrolkirin." Komîsyonekê jî, digel ku li dijî zextên serokkomariyê yên li ser kotayê li ber xwe daye û ji ber wê navdar bûye, herweha ev siyaseta nû pejirand û penaberiya malbatî weke pirsgirêkeke ku divê kêm bibe nirxand.

Qanûnên 2006 û 2007'an yên li ser penaberiyê û qanûna 2006'an ya li ser kontrolkirina zewacan, pişta herdu sedemên ku bi kêmanî ji sala 2003'an ve mafê jiyana malbatî kêm dikir xurttir kir: gumana li ser zexeliyên qanûnî û şert û mercên dijwartir ku berî civandinê divê bên pêkanîn. Di encama wê de, hejmarên li ser civandina malbatên ji zewaca duNetewî bi awayekî xurt kêm bûne: di navbera 2006 û 2007'an de, hejmara destûrên mayinê yên ji bo civandina malbatî hatine dayin % 10.6 kêm bûne. Rapora navwezîrî ku li jorê behsa wê hate kirin ji vê ketina hejmaran dilxweş e û dibêje ku ev kêmbûyin"*bi awayekî weha ye ku mirov dikare wê weke destpêka demeke nû jî binirxîne."*

Gelo çima "pirsgirêka penaberiyê" bi xêra îcadkirina "penaberiya bar" ji nû ve kete rojevê û çima di hezîrana 2005'an de? Hikumeta nû roja piştî redkirina bi referandûmê ya Peymana destûrî ya Ewrûpî dest bi karê xwe kir. Bi xema lêbixwedîderketina "wateya raya ku Fransiyan di 29'ê gulanê de eşkere kir", serokê YTG'ê di wê baweriyê de bû ku bersiveke duhêl dida"naparêzan." Nîşan dida ku yê din ku li wan bûye bar, bi awayekî kulturî û aborî, ji rewşa "tamîrvanê polonî" bêtir, di rewşa penaberê ku nemaze ji Afrîkayê tê de xuya dibe; ji hêla din ve jî, di demeke weha de ku gellek rayedaran red dikir ku derfetên wan ji destê wan bên girtin, hikumetê polîtîkayeke ji dil nîşan dida û cudabendiya di navbera penaberiya "hilbijartî" û ya"bar" jî ji vira dihat.

Hingê, li hember "desthilatdariya antî-Ewrûpî", Birêz Sarkozy "desthilatdariya Ewrûpî" diyar dikir. Ji dêleva siyaseteke penaberiyê ku wê Parîs ji Ewrûpayê bi dûr bixistaya, ev siyaseta nû wê bikiraya ku Paris bibe xwedî roleke bingehîn: *"Ez dixwazim ku Fransa êdî li Ewrûpayê bi awayekî sîstematîk bibe yekem welatê ku stratejiyeke penaberiyê ya li gora rewşa cîhana hemdem pêşniyar dike û ava dike."* Hevpeymana Ewrûpî ya li ser penaberan ku di dema serokatiya fransî de, 16'ê çiriya pêşîna 2008'an, ji aliyê Konseya Ewrûpî ve hate pejirandin, bû xala dawîn ya nîqaşên ku ji zû ve dest pê kiribû: ne bi tenê "pirsgirêka penaberiyê" di çarçowa Yekîtiya Ewrûpayê de tê nirxandin, lê herweha ev pirsgirêk êdî dibe navenda nasnameya Ewrûpî jî.

Ev serkevtina dîplomatîk bêguman ji xurtiya hilbijartînî ya stratejiyeke weha tê ku penaberiyê weke pirsgirêk bi nav dike, da ku pirsgirêkên din baştir di ser guhê xwe re biavêje, an jî, bi awayekî zelaltir, da ku awayên din yê nirxandina nerazîbûna ku di dema referandûmê re derket di ser guhê xwe re biavêje û bi vî awayî ji bersiva wan bireve.

Werger ji fransî
İbrahim Seydo Aydoğan

(1) Navê vê partiya polîtîk ya fransî Union pour un mouvement populaire (UMP) e. Di sala 2002'an de ji aliyê Jacques Chirac ve hate damezirandin. Ev partî, niha li Fransayê desthilatdar e û weke partiyeke rastgir û muxafazakar tê naskirin.

(2) Binerin: Cette France-là, 06.05. 2007 / 30.06.2008, weşanên La Découverte, Paris, 2009, bi taybetî r. 389-394.

(3) Di sala 2006'an de, di nava 183 hezar û 200 kesên ku ji bo demeke dirêj hatine Fransayê de, bi tenê 10 hezar û 700 kes ji bo kar hatine. Yanî hema hema bi qasî penaberên polîtîk ku hejmara wan 10 hezar û 200 e. Lê belê, kesên ku dikevin nava penaberiya malbatî 98 000 kes in.

(4) Secrétariat général du comité interministériel de contrôle de l'immigration, Les orientations de la politique de l'immigration. Cinquième rapport – décembre 2008, La Documentation française, Paris, 2009.

(5) Mirov dikare vê agahiyê li ser malpera Office français de l'immigration et de l'intégration piştrast bike. Lewre, vê malperê ji bo wersiyona ku mirov dikare daxe ser komputera xwe dawiya hevokê jê avêtiye, lê belê di wersiyona orjînal ya kopyaya wê nameyê de ew hevok weke eslê xwe hatiye jibîrkirin.

NÊZÎHEVBÛNA NEDIHAT PAYÎN A TEKNOLOJIYÊN NÛ

Dema pirîst, atom û gen dikin BANG**!

MATEO CUEVA*

Kîmya, biyolojî, fizîk, înformatîk û zanista robotan û hwd. nanoteknolojiyê ew anîn cem hev. Dikevin nav hev da ku perspektîvên nûbûnên serî li mirovan gêj bikin peyde bikin. Hin jê dikin ku hêviyên dermankirineke mûcîzewî ya nexweşiya pençeşêrê biçirûsin, di heman demê de yên din mirovan dibizdînin: bombeyên mînyatur, pirpirînk vediguherin balefirên keşfê yên zindî... Hin ên din jî xeyalên megalomanyak yên mîna şerê li dijî germbûna bahewayê bi belavkirina atmosferê, xwedî dikin.

Dema lêkolîner Eric Drexler têgîna "nanoteknolojiyê" danasîn wî ew weha terîf dikir: koma teknîka ku destûra çêkirin û guhertina objeyên maddî ku mezinayiya wan di navbera 1 û 100 nanometreyî de ye (1). Di rastiyê de ev deriyê vê pênasê gelekî fereh bû, lewra hema bêje tevahiya objeyên li dinyayê heyî li gorî vê pîvanê saz û avabûbûn. Riyên zanistî yên gelekî cihê mîna kîmya, zanista li ser maddeyan, fizîka rewşa maddeyê ya hişk, dermançêkerî, biyolojiya kîmyewî û molekuler, muhendisiya elektronîk bi vî awayî dibin yek, hem di warê têgînê de û hem jî di warê operasyonel de.

Nêzî çariyek sedsalê paşê li gora pîvana atomî guherîna cîsm destûrê dide têgîna nanostrûktûrên ku xwediyê xisletên gelekî zêde nû ne. Komeke fereh a zanist û tetbîqan –teknolojiyên biyo, teknolojiya ragihandinê, zanistên kognîtîf (têkildarî naskirin û zanînê) – bi hev re ketin nava danûstendinê. "Nêzîhevbûneke" neasayî ya beşên zanistî yên ku heta hingî nisbî têra xwe hev dû li derveyî hev digirtin, peyde bû; bi tevlîhevkirina bit, atom, noyron û genan di bin kurtenavê BANG de *big bang*ê bi bîra mirov dixe (nota wergêr)!

Di bernameyê de ev hene: paqijkirina erdê û avên di bin erdê de, çêkirina ekranên pan li ser hîmê tûpên nano yên karbonê, pîlên sivik û enerjiya wan zêde, teknolojiya biyonano (şopandina tevgera molekulên bi serê xwe di nava sîstemeke biyolojîk de), labaratuwarên tibî yên miniyatûr di çîpekê de. Ji niha ve kompûterên tên hilgirtin yên ku dikarin di nava saniyeyekê de bi milyaran kirariyan bikin hatin eşkerekirin (2), boyaxa fotoelektrîkî a çend santîmetroyan, metro kareya wê dikare di avahiyan û li ser riyan were bikaranîn, jeneratorên rojê ku hêza wan terawattek (ango 1000 gigawatt) e û hilberîna lezgîn a her cure berhemê nanoteknolojîk a ku kîlogramake wê bi dolarekê.

Artêş didin pêşiya pîşesaziyê, xwe dixin nava vê pêşbaziya "cîhana li jêr" ya ku weke ku fizîkzan Richard Feynman pêşî gotî "*gelek cih lê hene.*" Li Dewletên Yekgirtî ji gelek salan û vir ve ye ku tetbîqên eskerî beşa herî mezin ji budceya National Nanotechnologie Initiative distînin. Wezareta parastinê ya Amerîkî destekê dide lêkolînên di sînorên pîvana nanoyê de yên kîmya, biyolojî, elektronîk û beşa enerjiyê. Ajansa eskerî ya lêkolînên pêşketî ya Dewletên Yekgirtî (Defence Advanced Research Projects Agency, Darpa) ya ku di destpêkê de Internet çêkir, ji aliyê xwe ve destek da bernameyên ku ji bo modelçêkirina matematîkî ya qanûnên biyolojîk gelekî girîng in, pêşxistina protezên ku ji aliyê mêjî ve tên kontrolkirin yan jî çêkirina girêdana di navbera kêzîk û mekîneyan de ku dihêle mirov texmîn bike pirpirînkeke şevê vediguhere balefireke sîxuriyê ya dijî ku dikare ji dûrve were kontrolkirin û ajotin (3).

Di nava van projeyan de çêkirina saeteke atomîk li ser çîpeke elektronîk, hilberîna proteînên nû yên dermanker (antîkor, tamandina virûsên mirî) yên ku bi tenê bîstûçar saetan piştî dîtina virûsên şewbê yên nû werin çêkirin, her wiha hilberîna rêzek madde û cîsmên nû: kompûterên kuantîk (mêjiyên hesêb ên ku prensîba karê wan xwe disipêre xisletên kuantîk ên cîsm) (4), zanista şîfrekirinê (krîptografî) ya kuantîk, sîstemên veguhezandin û ragihandina optîk a bi kapasiteyeke gelekî mezin a daneyan.

Eger pêk werin, ev tetbîq wê ji bo bikaranîna sivîl jî bikêr bên. Belê sîlehên nano ku lêkolîn û hilberîna wan li Hindistan û Rûsyayê di 2004 û 2007'an de bi awayekî fermî weke karê pêşdetir hat dîtin, wê bi kêrî bikaranîna sîvîl neyên. Li sîlehên weke mîkrofuze, mîkrosatelît, nanocîsmên bi jehr yan jî nexweşker yên ku dikin mekanîzmayên heyî werin minyaturîzekirin, sîlehên bi tevahî nû zêde dibin. Mirov her wiha rasta mayinên dij-materyel ên gelekî piçûk (hêza mîkrogramekê bi qasî ya 44 kîlogram TNTyê ye) jî tê û ev ê destûrê bidin ku bombeyên termonukleer werin minyaturkirin (5). Li gorî nêrîna pisporan ev sîlehên gelekî zêde rûxîner wê her diçe gelekî hêsantir werin hilberîn û hilgirtin lê gelekî zehmet werin dîtin û bêtesîrkirin.

Informatisyenê vîzyoner Raymond Kurzweil, endamê Army Science Advisory Board – Komîteyeke ku erka wê di mijarên zanistî û teknolojîk de şêwirmendiya artêşa Dewletên Yekgirtî ye – liserhevkirina nanoteknolojiyên genetîk û robotîk ji bo mirovatiyê weke xetereke mezin dibîne. Li gora wî, êrîşeke terorîst yan jî eskerî ya nanorobotan yan jî cîsmên molekuler ên nexweşker ku ji wan re "cismê zelqokî yê cûn (fr. gelée grise; en. grey goo)" tê gotin, dikare "şaristaniyê" di nava çend rojan de tine bike. Kurzweil pêşniyar dike sîstemeke nanoteknolojîk ya xweparastina bedena mirov were avakirin. Lê belê ew di heman demê de gelekî bi kelecan û coş e der barê fikra ku ev teknîk wê karibin "pirsgirêkên gelekî kevin weke yên pêwendî kal û pîrbûnê yan jî nexweşiyê" çareser bike (6).

Ber bi homo sapiens 2.0 ve

Ji niha ve tiba nano alîkariya başkirina teknîkên teşxîsa nexweşiyan dike, bi taybetî jî ji bo dîtina bi dîmen û wêne. Weke mînak, canik Naomi Halas û Jennifer West ji Rice University (Texas) nanokapsûlên ji zêrê kolloîdal çêkirin. Ev kapsûl parçeyên ku ji çend milyon atomên zêr pêk tên in û stûriya wan di navbera çendek deh heta bi çendek sed nanometroyan diguhere. Xisleta wan a xuyakirinê (optîk) jî li gorî stûriya wan diguhere. Ev kapsûl girêdayî laskên asîda dezoksîrîbonukleîk (DNA) e ku xwe bêguman li ser deverên gilmikên kanserî (bi nexweşiya pençeşêrê ketî) datînin. Ango ew du funksiyonan bi hev re bi cih tînin, yek jê teşxîs e û ya din jî dermankirin e. Weke rojikan (camên ku cîsman mezin didin xuyakirin) ew pêlên nêzî 'ji sorê û wêde' (înfrarûj) dimijin, wan dikişînin bin çermê mirov û wêneyekî gelekî baş ê gilmikê derdixin holê. Dema doza pêlên roniya 'ji sorê û wêde' were zê-

** Ji dengê 'bang' ê (îngîlîzî) tê ku bi bikaranîna di teoriya afirandina gerdûnê Big Bang (teqîna mezin) de navdeng e (nota wergêr e)

* Remza karmendekî payebilind ê navnetewî

dekirin, ev yek têrê dike ku gilmika kansêrî were “pijandin” yan jî xirakirin.

Xisletên dij-mîkroban ên zîv ji hezarsalan ve tên zanîn: atomên wê vîrûs û bakteriyan dikujin. Dema derbasî pîvanên nanometrîk bibin, bandora piçikên wê pirrqat dibe. Destmalên birînan yên ku piçikên nano yên zîv li ser wan ji niha ve weke metayê ketin bazarê û kapasîteya wan heye ku di nav de bakteriyên xwe li ber antîbiyotîkan digirin jî bêhtirî sed û pêncî faktorên nexweşker tine bikin. Ji bo şerê înfeksiyonên nosokomiyal (nexweşiyên li nexweşxaneyan belav dibin, li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê pêncemîn sedema herî zêde mirov ji ber dimirin ev e), niha tê fikirîn ku cîsmên nano yên zîvî li alavên cerrahî bikin; her wiha di nava rûyên nivînan û perdeyan de jî wê werin bikaranîn. Ji 2006’an û vir ve şîrketa koreyî Samsung mekîneyeke şûştina cil û bergan xistiye bazarê ku bi ava sar bi bikaranînan iyonên zîv (ji nû ve dikarin werin bikaranîn) mîkroban tine dike.

Perspektîvên tiba nano dikin ku mirov xewnên xweş bikin; belê tehlûke heye ku ev xewn veguhere xewnereşkê. Raporeke rêxistina Netewên Yekgirtî ya ji bo perwerde, zanist û çandê (Unesco) li alarmê dixe: “*Di dema dirêj de tiba nano dikare bibe sedema guherîneke radikal a nifşê mirovî.Hewladanên mirovatiyê yên ji bo guherîna xwe li gorî dilê xwe weke dixwaze û dema dixwaze, dikare bibe sedem ku mirov êdî hew karibe behsa nifşê “mirov” bike* (7).” Transhumanîteyeke (ya ku ji sînordariya mirov bihûrî) bi *homo sapiens 2.0* şên wê serdemeke nû bide destpêkirin, ku têde wê piştî-mirovên (fr. Posthumain) xwediyê hêz û kapasîteya fizîkî û mêjî ya “zêdetir” hebin û ev piştî-mirov wê mirovên herêmên duyemîn ên ku di mirovatiya xwe de marjînalbûyî, bajon keviyan (8).

Ji niha ve em dikarin bitirsin ku tibeke nano ya ji bo dewlemendan fînansimana gelemeperiyê û hewldanên lêkolînê dixe nava tevgerê, tevî ku li seranserê dinyayê zêdebûna pirsgirêkên tenduristiyê girêdayî xizanî û newekheviya civakî ye. Ji piçikên nano yên zêrî bêhtir, pêdiviya welatên bi pêş dikevin bi siyasetên tenduristiyê yên pêşîgirtinê ku xwe disipêrin baş xwe xwedîkirin û banînê heye, bi gihîştineke giştî ya ava vexwarinê û perwerdeyê û her wiha bi “*dermanên pêwîst* (9)” heye.

Hingî naxwe, hêza şoreşgerane ya zanistên nano, di nêzîhevbûna teknolojiyên gelekî ji hev cihê (biyolojî, înformatîk, zanistên naskirin û zanînê, robotîk) de ye ku bi gotineke di cih de nanoteknolojiya întegrasyona wan misoger dike, ew anîne cem hev. Biyolojiya nano dihêle ku mirov xwe bi xwe kopîkirina sîstemên zindî kontrol bike da ku erkên gelekî nazik yên ji bo pîşesaziyê di çarçoveya pîvanên nanometrîk de werin pêkanîn. Weke mînak ji bo ku gerên elektrîkê û pîlên rojê yên fotosentetîk yên ji serî heta binî transîstor pêvekirî çêbikin, lêkolîner proteînên geyayê silkan yên ketine fotosentezê bi kartînin (10). Muhendis Carlo Montemagno şaneyên dilê cird bi sîlîsyûme re anî cem hev û bi vî awayî alaveke ku bi xwe kom dike û ji ber xwe dikare tevbigere çêkir (11). Bi fonên wezareta enerjiyê ya Dewletên Yekbûyî, genetîsyen û karsaz John Craig Venter li înstîtûya navê wî lê, vîruseke çêkirî ya piçûk hilberî. Bi van vîrusan mumkin e bakteriyên bi kêrî hilberîna hîdrojenê yan jî molekulên ‘CO_2’ qeyddikin tên werin çêkirin. Şîrket niha bi jihevderxistina pêkhatina vîrûsa H1N1’ê ango vîrûsa şewba berêz dilebike û her wiha ji bo anînacemhev a beşên zanistê biyolojî, genetîk, biyo-înformatîkê pisporiyekê çêdike ku wê bi kêrî zûtir ji hev derxistina pêkhatina rêza DNA’yê, genomîk û lêkolînên li ser siyaseta hawîrdorê were.

Nêzîhevbûna BANG’ê destê xwe dirêjî xweza û hawîrdorê jî. Şêwirmendê zanistî yê sereke yê hikûmeta Amerîkî rêzdar John Holdren ji bo şerê li dijî germbûna dinyayê lêkolîna muhendisiya jeo - projeyên radîkal ên mîna bi piçikên nano yên sulfatê belavkirina atmosferê da ku perde li pêşiya rojê were kişandin- erê dike. Berevajî vê, koma pisporan a navdewletî a der barê veguherîna bahewayê de (GIEC) ya Netewên Yekbûyî, ya ku ji bo muhendisiya jeo difikire ku “*gelekî spekulatîf e û nehatiye piştrastkirin, ku gelek rîsk û tehlûkeyên di ber re û pêre jî hene* (12)” bi dîqqet nêzîk dibe.

Ev dîqqet û dûrsekinîn eşq û kelecana mehendisên jeo naşikîne, yên ku dixwazin sîstema ekolojîk manîpule bikin û bi vê bahewayê biguherin. Rêbaza wan jî ew e ku darên genetîka wan hatî guhertin belav bikin yan jî cotgehên fîtoplanktonan ava bikin ji bo ku gazên karbonîk bigirin. Li gorî Vîktor Smetacek ê ji Înstîtûya Alfred Wegener a ji bo Lêkolîna Cemser û Deryayan (li Almanyayê) û Wajih Naqvi yê ji Înstîtûya Zanista Deryayan a Hindistanê, diyatomên (kevzêye deryayê yên yek şaneyî) ku li ser rûyê deryayan serav in, dikarin gazên karbonîk bi pîvanên gelekî mezin bimijin û piştî mirina xwe “*bi sedsalan*” wan li binê okyanûsan stok bikin.

Wan projeya Hindû-Alman Lohafex da destpêkirin. Ev proje “berdarkirina” herêmeke gelekî fereh a Okyanûsa Antartîk e, ku di navbera Çile û Adara 2009’an de pêk hat. Bi tonan sulfata hesin berdan okyanûsê da ku zêdebûna kevzê bidin destpêkirin û bilezkirin. Ev proje bi awayekî gelekî hişk bi biryara Konferansa Rêxistina Netewên Yekgirtî ya derbarê pirrrengiya biyo re nakok bû. Ev biryar di Gulana 2008’an de li Bonnê hatibû dayîn ji bo berdarkirina çêkirî ya okyanûsan jî mohlet dida. Ev ezmûn niha xuya ye bi bin ket, lewra eger kevzê gelekî zêde bibin, kêzikên deryayê yên piçûk û biqaqil (zooplankton) wan dixwin. Di vê navberê de şîrketên taybet ên mîna ‘Climos Inc.’ yan jî ‘Planktos Science’ê wan jî xwe avêtiye ser vê mijarê û projeyên ji wan re tê gotin “ekorestorasyon” pêş dixin. Hêvî dikin ku ji van projeyan gelek kar bikin (nivîsa di nava çarçoveyê de bixwîne).

Muhendisên jeo her wiha difikirin ku ew dikarin pirsgirêkên gerdûnî yên xwarinê çareser bikin. Ji niha heta 2017’an birçîbûn wê bandora xwe li milyarek û dused milyon mirovên heftê Netewên xizan bike (13). Welatên hînê pêşesaziya xwe dewam dikin di destpêka salên 1960’î de berhemên çandiniyê beşeke girîng a bazirganiyê bûn di aboriya wan de; ew îro ji wan welatan in ku ji ya difiroşin bêhtir berhemên xwarinê dikirin. Li tevahiya cîhanê deh hilberîner ji sedî 90’ê berhemên agro-kîmyewî (berhemên çandiniyê yên kîmyewî) û ji sê paran diduyên tuxm û tovên îmtiyazdar hildiberînin. Hêza wan ji hostatiyeke kamil a der barê hîmê zincîra hilberîna berhemên xwarinê bi xwe tê, ya ku tuxm, tov û genên wan jî digire nav xwe. Ji ber vê yekê eger reformeke ji dil û kûr ya rejîma patentan û mafê navnetewî ya xwedîtiya întellektuel neyê kirin, bi patentkirina manîpulasyona wê di çarçoveya pîvanên molekuler û nanometrîk de, pênc, şeş şîrketên pirrnetewî dikarin dest deynin ser mîrateya nebatî ya dinyayê hemûyî (14).

Di vê navberê de, taybetîkirina daneyên genomîk û xurtkirina patentên li ser teknolojiyên biyo yên nano misoger dike ku ev şîrket manîpulasyona nano kontrol bikin. Di 2007’an de tuxm û tovên îmtiyazdar (yên di yekdestiya huqûqa mafê xwedîtiya întellektule de ne) ji sedî 82’ê bazara tuxm û tovê bazirganiya wê tê kirin pêk dianîn. Dêwên agrokîmyayê (çandiniya kîmyewî) hevgirtinên tevahiya qanûn û rêzikên li dijî yekdestiyê binpêdikin, amade dikin. Bi yekkirina hewldanên lêkolînê û pêşxistinê, ji bo ku dawiyê li buhayê zêde yê ji ber parastina mafê xwedîtiya întellektuel derdikeve holê bîne, peymanan di navbera hev de mohr dikin.

Bi vî awayî ji bo ku ji 2010’an û şûn ve tovê garisê heşt guherînên genetîk têde hene (didu jê li dijî giyakujan, şeş jê jî li dijî kezikan in) hilberînin, Monsanto û Dow Agrosciences bûn yek. Mohra Monsanto li ser ji sedî 87ê erda çandiniya berhemên genetîka wan hatiye guhertin a dinyayê heye (15). Di rewşa krîzeke ji ber kêmbûna xwarinê ya dinyayê de, ji bo girankirina buhayan tevahiya kartên lîstikê di destê vê îndustriyê de ne; bi ser de jî ev îndustrî bi xwe wê bi veqetîna beşek ji erdên çandiniyê ji bo hilberîna sotemeniya ji berhemên çandiniyê bibe sedema vê krîzê. Di Tîrmeha 2008’an de Monsantoyê buhayê hin tovên garisê genetîka wan guherandî ji sedî 35 zêde kir.

Aboriya biyo (biyoekonomî) ku xwe dide der wê êdî nêzîhevbûneke teknolojiyên biyo, nano û agahdariyê derbixe pêş, ku di heman demê de wê kombûna sermayeyê li derdora çend şîrketên ku xwediyê zanîna kirinê û xwedîtiya întellektuel, bi lez bike. Dêwên enerjî, kîmya û berhemên xwarinê yên çandiniyê yên mîna DuPont, BP, Shell, Chevron ou Cargill jî wê parçeyek ji vê sermayeyê bin. Ya ku jêre “*aboriya şêkir*” tê gotin wê di serdema piştî petrolê de serdest be (16). Hilberîna îndustriyel wê xwe bisipêre “*şekir*” ku cewherê cîsmên di serî de biyolojîk (berhemên çandiniyê, daristan, kevzê û hwd.) e û xwe her wiha bisipêre veguhertina wan berhemên kîmyewî û nano yên buhayên wan zêdekirî. Ango tevahiya kîmyaya girêdayî petrolê wê karibe xwe adaptyeyî karbona nebatî bike (17).

Kirîna zêdebûyî, taybetîkirin

Nanoteknolojî

Di 2007’an de mezinahiya tevahiya bazara nanoteknolojiyan buhayê wê 135 milyar dolar bûn. Gelek bikaranîn û tetbîqên ku hêviyê didin hînê di qonaxa lêkolînên labaratuwarê de ne û hewldanên lêkolîn û pêşxistinê her diçe xwe zêde dikin. Li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê budceya ku ji National Nanotechnology Initiative ya ku 2001’ê ji aliyê rêveberiya rêzdar William Clinton ve hat damezrandin, di 2009’an de gihişte 1,5 milyar dolaran; lêkolîn li ser parastinê, zanistên bingehîn, enerjî û tenduristiyê ne.

Li Ewrûpayê şeşemîn çarçove-bernameya lêkolînan a Komîsyona Ewrûpayê (2002 – 2006) budceyeke 1.3 milyar euroyan ji lêkolînên qada nanoteknolojiyê re veqetand. Ev budce ji bo dema di navbera 2007 û 2013’an (heftemîn çarçove-bername) de gihişte 3,5 milyar euroyan; divê de yên pêşdetir jî zanistên nano, cîsmên nano, tiba nano, zanista pîvanên nano, lêkolîna bandorên civakî ne.

National Science Foundation (li Dewletên Yekbûyî) di sala 2000’î de texmîn kir ku bazara gerdûnî ya berhemên nanoteknolojiyê wê di 2015’an de bigihêje hezar milyar dolarî û bi vî awayî li seranserê dinyayê kar bide dused milyon mirovî. Belê di 2007’an de lêkolîneke serbixwe (1) texmîna bazareke hezar û pêncsed milyar dolaran kir, ango bi qasî bazara elektronîkê mezin.

M.C.

(1) “Halfway to the trillion dollar market? A critical review of the diffusion of nanotechnologies (Ber bi bazara trîlyon dolarî ve di nîvê rê de? Nivîseke rexnegir li ser belavbûna nanoteknolojiyan)”, Nîsana 2007’an www.cientifica. eu

û xistina bazarê ya çavkaniyên biyolojîk û tevahiya mîrateya nebatî ya seranserê cîhanê, krîza petrolê jî wê alîkar be, tevî daxwazeke mezin a kirîna cîsmên pêşî berhemên çandiniyê bûn, divê bibin sedema fikaran – ev hemû jî wê li pêşdebûna berhemên xwarinê yên welatên bi pêş dikevin bibin bar, lewra em pê dizanin ku hinekan ji van welatan yên mîna Madagaskar û Angolayê ji niha ve erdên xwe yên çandiniyê bi kirê dane şîrketên biyanî.

Dêwên îndustriya genetîk wisa didin xuyakirin ku çandiniya organîzmayên genetîka wan hatî guhertin dikarin ji guherîna bahewayê re bibin çareserî. 'Monsanto', 'BASF', 'DuPont', 'Syngenta', 'Bayer' û 'Dow'ê pêncsed patentên li ser genên "*adaptasyona bahewayê*" qeyd kirin (18). Naxwe çawa wê karibin ji giranbûna pirsgirêkên bahewayê kar bikin...

Werger ji almanî
Lokman Turgut



Science As Art (mrs.org) - Efekt LMD kurdî

---

(1) Eric Drexler, Engines of Creation: The Coming Era of Nanotechnology (Mekîneya Avakirinê: Serdema tê ya Nanoteknolojiyê),Anchor Books, New York, 1986. Ji bo bidestxistina dîmenziyoneke 20 nanometroyan divê stûriya pelekî çixarê 1000 carî were birrîn.

(2) 1018 kirarî di nava saniyeyekê de. Binêre li rapora "Productive Nanosystems. A Technology Roadmap (Sîstemên Nano yên berdar. Nexşerêyeke Teknolojiyê)",Battelle Memorial Institute û Foresight Nanotech Institute, Palo Alto – Columbus, 2007, rûpel 61, www.internano.org

(3) "There's plenty of room at the bottom (Li jêr têra xwe cih heye)", konferansa Richard Feynman li 'American Physical Society'ê, 1959.

(4) Mekanîka kuantîk ji stûnên yekûneke teoriyên fizîkê pêk tê ku navê giştî yê fizîka kuantîk lê têkirn. Ev navlêkirin li hemberî navê fizîka klasîk e, ku di pênasîna dinyaya mîkroskopîk –atom û pirîsk – û hin xisletên pêlên elektromagnetîk de bi bin ket (binêre li www.techno-science.net).

(5) Jürgen Altmann, Military Nanotechnology.Potential Applications and Preventive Arms Control (Nanoteknolojiya Eskerî. Bikaranîna Potensiyal û Ji bo Pêşîgirtinê Kontrola Sîlehan), Routledge, Londres, 2006.

(6) Raymond Kurzweil, "Nanotechnology dangers and defenses (Nanoteknolojî, Xeter û Xweparastin), www.kurzweilai.net

(7) Bert Gordijn, "Les questions éthiques en nanomédecine (Di tiba nano de pirsên li ser exlaqê)", di Nanotechnologies, éthique et politique de, Weşanên Unesco, Paris, 2008.

(8) "Nanotech Rx. Medical applications of nanoscale technologies. What impact on marginalized communities? (Bikaranînan tibî ya teknolojiyên di mezinayiya nano de. Bandora wê li ser civatên marjînalkirî wê bibe çi?)", Action Group on Erosion, Technology and Concentration (ETC Group), 2006, www.etcgroup.org

(9) Bixwîne: Germán Velásquez, "Hold-up sur le médicament (şelandina dermanan)", Le Monde diplomatique, Tîrmeha 2003'an.

(10) Alexandra Goho, "Protein power: solar cell produces electricity from spinach and bacterial proteins (Hêza proteînan: şaneyên rojî elektrîkê ji pelên silkan û proteînên bekteriyel hildiberînin), Science News Online, berg 165, hejmar 2, 5'ê Hezîrana 2004'an, di vê berhemê de jê hatiye girtin: "Un infiniment petit guide d'introduction aux technologies à l'échelle nanométrique et à la théorie du petit BANG (Rehbereke piçûk a nekamil li ser teknolojiyên di çarçoveya pîvanên nanometrîk de û teoriya BANG'a piçûk)", ETC Group, Hezîrana 2005'an.

(11) Roland Pease, "'Living' robots powered by muscle (Robotên zindî yên ku enerjiya wan ji goşt tê)", BBC news, 17'ê Çileyê 2005'an, www.news.bbc.co.uk

(12) Binêre li rapora 4'emîn a nirxandina GIEC, "Climate change 2007", Mijdara 2007'an.

(13) Stacey Rosen (di rêveberiya wê de), "Food security assessment 2007 (Nirxandina ewlehiya xwarinê 2007)", United States Department of Agriculture, Tîrmeha 2008'an.

(14) "Patenting the 'climate genes'... and capturing the climate agenda (Patentkirina 'genên bahewayê' ... û dîlgirtina ajandaya bahewayê), ETC Group, Hezîrana 2008'an.

(15) "A qui appartient la nature? Pouvoir des grandes sociétés et ultime frontière de la marchandisation du vivant (Kî xwediyê xwezayê ye? Hêza şîrketên mezin û sînorê dawî yê metakirina zindiyan)", ETC Group, Mijdara 2008'an.

(16) Li çavkaniya beriya vê binêre.

(17) 'DuPont'ê ji niha ve cîsmekî biyo ji mîkrobên çêkirî û şekir hildiberîne, ji bo ku parçeyê pêkhatina sereke a tayê 'Sorona'yê çêbike; ev ta jî wê bi kêrî hilberîna her şêwaz cawî were ji cawên tenik heta bi xaliyan. Binêre li Bio-era, "Genome synthesis and design futures: Implications for the US economy (Senteza genan û şikildana paşerojê: Bandorên muhtemel li ser aboriya DYA'yê)", 2007, www.bio-era.net

(18) "Patenting the 'climate genes'... and capturing the climate agenda (Patentkirina 'genên bahewayê' ... û dîlgirtina ajandaya bahewayê), li jor li jêre nota 14'an binêre.

Bîberonên kîmyewî

Dîroka bîsfênol A'yê (BPA) di salên 1930'î de dest pê dike, ango dema hat vedîtin ku ev pêkhatina organîk a ji aliyê kîmyagerê rûs Alexander Dianîn ve dawiya sedsala XIX. bi awayekî sentetîk hatî çêkirin, xwediyê xisletên ostrojenîk (pêwendî hormonên cinsiyetê yên jinan) e. Lê belê di bikaranînên tibî de bi lez pêkhatineke din dietulstilbestrolê (DES) cihê wê girt. Eva dawiyê ji xwe û me re weke derman dan jinên ku zarok ji ber wan çûn û di salên 1970'î de bû sedema karesateke tibî, gelek keçik bi qisûr û kêmendamiyan ji dayik bûn. Belê ti tişt winda nabe. Di nava tibê de BPA di çêkirina polîkarbonatan bû xwediyê "kariyerekî muhendisî." Xwediyê nirxên mezin e: Ew dihêle plastîk werin nermkirin ku ji bo nepoxan, ordekên serşokê yên plastîk û lîstokên din ên zarokan namzetekî baş e. Mirov dikare ne kêmî sê milyon tonan di salê de hilberîne. Mêyileke xwezayî ya BPA'yê heye: "cihê xwe diguhere, diçe û tê", dema tê germkirin vê yekê bêhtir dike. Ji ber vê yekê em di organîzmayên ji sedî 94'ên Amerîkiyan de rasta wê tên. Bi çi awayî û kîjan riyê ev dermanê binketî û kêrnehatî yê ku sîstema avzêkirinê ya bedena mirov ji xwe re dike armanca êrîşên xwe, karîbû bikeve nava plastîka bîberonan?

Di cîsmên kîmyayê de gelekî tevlîhev û zehmet e delîl werin peydekirin û kanser jî gelek caran sedemên wan pirralî ne. Der barê mijara BPA'yê de tevî benda asayî ya rapora "pisporan" yên ku ji aliyê îndustriyê ve tên fînansekirin, Kanadayê dîsa jî dawiya 2008'an biryar da ku nîşane têrê dikin mirov firotina bîberonên behsa me li ser, qedexe bike. Li Franseyê hin dergûşxaneyan (kreş) biryar da ku van bîberonan tine bikin. Piştî ku du salan veşart, şîrketa swîsrî SIGG neçar ma qebûl bike ku di kotiyên wê yên bafûnî de "şûna" BPA'yê heye. Li Kalîforniyayê meclîsa eyaletê dîsa jî 11'ê Îlonê pêşnûmeya qanûnê SB 797 red kir. Vê pêşnûme-qanûnê dixwest BPA'yê di bîberon û tasikên piteyan de qedexe bike. Li Koreyê, şîrkete xwarin û çandiniyê Samyangê hê nû hevpariyek bi şîrketa kîmyayê Mit- sibushi re da zanîn. Li gorî vê hevpariyê fabrîkeyeke ku wê karibe salê panzdeh hezar ton bîsfenol A'yê (BPA) hilberînê wê were avakirin. BPA di nav gelek berhemên kîmyewî yeke bi tenê ye. Piştî sedsalekê pêşketina bêkontrol a kîmyaya îndustriyel, êdî her roj derdikeve holê ku yek ji van pêncîhezar berhemên niha tên bikaranîn jehrî ye..

MEXMÛR

Gelo ya li ser tê nihurandin netew e?

LOKMAN TURGUT*

Tebaxa borî rojeva Tirkiyeyê bi gotina "pêşîvekirinê" kirasekî bi rengekî nû li xwe kir. Vê "pêşîvekirinê" bahsa hewldanên hikûmeta AKP'ê yên çareseriya dikir. Tevî ku bi nave "pêşîvekirina" kurd destpê kir, bi nave "pêşîvekirina demoktratîk" nav guherî û herî dawî kirasê "Projeya Yekîtiya Netewî" –hemin a tirk- li xwe kir jî, destpêka wê hêvî dida mirovan. Di nava siyaseta kurdan de bêyî ku zanibe ka gavên hikûmetê ji bo pêşîvekirinê çi ne, hema hema her aliyî destek dayê. Zêde dem nekete navberê û pêşî li vê "pêşîvekirinê" hat girtin. Ya rast ev proje di cihê xwe de bist bû û xitimî. Serokê PKK'ê Birêz Abdullah Öcalan, yê li Îmraliyê girtî, ji bo ku pêşiya vê pêvajoyê veke bang li PKK'ê kir ku hin koman ji Qendîlê û Ewrûpayê bişîne û xwest komek jî ji wargeha penaberan Mexmûrê biçe Tirkiyeyê. Li ser banga Öcalan, komên navê 'Aşîtî û Çareseriya Demokratîk' li xwe kirî ji Qendîlê (8 kes) û ji wargeha penaberan a Mexmûrê (26 kes) çûn Tirkiyeyê.

Ya rastî di destpêkê de çi çapeneniya Tirkiyeyê, çi siyasetvan û çi jî aliyê kurd, herkesî bi çavekî erênî li meselê nêrî. Ji bilî helwesta MHP û CHP'ê yên ku ji binî ve li dijî her gava ji bo çareseriya pirsgirêka kurd in, herkesê din xweşbîn bû. 18'ê Cotmehê ango rojekê beriya ku komên li jor bahsa wan hatî kirin biçin Tirkiyeyê, Serokkomarê Tirkiyeyê Birêz Abdullah Gül anî ziman ku ew ji pêvajoyê bi hêvî ye. 20'ê Cotmehê rojeva tevahiya çapemeniya Tirkiyeyê ev "Komên Aştiyê" bûn. Pêşwazîkirina wan jî mijara herî zêde derdikete pêş bû. Bi sedhezaran kesî kom li Silopiyê li deriyê Sînor ê Xabûrê pêşwazîkirin û li ser riya xwe ya ber bi Amedê ve ev hejmar bi giştî êdî gihişte milyonan. Bi vê yekê jî, bi yek carê hem nêrîna li meselê ya aliyê tirk guherî û hem jî atmosfer. Rojnameya Milliyetê 21'ê Cotmehê ji bo pêşwazîkirinê sernavê "Ji Xabûrê ber bi Amedê ve hêza xwe nîşan dan (1)" bi kar anî. Siyaseta heta hingî li ser teslîmbûna "34 PKK'yiyan" dihat meşandin, kiras guhertibû û bûbû "Poşman nebûn lê serbest in (2)." Li ser van bûyerên li ser hev hikûmet bizdiya, Serokwezîrê Tirkiyeyê Birêz R. Tayyip Erdoğan jî 24'ê Cotmehê daxuyaniyek da û got, êdî ew naxwazin koma ji Ewrûpayê, biçe Tirkiyeyê (25.10.2009 Milliyet). Nêzî mehekê paşê jî Wezîrê Karê Navxweyî Beşir Atalay li Moskovê daxuyaniyek da û got, 'ew li bendê ye ku beriya serê salê, nîvê penaberên li wargeha Mexmûrê vegerin Tirkiyeyê.' (21.11.2009, Zaman)

Awirên hikûmetê zîvirîbûn ser Mexmûrê. Di meha Gulanê de nivîskarê rojnama Milliyet'ê Derya Sazak di nivîsa xwe ya li ser çareseriya pirsgirêka kurd de bahsa vê mijarê dikir. Sazak digot, beriya ku gerîlayên PKK'ê ji çiyê dakevin, divê wargeha penaberan a Mexmûrê were valakirin (3). Jixwe koordînasyona sêqolî ya ku ji nûnerên Tirkiye, Iraq û DYE'yê pêk tê jî herî zêde li ser vê mijarê serê xwe diêşîne –di nava meha kanûna borî de jî li ser mijarê civiya. Dema mirov ji aliyê penaberan ve li mijarê binêre, ya heta îro qewimî, mirov dikare bi gotina pêşiyan "ez dibêjim nêr e, ew dibêje bidoşe" rave bike. Lewra her carê penaber dibêjin, "eger şert û mercên vegera me li Tirkiyeyê werin afirandin, em amade ne vegerin." Lê Tirkiye dixwaze bêyî ku gavên siyasî biavêje û ewlekariya penaberan a aborî, civakî û siyasî misoger bike, ew vegerin. Beriya Cejna Qurbanê jî êdî aliyê tirk jî qebûl kir, ji Mexmûrê wê ti komên mezin venegerin Tirkiyeyê, lewra divê pêşî gavên siyasî werin avêtin.

Baş e çi qewimî, çi hat serê van penaberan ku êdî ew biryarên xwe bi gavên siyasî ve girê didin? Yan jî gelo bi rastî ew evqasî siyasî bûne, yan ji ber trawmaya, şer li wan kirî, ew neçar kirine bi vî awayî tevbigerin. Ez ê hewl bidim bersivê bidim vê pirsê, lê ne bi argumanên siyasî, belê bi argumanên ku encamên xebateke di nav penaberan de derxistî holê. Ev xebat li ser wêjeya devkî û dîroka devkî bû, lewra jî dibe ku di warê zanista siyasetê de bersiva her pirsê nede û di hin waran de jî qels be. Dîsa jî ew di warê civaknasî û etnolojiyê de xebateke serketî û baş e.

Mexmûr çi ye?

Bêyî ku mirov dûvdirêj bike, Mexmûr qonaxa dawî ya serhatiya bêhtirî deh hezar mirovan a dawiyê ye. Di destpêka salên 90'î yên sedsala borî de şerê di navbera hêzên dewleta tirk û gerîlayên PKK'ê de li herêma Hekarî û Botanê gelekî dijwar bû. Dewleta tirk biryar dabû ji bo ku "qira masiyan bîne, deryayê zuwa bike"!(4) Herêmên pêşî bûn mexdûrê vê siyasetê Botan û Hekarî bûn û li van herêman dewletê dest bi valakirina gundan kir. Weke encam gelek mirovan berê xwe da Başûrê Kurdistanê. Di navbera 1992 û 1993'an de gelek malbat û kes li gundên li derdora Zaxo yên weke Derkar û Hîzavayê û li cem xizmên xwe yên li Zaxo bi cih bûn. Pirraniya penaberan di bihara 1994'an de neçar man gund û warên xwe bi cih bihêlin (5). Efseran, gundiyan kom kirin û du rê danîn ber wan: Yan wê bibin cerdevan, yan jî gundên xwe biterikînin; ji bo biryardanê jî demekî kin dabûn gundiyan (6). Piştî qonaxên mîna Etrûş û Nehdarê, Gulana 1998'an bêhtirî 10 hezar penaber piştî rêwîtiyeke dijwar a 6 salan li Mexmûrê bi cih bûn. Belê hem li ser serboriyên xwe, hem jî li ser serhatiyên xwe nihurandin û para bêtir jî lorandin.

Dema etno-muzîkologê yûnanî Yiannis Kanakis, li Bakurê Kurdistanê li nav kurdên ji cih û warê xwe kirî, rasta stranên siyasî û bi naverokên modern hat, fikirî ku ya li ser tê nihurandin netew e û gotinên stranan jî besîtkirî weke "gotinên stranî *di netewparêziya* (7) *kurd de*" bi navkirin (8). Ya rastî ji bo ku mirov di çarçova *nationalism discurs* a kurdan de bersivê bide pirsa 'gelo bi rastî ya li ser tê nihurandin netew e?' Mexmûr baştirîn labaratûwar e. Bersiva vê pirsê weke ku Kanakis dayî hêsan nîne, lewma bi serê xwe berferehiya mijarên stran û serhatî li ser wan tên gotin, cûrbecûriya serboriyan û pirrengiya hestan nîşan e ne ku bi me didin gotin, ev pirs wê bi gotinek û du gotinan bersiva xwe nebîne. Hemin, teza der barê *ethnisch-kulturelle Selbstbehauptung* ango 'xwe îfadekirina etnîk-çandî' de jî dikare bibe beşek ji bersivê, lê ji ber bandorên pirralî yên bûyerên trawmatîk ên bi salan ajotî û rola van bûyer û bi serê xwe trawmayê di pêkhatina stran û berhemên din ên wêjeya devkî de bi vê yekê têra xwe nayên ravekirin.

Bi salan bûyerên trawmatîk û trajîk di ser penaberên wargeha Mexmûrê re bihurîn (Ji bo agahiyan binêre li quncika dîrokçeya wargeha penaberan Mexmûrê). Ev bûyer, êş, azar, hêvî, siyaset û îdeolojiya van salan ji xwe re di berhemên wêjeya devkî ya penaberan de cih girt, lê ne bi rengekî safî û parzûnkirî. Ya hatibû serê penaberan kirasê xwe li berhemên wan jî kiribû. Heta bi bîranînên jiyana xweş a berê jî bi rengekî tên gotin ku êdî vegera wan nebe. Weke bi hatina payîzî re bîranîna bihara borî bi êş û elem, ev bîranînên demên borî yên bihuştî jî bi êş û elem in, lewra gundên berê şên êdî bûne hêlîna kund û pepûkan. Bûyera pêşî ku mirov dikare di çarçova zincîra bûyerên trawmatîk ên hatî serê penaberên li Mexmûrê binirxîne, *şerê qirêj* (9) e, ango bi darê zorê valakirina gundên wan û koçberbûna wan û xerîbiya *li welatê xwe bi xwe*.

Birêz Salih Xalidê Hîlalî yek ji wan dengbêjan e ku li gorî rêûresma *şairên* herêma Botan serboriya xwe ya trajîk bi stranî dibêje. Sala 1994'an li ser sînor eskerên tirk, Salih û sê kesên pêre digirin. Gefên kuştinê lê tên xwarin û bi riya bêtêlê destûra kuştina wî û hevalên wî tê xwestin. Ev destûr nayê dayîn, lê wî û hevalên wî dibin Tugaya Bağlıcayê cihê ku 45 rojan êşkence li wan tê kirin. Li wî cihê ku ew weke zindan bi nav dike, stranekê dinihurîne û bi xêra vê stranê jî tê berdan, lewra dilê subayekî bi wî dişewite. Ev strana bahsa me li ser, ne stranek e ku mirov weke anonîm bi nav bike. Heta mirov dikare bêje, bes şexsî ye. Lewra navê zarokên Salih û hevjîna wî jî di stranê de tên hildan û bi kite kit bahsa vê bûyere li jor, tê kirin. 24'ê Nîsana 1994'an jî ew dem e ku reng dide tevahiya serhatiyê û herî zêde tesîrê dike, lewma wê rojê nîşevê Salih tê girtin û hem êşkence û hem jî jiyana penaberiyê ya paşê wê

* *Lêkolîner, wergerê LMD kurdî*

destpê bike misoger dibin:

Were wey dinyayê, wey dinyayê, wey dinyayê, ez ê çi bikim feleka bavê Şiyar û Dîno çep lêdayê, rast lênayê

...

Wele xanimê sê neqla gazî dikê way xuha min Şemsiyê

Hey la mala te şewitiyê, qey ti nizanî îro serê sê roj û sê şevî temam e destê bavê Şiyar û Dîno êxistine bê xwediyê kelemça, berê wî dane tuxaya vê Şirnexê, wey la xuşkê em bê hîviyê...

Ev rêzên jor têra xwe zelal in ji bo ku piştrast bikin ku ev stran dikare weke *strana gelêrî* were bi navkirin, lê dîsa jî şexsî ye û li ser serhatiya bavê Şiyar û Dîno ango li ser serhatiya Salih Xalidê Hîlalî ye. Ez ê paşê zelaltir bikim, çima ez vê xalê derdixim pêş. Di tevahiya gotina vê stranê û çarçova gotina wê de netewya kurd bi awayekî taybetî dernakeve pêş. Ya der dikeve pêş peyva *dijmin* û nifirên li *dijmin û neyaran* (*Wele kulê tu bikevî mala dijmina, dîsanê van neyaran*) tên kirin e. Bi ser de jî ev dijmin û neyar nayên bi nav kirin; dîsa jî hem penaber û hem Salih bi xwe dizanin ku bi van gotinan bahsa Artêşa Tirk û eskerên wê dike. Ango ya li vir em dikarin niha bibêjin ew e ku komeke ku xwe weke *em* dibîne, di navbera xwe û yên ku weke *dijmin* dibîne xeteke stûr kişandiye. Ev koma *em* xwe ji komên din ên mirovan û civakan bi zor û zexta lê hatîkirin û rewşa xwe ya taybet cihê dike. Hemin, ev mirov hemû kurd in û sedema zordestiya li wan hatî kiri û tê kirin jî kurdbûna wan e.

Hayîneke ku Dayka Helîm gotî, pêvajoya penaberiyê û bûyerên trawmatîk ên girîng hemûyan kurt û Kurmancî tîne ziman. Dayka Helîm bi xwe dayika gerîlayên PKK'ê ye û zarokên wê jiyana xwe ji dest dane. Dayka Helîm dibêje, berê wê gelek stran digotin, lê îro para bêtir şînî û hayînan (lorîkên ji bo bi xew ve birina pitikan) dibêje. Dibe ku ecêb xuya bike, ji bo çi di hayînekê de mirov bahsa dîroka penaberiya xwe û êş û azarên xwe bike, lê di rastiyê de ji bo dayikeke kurd ku bi rêûresma gundewarî mezinbûye, ji hayînan baştir navgîna îfadekirina hestan nîne; ji bo vê jî divê bahsa bûyeran jî were kirin. Çawa berê dayikan ji zarokên xwe re dinuhurand û bahsa rojên xweş ên berê li mala dê û bavê xwe, xerîbiya paşê hatî û mirina bav, dê yan jî xwîşk û birayên xwe dikirin, Dayka Helîm jî bahsa serhatiya xwe dike. Dîsa ya di cih de balê dikşîne ser xwe bihara sala 1994'an e ango destpêka penanberiya dûvdirêj a ku hê dawî lê nehatiye: "*De bila bihara notûçara li min nehata; De bila bihara notûçara, jarê, li min nehata; Pete vî dijminî mala me wê xirabkirî; Bi topan û tangan û teyaran; Pe, berê erz û eyalên me dayî va sînora...*

Di vê hayînê de koma *em* û *dijmin* têra xwe zelal ji hev hatine cihêkirin û li dijî hev hatine danîn. Lewra berpirsiyarê bobelata hatî serê penaberan dijmineke ku xwedî tank, top û balefirên şer e. Ti şik û guman têde nîne ku ev dijmin dewleta tirk e û nifirên li vî dijminî tên kirin jî eşkere hestên koma *em* li hemberî *dijmin* didin nîşa: "*De kula Xwedê, şîna Helebê bikevê mala neyaran û dijminane...*"

Lewra vî dijminî bihara 1994'an gundê Dayka Helîm, Mijîn ê ser bi Qilabanê, wêran kiribû û kiribû ku Mijîn bibe *hêlîna pepûka û kundan*. Êdî Mexmûr jî amade ye bi gotinên payîzokan bibe navê bextreşiyeke êşgiran: "*Pe qulingo hayê hayê tu xelet î*; *Lo qulingo tu xelet î*; *Tu pişta xwe didê zozana, berê xwe didê deştika vê Mexmurê lo ber wî şetî...*

Çi bi zanîn, çi jî li hev hatî, Dayka Helîm bi dorê bahsa her gav û qonaxa penaberiya xwe dike, ji Etrûşê heta ber bi *sînorê Saddam* ve, ji wir jî ber bi Mexmûrê ve. Ji bilî van bûyerên bi rawestan û westan ê *mihaciriyê*, bûyereke din cihê xwe digire ku ne bi tenê Dayka Helîm lê her wiha Birêz Xatûna Kalikî û Evdoyê Goyî jî li ser dinihurînin. Ew jî bi awayekî dij-huqûqî girtina Öcalan û radestkirina wî ya Tirkiyeyê ye. Jixwe gelek stranbêj, şair û dengbêjên din jî daxwaza azadbûna Öcalan tînin ziman. Li Bakurê Kurdistanê jî Kanakis gelek mînakên van stranan kom kirine. Nuqteyeke din a li vir balkêş ji bo berhemên li Mexmûrê hatî tomarkirin ew e ku ev mijarên weha 'modern' di qalibê berhemên gelêrî yên weke stran, hayîn, payîzok û biharokan te hatine gotin. Ev jî nîşan dide ku çarçova hestan û nêrîna li mijar, bûyer û qewmînan jî ji vê çarçova gelêrî ser bixwe nîne û bandora wê nabe tine were hesibandin.

Ji vir û şûn ve argumanên palpiştiya îdîaya Kanakis bikin derdikevin pêşberî me; bi karanîna peyvên *şehîd* û *serokatî*. Lê ev jî bi tenê dema mirov wan bi serê xwe û îzolekirî bigre dest û binirxîne. Ez ê wisa nekim, lewra ji bo Dayka Helîm ku weke "*Dayka Şehîdan*" nav li xwe dike û li wargehê jî weha tê qebûlkirin, riyeke gelekî xwezayî ye, dema bahsa êş û azarên xwe dike bahsa "şehîdên xwe" bike. Li aliyê din peyva serokatî ku di salên dûvdirêj ên penaberiyê de îfadeya yekane hêviya vegera warê xwe ye jî nabe mirov bi tenê bi ambîsyonên siyasî şîrove bike. Di rewşeke bi vî rengî de dîlgirtina Öcalan û radestkirina wî ya Tirkiyeyê jî bûyereke bi êş û azar bû ji bo penaberên li Mexmûrê, heta bûyereke trawmatîk bû. Lewra dema Dayka Helîm dibêje "*Were derdo, sed cara li mi derdo, were derdo, sed cara li mi derdo*; *Pete serê ezmana rijan erdan; De bilanê cewabiya xêrê ji me re bihata, jarê; Bigota, serokatî wî hatî berdan*" divê mirov ne bi tenê karîzmaya Öcalan li ber çavan bigire. Dîlgirtina Öcalan ji aliyê gelek kurdan ve û bi taybetî ji aliyê girseyên li dora PKK'ê rêxistinkirî ve weke 'bêbextiyeke navnetewî' tê qebûlkirin, lewma jî hesteke kolektîf a xiyanetlêbûnê peyde bû (10). Karîzmaya Öcalan li aliyekî, gelek mirovan û bi taybetî jî kesên ku mexdûrê siyaseta terorê ya dewleta tirk bûn, Öcalan ne weke şexsekî, belê weke sembola îradeya siyasî didîtin û dibînin. Ev hisa kolektîf a bêbextîlêbûnê, dîtina Öcalan weke îradeya siyasî û rewşa zehmet a penaber têde, di stranan xwe dide der. Daxwaza azadbûna Öcalan di gelek berhemên wêjeya devkî de tê derbirîn û gelek caran dibe nifireke dijwar a DYE jî di nav de, li van hêzên jêr hatî kirin "*Were kulê dilê'm bikevîn nava meclîsa Îsraîl û Yûnanistanê, de hoyê hoyê hoy, û Kenyayê, lo û Kenyayê...*" Dîsa jî nifira herî xirab Evdoyê Goyî ji Enqerê û siyasetvanên wê re veqetandiye "*Were kulê de tu wê bikeve nava meclîsa dewleta tirka, na welehî bavo eskerê Roma; Welehî Xwedê pê nizane, ne qanûn e, ne kîtab e weyla nemayê ne nîzam e; Bêje ezê nakevim ber heyra girtin û kuştina mêra, terş û talana; Bêje sala, li ber wê salê li erz û eyalê me kirî weyla maqûlo qetlîam e...*"

Ji bilî van xalan, gelek berhem hene ku êşa ji ber ambargoyan penaberan kişandî, tînin ziman. Xuya ye, ev jî yek ji bûyerên trawmatîk e ku bandora xwe li penaberan kiriye û xwe herî baş bi gotinên em li "*Kurdistanê xerîb in*" dide der.

Bikaranîna navê Kurdistanê jî têde nîşanên hêmanên netewparêziyê di nav penaberên Mexmûrê de hemin hene, lê ya ku herî zêde darî çav ne ev e. Lewra di warê siyasî de ev girse li dor PKK'ê bi rêxistin e û PKK ne xwediyê armanca sazkirina dewleta netew ye. Gerçî peyva *mass-nationalism* jî ji bo netewparêziya PKK'ê weke netewke ne xwedî bazareke netewî, tê bikaranîn jî; ev nêrîn hemû, bi awirên ji rojava hatine nivîsin û ji bo şîrovekirina rewşa penaberên kurd ên li Mexmûrê ne bikêrhatî ne.

Tabloyeke giştî ya darî çav ev e ku di berhemên wêjeya devkî ya kurdên li wargeha penaberan Mexmûrê de mêyila bikaranîna peyvên di warê 'netewî' de hişyartir, heye. Belê, mirov nikare bahsa nihurandina li ser netew bike, lewra mijar çi dibe

Bahram

u, (Triumvirat)

bila be, ya pêşî derdikeve pêşiya me trawmayek e. Ji ber vê jî mirov dikare jêre bêje 'bi riya stran û girî ji heqî trawmayê derketin'. Hemin ev yek hebûna stranên modern ên 'netewî' û yên 'partiyan' mandel nake, bi tenê di navbera wan û berhemên wêjeya devkî ya penaberên Mexmûrê de xetekê dikişîne ku dikare bikêrhatî be.

Di encamê de erê Tirkiye dilê xwe xweş dike li valakirina wargehê difikire, lê ya ku divê Tirkiye serê xwe pêre biêşîne, ne bi tenê valakirina wargehê ye. Wezîrê Karê Hundir ê Tirkiyeyê Birêz Beşîr Atalay di Mijdarê de gotibû ew ê li ser esasê dildariyê wargehê vala bikin. Xuya ye li hin gavê siyasî û aborî fikirîne û dibe ku li ser hin modelên demborî jî hizirîbin. Lê mijar ji ya ku ew difirkirin zehmettir e, lewma penaber hê jî êşên xwe bi stran, hayîn, şînî û payîzokan tînin ziman. Ango li aliyekî ev trawma ya ku divê birînên wê vekirin, werin dermankirin heye, li aliyê din jî penaber eşkere û bi her awayî û her weha bi riya berhemên wêjeya devkî tînin ziman ku Öcalan nûneriya îradeya wan a siyasî dike. Eger wisa be hingê gelo mumkin e, ev gava pêşî ya ji bo 'çareseriya pirsgirêka kurd' bi hiştina li derve ya Öcalan, bi ser keve?

Dîrokçeya wargeha penaberên Mexmûrê

Piştî êrîşên artêşa tirk ên di bihara 1994'an de, cihê penaberan pêşî konê xwe lê vegirt gundê Qesrokê yê nezî Zaxoyê bû, paşê nêzî wir wargeha Bihêrê û wargeha Şeranîş çêkirin. Dema gundiyên ji cih û warên xwe hatî kirin, di sînor re derbas dibûn, veguherîn armanca êrîşên Artêşa Tirk û bi topên hawin û balefiran hatin bombekirin. Li gorî rapora TİHV'yê ya sala 1994'an hejmara kesên di bombardimanê de jiyana xwe ji dest dayî 8 e. Serhatiya penaberan li vir bi dawî nedibû. Li her du wargehan alîkariya zad û qût a Rêxistina Alîkariya Penaberan a Netewên Yekbûyî (UNHCR) kêm bû, lewra her roj hejmara penaberan zêde dibû û hêzên ewlekariyê yên herêmê jî destûr nedidan penaberan pêdiviyên xwe bi xwe ji Zaxoyê tedarik bikin. Bi ser de jî Artêşa Tirk ji Tabûra Kêrya Reş bi topên hawin hawîrdora wargehan bombe dikir da ku wargeh belav bibin. Ji bo ku weke penaberên siyasî werin qebûlkirin penaber li mala mamosteyan a Zaxoyê 28 rojan ketin greva birçîbûnê û hejmara wan jî di navbera 10 ta 12 hezaran de bû. Ji ber êrîşên dewleta tirk herdu wargeh hatin valakirin û 12'ê Îlona 1994'an nêzî gundê Bêsivê penaberan wargeheke nû ava kir. Piştî du mehan UNHCR çû wargehê. Ji bo ku biçin Etrûşê ambargoya zad û qut danîbûn ser wargehê. Destpêka sala 1995'an penaber neçar man careke din konên xwe bar bikin û wargeh vê carê li deşta Etrûşê ava kirin. Lê ji ber ku beşek ji penaberan hê di Cotmehê de berê xwe dabû Etrûşê, du wargehên 15 kîlometroyan ji hev dûr pêk hatin. Li ser daxwaza UNHCR'ê paşê ev wargeh wê di Kanûna 1995'an de bibûna yek. Li ser operasyoneke eskerî ya artêşa tirk li dijî Başûrê Kurdistanê, bihara 1995'an penaberên li Zaxoyê jî neçar man biçin Etrûşê.

Lê hê jî nedibû ku êş û azarên penaberan kêliyekê bihedinin, Nîsana 1995'an Tirkiyeyê ji UNHCR'ê xwest "xebatên gerîlayan" li wargehê rawestîne, rayedarên UNHCR'ê jî hebûna şervanên PKK'ê li wargehê derew derxist (11). Lê ev yek nîşane eşkere bû ku Tirkiye dixwaze wargehê vala bike.

Ji ber şerê navxweyî li Başûrê Kurdistanê, zext li penaberên Memûrê jî dihat kirin. Gelek penaber ji alî hêzên Başûr ve dihatin girtin. Ji bo berdana wan penaberan 17'ê Sibata 1996'an greva birçîbûnê da destpêkirin û gelek daxwazên xwe bi rayedarên Başûr û UNHCR'ê dan qebûlkirin. Lê belê ber bi payîzî ve ji nû ve ambargo danîn ser wargehê û UNHCR'ê jî di 21'ê Kanûnê de da zanîn ku ew wargehê digirin (12) û bi vî awayî penaber yekcar bê parastin man. Bi ser de Tirkiyeyê di hefteya diduyan a Sibata 1997'an de gef xwarin; eger wargeh neyê valakirin, ew ê wargehê dagir bikin. UNHCR a ji Cotmeha 1996'an ve alîkariya penaberan rawestandî, di Sibatâ 1997'an de ala xwe jî daxist. Bi vî awayî penaber ji nû ve neçar man koçber bibin. Penaber li herêma Dihokê li gundên mîna Semele, Qesrok û Çirê û li herêma Diyana jî li derdora devera Herîr belav bûn. Komekê jî konên xwe li herêma Nînova li gundê Museka vegirtin û ev der bû wargeha penaberan a ku paşê wê weke wargeha Nînovayê bihata nasîn. Lê ev wargeha êdî bi tenê 7 hezar penaber lê mabûn ji wargeheke penaberan bêhtir dişibiya girtîgehekê, lewra ketin û derketina wê bi awayekî dijwar dihat kontrolkirin û ambargo li ser hebû. Li hember zextên ser wan penaber bi zora xwe û tevî ku leşkerên rejima Saddam li dijî wan şîddetê bi kar anîn jî, ji sînorê navbera *save haven* –herêma ji aliyê DYE'yê ve parastî - û rejima Baasê derbasbûn û 14'ê Sibata 1998'an li devera Nehdarê bi cih bûn (13).

Ev çend mehên penaber li Nehdarê mayî, bûn dema wan a herî zehmet, lewra UNHCR'ê pêşî ji wan xwest vegerin, paşê jî alîkarî kêm da wan. Dema Îraqê ew weke penaber qebûl kirin, ji 24'ê Gulana 1998'an û pêve di nava 3 rojan de penaber anîn deşta Mexmûrê ku ji çolê pêve nedişibiya tiştekî din. (14) Penaberan ev çola hişk û zuwa di nava demeke kurt de veguherand cihêkî şên û tevî zehmetiyan hemûyan heta îro lê dijîn û hejmara wan jî li gorî daneyên UNHCR'ê nêzî 12 hezaran e.

(1) Habur'dan Diyarbakır'a Gövde Gösterisi, 21.10.2009, Milliyet

(2) Pişmanlık yok, ama serbestler, 21.10.2009, Milliyet

(3) 21.05.2009, Milliyet

(4) Ev gotin wê paşê bi awayekî fermî ji aliyê Serfermandarê Giştî ya Artêşa Tirk Doğan Güreş ve bihata gotin ku encama wê bi awayekî sîstematîk valakirina gundên li Bakurê Kurdistanê bû (binêre li International Free Women's Foundation 2007: 33). Sala 1994'an Cîgirê Serokwezîrê Tirkiyê yê wê demê Murat Karayalçın wê ev rastiya tahl nermkirî jî be piştrast bikira, li gorî wî heta Hezîrana 1994'an 900 gund hatibûn valakirin (Turkish Daily News 28.05.1994). Di dawiya sala 1994'an de nêzî 2000 gundî ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hatibûn valakirin (McDowall 1996: 438).

(5) Ji bo bêtir agahiyan bixwîne: Güneş, Hasan; Hedefteki Kamp: Maxmur I,II,III, IV (Wargeha Hedef: Mexmûr I, II, III, IV), Yeni Özgür Politika, Neu Isenburg 17 Cotmeh 2006, 18 Cotmeh 2006, 19 Cotmeh 2006, 20 Cotmeh 2006

(6) Xelkê herêmê di 24 heta 26'ê Adara 1994'an de baş pê hisiya ku Artêşa Tirk gelekî cidî ye. Di serî de gundê Şîrîş (bi Tirkî Sapaca) li devera Qilabanê 4 gund bi balefirên şer hatin bombekirin û di encamê de 3 sivîlan jiyana xwe ji dest da (binêre li rapora salê ya TIHV'yê (Türkiye İnsan Hakları Vakfı) ya 1994'an, rûpel 5).

(7) Ez bi dudilî vê peyvê bi kar tînim, lewra nizanim gelo di nationalismê de netewe tê parastin yan tê perestin.

(8) Binêre li Yiannis Kanakis, Chanter la Nation : la parole chantée dans le nationalisme kurde, in: Outre-Terre 10 (Turquie - Europe - Express 2014?), Parîs 2005

(9) Penaber bi xwe navê şerê qirêj, li şerê artêşa tirk li dijî PKK'ê meşandî dikin.

(10) Öcalan bi xwe di 19'ê Cotmeha 1998'an di bernameyeke Med TV de ku bi riya telefonê beşdar bû behsa bêbextiyeke navneteweyî kir.

(11) Binêre li quncika Dîrokçeya wargeha penaberan Mexmûrê.

(12) Binêre li International Herald Tribune 07.-08 Nîsan 1995

(13) Binêre li Untitled UNHCR press statement, 21.12.1996, di http://www.unhcr.org/news/NEWS/3ae6b8123c.html)

(14) Di raporeke parlamanterên PE'yê de weke sedem nebûna ewlekariyê û dagirkeriyeke muhtemel a Tirkiyê têne nîşan dan. Binêre li Vermot-Mangold, Ruth-Gaby; Humanitarian situation of the Kurdish refugees and displaced persons in South-East Turkey and North Iraq, Doc. 8131 der Abgeordneten Versammlung der EU, Brüssel 3. Juni 1998, rûpel 10-12.

KURDÊN LI ALMANYAYÊ

Di navbera întegrasyon û jixwecihêkirinê de

Reşad Özkan*

Heta bi derdorên kevneparêz, ti kes êdî vê yekê înkar nake ku Almanya welatek e ku penaber berê xwe didinê. Jixwe ji sedî 18.7'ê almanan jî xwedî serpêhatiyeke koçberiyê ne (1). Jiyana di nav civaka fireçandî de li Almanyayê li hemû qadên siyasî bû yek mijarên ku gelek tê guftûgokirin. Bi taybetî jî di demên dawîn de pirsên bihevrejiyanê û întegrasyonê bêhtir tên nîqaşkirin. Ji derengmayî û wêde, ev nîqaş, nîşandidin ku ji zû ve êdî ti kes nafikire ka di warê siyasî de divê piştgiriya întegrasyonê were kirin an na! Mijar bêhtir ev e; wê ev piştgirî çawa be? Demeke dirêj mijara koçberiyê bi tirs û fikaran, lê ne bi dilê xwe hatiye rojevê, ev yek jî şaşiyeke mezin bû. Bi vî awayî nifşekî koçberan gihişt wê baweriyê ku hê jî gelek qadên jiyana gelemperî û ya biryardana siyasî li wan girtiye. Bi ser de jî li wan tê zehmetkirin ku ew xwe li Almanya wek li welatê xwe hîssbikin (2).

Mijara ravekirina li jêr, pirsgirêkên koçberî û întegrasyonê ya kurdan e ku ew jî yek ji komên herî heterojen û mezin ên penaberan ên Almanyayê ne (3).

Întegrasyon û jixwecihêkirin

Ji bo ku em dêhn û bala xwe bidin întegrayon û peyva dijberê wê jixwecihêkirinê, divê herdû peyv jî pêşî werin ravekirin.

Ya ku mirov bi giştî ji întegrasyonê fahm bike xalên jêr in:

Ji nû ve pêkanîna hevgirtiniyekê, ango bihevvekirina ya aîdê hev. Yekîtiya sîstemeke civakî ku bi têkiliyên diyarkirî yên hêmanan pêk tê.

Endamkirina civakekê ya xweseran, bi riya qebûlkirina pîvanên nirxan ên civakî û pîvanên rabûnûrûniştinê.

Yekkirina civakên cihêreng da ku bibin unîteyeke mezintir, bi awayekî weha guherandina avahiyên civakî ku projeyên cihê yên jiyana civakî karibin pêk werin û li gorî wê pêşketina kesayetiyê mumkin be.

Di civakên jihevbûyî de di navbera întegrasyon û jixwecihêkirinê de pêwendiyeke rewşeke aloz derdikeve holê. Di vê rewşê de ya ku mirov ji jixwecihêkirinê fahm bike, li gorî taybetmendiyên diyar ên civakî yên mîna çînên civakî, dîn, etnîsîte, temen û cins jixwedûrkirin û lidervemayîna komeke şêniyan e (4). Ev rewşa aloz li aliyekî bi pêdiviyên koma xurt û desthilatdar, ji bo misogerkirina hevgirtina civakê reng digire. Li aliyê din kom jî yekoyeko pêdiviya wan heye xwe li derveyî komekê yan jî gelek koman bihêlin. Bi vî awayî li aliyekî daxwaza întegrasyonê li komên xwe li derve dihêlin, tê kirin, li aliyê din jî di heman demê de şert û merc ji bo jixwecihêkirinê tên afirandin. Lidervehiştin an jî jixwecihêkirinek dibe ku tevahiya hebûnê bihewîne nav xwe yan jî bi tenê yekoyeko hin qadên jiyanê (5).

Eger komeke keviya civakê yan jî hindikahiyek ji aliyê piraniyeke di warê aborî û civakî de li jortir li derve were hiştin (jixwecihêkirina bi darê zorê) ev yek hingî nîşana newekheviyeke civakî ye. Ev lidervehiştin dike ku hindikahiya bûye mexdûr bêhtir xwe di nava xwe de asê bike û bêhtir li pîvan û nirxên xwe yên çandî û şêwazên rabûnûrûniştina xwe xwedî derkeve (jixwecihêkirina bi dilê xwe). Wateya vê yekê ew e ku têkiliyên li derveyî komê jî her diçe zehmettir dibin, hem ji ber pêşhukmên der barê lidervemayîna bi dilê xwe de û hem jî ji ber ku diskrîmînekirin (6) êdî ji derve ve dibin xeter (7). Wekî din jixwecihêkirineke bi dilê xwe pêşketina piştgiriya di nava civaka li derve hatî hiştin de hêsan dike û pirrî caran dike ku lobiyên berjewendiyên xwe û navendên çandan werin damezrandin (8).

Li Komara Federal a Almanyayê jî di vê dema paşveketina aboriyê û bi vê ve jî eleqedar rewşa hevrikiyeke di bazara xanî û kar de, nîqaşên der barê întegrasyon û jixwecihêkirinê jî dijwar dibin. Întegrasyon û jixwecihêkirin bi serê xwe ne mekanîzma ne ku karibin ji aliyê civaka welatê dihewîne yan jî koçberên kar bi tenê ve werin birêvebirin. Ew li gorî herikînên civakî tevdigerin ku di tevahiya pêvajoya koçberiyê de divê weke renggirtinê were dîtin.

Koçberiya kurdan

Bûyer û qewmînên siyasî li herêmên kurdan bi awayekî zelal sedemên koçberiya wan nîşan didin. Di salên 60'î û 70'î de para bêtir koçberên karker bûn (9) ku bi daxwaza sîstematîk çûn Almanyayê da ku karibin rewşa xirab a aborî ya malbatên xwe baştir bikin. Rewşa weke şerekî navxweyî ya li Tirkiyeyê (12'ê Îlona 1980) (10) û şerê Îraqê kir ku her bêhtir mirovên ku rastî zextên siyasî dihatin û xelkê gundan ê ji ber şer bêkar û bêmalmayî çûn Rojavayê Ewrûpayê. Kurd divê bi rêzek pirsgirêkên taybet jî bikin der ên ku koçberên din nas nakin (11). Pirsgirêka wan a herî mezin ev e: ew weke welatiyên kurd nayên dîtin, ew weke welatiyên dewleteke din - weke Tirkiye, Îran, Iraq yan jî Sûriye – tên dîtin. Wateya wê jî ev e ku ew û zarokên wan hema hema hîç derfetên wan nînin ku doza mafên der barê çand û zimanên xwe de bikin. Bi vî awayî têra xwe û gelek caran zor li malbatên kurd tê kirin ku nasnameyeke din qebûl bikin (12). Dê û bav û bi taybetî jî zarok di navbera çandan hemûyan de mezin dibin û dikevine nava cot-qeyraneke nasnameyê: Ew hê bi tevahî neketine nav nasnameya alman, nasnameya kurdî ji dest wan çûye û zor li wan tê kirin ku nasnameya tirk an jî ereb qebûl bikin.

Di lêkolîna bi navê "di navbera întegrasyon û asîmîlasyonê de – derbarê rewşa kurdan li Munîhê de (13)" ev rewş ji nêz ve tê ravekirin û weke "avakirina cot-getoyê' tê tasnîfkirin. Encamên vê lêkolîna beriya çend salan hatî kirin hê jî heta mirov bêje bes, rojane ne. Bi ser vê de jî ji êrîşên 11'ê Îlonê û vir ve bi riya qanûnên terorê yên dijwarkirî kurd bêhtir tên astengkirin. Bandora vê yekê ne bi tenê li kurdên Başûr dibe yên ku ji herêma Îraqê ku ji dema şerê Îraqê ve bêhtir koçber bûne, her weha komeleyên çandê yên kurdên bakur jî dibin mexdûr ên ku jixwe her bêhtir mexdûrê gumaneke giştî ya terorîzmê ne. Bi vî awayî rewş ji bo tevahiya kurdan di warê parastina çand û zimanê xwe de zehmettir bû.

Dîsa jî ka em berê awirên xwe ji nêz ve bidin lêkolîna behsa wê hat kirin û bi taybetî jî hîpoteza "avakirina cot-getoyê" ya kurdan: Lêkolîn di çarçova civakî û siyasî ya bajarê Munîhê de pêk hatiye û mijara lêkolînê kurdên ji Bakurê Kurdistanê ne ya ku di nav sînorên komara Tirkiyeyê de ye. Pirraniya kurdên li Almanyayê ji Bakurê Kurdistanê ne. Bi vî awayî bi tenê beşeke kurdan ango rewşa kurdên bakur ên li bajarê Munîhê tê rohnîkirin. Mirov dikare dîsa jî encaman ji bo tevahiya kurdên li Almanyayê yên ji parçeyên din ên Kurdistanê jî bi kar bîne, lewma şert û mercên ji bo afirandina "avakirina cot-getoyê" li deverên din ên kurd jê tên jî hene. Li ser wan jî para bêhtir nasnameyeke ku ne ya wan e tê ferzkirin.

Hîpoteza "Rewşa cot-getoyê"

Li vir pêşî pirsên, mirov kengî û di kîjan şert û mercan de dikare behsa avakirina cot-getoyekê bike û bi kîjan krîterên zanistî mirov dikare "rewşeke cot-getoyê" tasnîf bike, derdikevin pêşberî me.

Eger mirov ji peyva "avakirina getoyê" ya hêsan destpê bike, hingî mirov bi awayekî zelal maneyeke peyva "geto" ya neyênî tesbît dike (14). Di bikaranîna rojane de pêwendiya peyva "geto" bi meyilên weke 'di ûrê

**Civaknas

Bahram Hajou, (Relief) - Efekt LMD kurdî

xwe de' bûn, nexwestina întegrasyonê û zehmetiyên ahengê re tê danîn. Ji ber vê yekê jî li peyvên beşa zanista bi mijarê re eleqedar de tercîh bikaranîna peyva "întegrasyona hundir" e. Da ku bi vî awayî aliyên erênî yên "avakirina getoyê" jî derkevin pêş. Dîsa jî nabe mirov van herdû peyvan weke hev bibîne: Ji peyva "întegrasyona hundir" ya divê were fêmkirin, tevneke civakî-çandî ya di navbera endamên jêre-çandekê de ye û di heman demê de ne mecbûr in li heman cihî bijîn jî. Li hemberî vê peyva "geto" nêzîkbûna endaman a li deverekê jî tîne bîra mirovan. (15)

Kurd bi ser de jî di nava hindikahiyekê de weke jêreçandekê tên tasnîfkirin. Divê meyilên wan ên întegrasyonê di bin van şertên taybet de li ber çavan werin girtin. Ango li vir li ser întegrayonê wê ji du aliyan ve were ponijîn. Di heman demê de divê were ravekirin, gelo kurdan bi maneya mecazî ji xwe re cihek çêkir ku di nav hindikahiya mezintir a tirkan de ye û ew jî di nava almanan de bicihbûyî ne. Ev ravekirina li gorî deverê gelekî baş li wêneyê "getoyan" tê, tevî ku "avakirina cot-getoyê" bi maneya xwelidervehiştina herêmî nayê fêmkirin û xwe dispêre jixwecihêkirina civakî (16). Bi ser de jî ev aliyekî nû ye ku heta îro bi vî awayî di lîtaraturê de nebûye xwedî cih. Ji ber vê yekê jî li vir divê peyveke nû were afirandin, peyva "avakirina cot-getoyê".

Weke ku em dibînin li pêşiya întegrasyona kurdan astengiyeke taybet heye, lewra ew ji aliyê civaka alman a ku wan dihewîne, weke gelekî bi serê xwe nayên qebûlkirin û weke beşeke hindikahiyên din (di mijara me de ev hindikahiya tirk e) tên dîtin. Ji ber vê yekê ji bo ku karibin întegrasyona xwe di civaka alman de bi ser bixin, divê ji benda 'xwe ji koma koçberên tirk cihêkirinê' jî bibihurîn. Encamên lêkolîna xwe dispêre ezmûn û hevpeyvînên li Munîhê bi giştî nîşan didin ku kurd ji întegrasyona nava civaka alman re gelekî amade ne, li beramberî tirkan jî rewşeke wan a xemsarî û heta aloz û pirsgirêkbarkirî heye. Gelo mumkin e di van şertan de întegrasyonek pêk were û pêk were çiqasî wê bi ser keve, guman li ser hene; di warê civakî de jî hê mijar nehatiye zelalkirin.

Ji bo ku em têkiliya kurdan bi koma koçberên tirk re îzah bikin, liberhevgirtineke yekser ya herdû komên koçber pêwîst e. Tevî gelek xalên hevbeş, cihêtiyên gelekî darîçav jî tesbît dibin ku mirov dikare bi derdora çandî ya kurdan dikare rave bike. Wekhevî û cihêtî li beşên jêr in:

Di herdû koman de jî têkiliyên civakî para bêhtir di derdora cîranan de tên danîn. Niyeta manê, welatîbûna Almanya û barkirina navenda tercîha jiyanê ber bi Almanyayê ve hem li cem kurdan û hem jî li cem tirkan, mirov dikare gelek caran bibîne. Li vir divê mirov li ber çavan bigire ku beşek ji kurdan xwediyê statuyeke gelekî nemisoger a manê ne, lewra ev kurd weke penaberên ji ber zexta siyasî koçberbûyî çûne Almanyayê û li bendê ne ku weke penaberên siyasî werin naskirin.

Berêxwedayîna çandî bi xwe, cihê ye, hev nagire: Kurd yan berê xwe bêhtir didin çanda xwe weke mînak angajmaneke siyasî ya xurttir ji bo welatê wan; yan jî çanda almanan tercîh dikin weke mînak diçin komeleyê almanan, saziyên wan yan jî ji çapemeniya tirk bêhtir ya alman tercîh dikin. Wekî din ji bo kurdên bi wan re hevpeyvîn hatî kirin dîn li gorî tirkan gelekî kêm xwedî rol e.

Razîbûna ji şert û mercên jiyanê li gorî rewşa heyî di herdû koman de jî ne zêde ye, ji bilî nirxandina standartên jiyanê yên ku tirk weke nisbî bilind dibînin. Hesta ku alman wan bi nasnameya wan tênagihin û fahm nakin, bêhtir kul û derdê kurdan e.

Der barê rewşa "cot-getoyê"

Divê di destpêkê de em tesbît bikin ku kurd û tirk du komên etnîk ên bi tevahî cihê ne ku koka wan, zimanê wan û çanda wan bi tavahî cihê ye û civakên wan jî bi awayekî gelekî cihê avabûne. Siyaseta asîmîlasyonê ya dewleta tirk a dehsalên dawiyê kurd weke "hindikahiyeke tirk" îlan kirin, tevî ku ew li herêmên xwe yên lê dimînin ango li Bakurê Kurdistanê piraniya şêniyan pêk tînin, dîsa jî bi tevahî redkirina biserêxwebûna wan a etnîk (17) dike ku statuyeke xweser a civakî û çandî nedin wan.

Ev rewş di penaberiya li Almanyayê jî dewam dike. Li vir jî kurdên ji Bakurê Kurdistanê civakî û çandî weke welatiyên Tirkiyeyê tên tasnîfkirin û bi vî awayî siyaseta asîmîlasyonê ya tirk tevî encamên xwe hemûyan li Almanyayê jî berdewam dike. Siyaseta asîmîlasyonê ya tirk ku birine Almanyayê, ne bi tenê bi awayekî pasîf pêk tê, bi awayekî çalak tê birêvebirin (18). Bi vî awayî weke mînak ne bitenê dersdayîna zarokên wan ên li dibistanê bi zimanê wan ê dayikê pêk nayê, bi ser de jî ji ber ku welatiyên Tirkiyeyê ne li ser wan tê ferzkirin zimanekî ku

para bêtir ji bo wan bi tevahî biyanî ye ango tirkî fêr bibin. Lewra ew ji bo rayedar û saziyên alman “tirk” in.

Nasnekirina hindikahiya kurd, zimanê wê û pêkhatina wê ya çandî li Almanyayê bandoreke gelekî texrîbkar li hisa rûmet û rêza ji xwe re û qebûlkirina civakî a welatiyên kurd dike. Ev yek dibe ku di qewlê dirêj de bibe sedem ku nasnameya kurdî ji dest biçe. Rêxistinên kurdan ên ku alîkariya xwe bi xwe dikin, hewl didin bi însiyatîfên xwe ziman, çand û wêjeya kurdî biparêzin, lê mixabin nikarîbûn heta îro bi awayekî fermî naskirina kurdan bi ser bixin û bikin ku pîvanên bi vê yekê ve girêdayî pêk werin.

Mafên demokratîk ên misogerkirî ku didin her hindikahiya din, bi riya dewletê nadin kurdan. Eger bidin kurdan jî bi tenê di ser rêveberiyên herêmî re û bêhtir bi rengê tawîzên hêsankirinê xwe didin der. Ev jî dikarin hema her wext ji aliyê dewletê ve werin astengkirin.

Bandorên rewşa “cot-getoyê”

Herdû komên koçber ku li ber çavên civaka wan dihewîne yek in, li gorî biyaniyên li Yekîtiya Ewrûpayê bi awayekî giştî bêhtir bi dîskrîmînasyona ji aliyê hevwelatiyên wan ên alman re rûbirû ne. Hem kurd û hem tirk biqasî hev ji ber vê rewşê mexdûr in.

Ji bo kurdan, ji ber ku nasnameya wan a kurdî nayê dîtin, ew bi ser de careke din rastî cot-lidervehiştineke din tên. Ne bi tenê li cihê wan ê kar û jiyana rojane ew weke tirkan tên dîtin û muamele bi vî awayî bi wan re tê kirin, li cem saziyên fermî jî welatîbûna wan a Tirkiyeyê têrê dike ku weke tirkan werin dîtin. Dezavantaj û zirara li wan dibe pirralî ye: ji ber nebûna rêxistin û saziyên kurdî yên mîna buroyên şewirmendiyê yên kurdî, kurd neçar dimînin xwe di nava tirkan de tasnîf bikin ango neçar dimînin biçin saziyên tirk û zimanê tirkî bi kar bînin. Bi vî awayî zimanê kurdî jî weke axaftvanê vî zimanî ji aliyê rayedarên alman ve nayê dîtin û payeya wê dadixin û wê dikin yek ji zaravayên tirkî. Di vê yekê de ne bitenê birîndarkirina nasnameya kurdî heye; eger kurdek zimanê xwe yê dayikê gelekî baş biaxive û di rewşên ji warê zimên ve zehmet de xwe bi tirkî rast îfade neke, dibe ku demborî encamên xirab derkevin holê.

Kurd têra xwe bi awayekî erênî û întegratîf li almanan dinêrin, dîsa jî rewşa aloz a siyasî di navbera kurd û tirkan de li Almanyayê jî xwe dide der û li danûstendinên aliyan yên bi hev re bandorê dike. Hewldanên întegrasyonê ku divê herdû alî bihev re bikin, bi tenê eger hindikahiyek bi tevahiya nasnameya xwe were qebûlkirin û danûstendineke çandî yekser bi vê hindikahiyê re pêk were dikare bi ser keve, ango eger danûstendineke dualî ya çandî di navbera civaka xwe întegre dike û civaka dihewîne nav xwe de pêk were.

Ji ber ku kurd ji aliyê almanan ve di nava koma tirkan de ku neqeba wan jixwe ne xweş e, tên tasnîfkirin, di întegrasyona xwe ya di nava civaka dihewîne de tên astengkirin. Lewma danûstendina bi wan re misêwa di şertên şaş de pêk tê, ji ber ku kurd di warê binyad, ziman, dîn û çandê de ji tirkan cihê ne. Ya ku li ber vê rewşê carinan radibe, malbata kurd e ku li penaberiyê jî jiyana li gorî eşîran a kurdan zindî dihêle. Lê jixwe bi taybetî dixwedebûn û vegera nava malbatê ango civaka xwerû kurd, xetera “avakirina cot-getoyê” di xwe de dihewîne. Ev avakirina “getoyê” xwe ne bi tenê disipêre statûya koçberiyê, lê xwe her weha disipêre lidervеyîxwehiştineke din ango weke kurd nehatin naskirinê.

Rewşa cot-lidervehiştinê ku li gelek qonaxan xwe dide der, ne bi tenê astengiyeke mezin e li pêşiya întegrasyonê, di heman demê de tehlûkeyekê jî di nava xwe de hildigire: helwesta erênî ya li beramberî întegrasyonê ku niha gelekî zêde ye li cem kurdan, eger çareseriya pirsgirêk û rewşên çewt ên heyî di demeke dirêj de xuya nekin, bi demê re ev helwesta erênî nemîne.

Li gorî lêkolînan, kurd li qadên cihê têra xwe întegre bûne. Ji bo ku bi giştî întegre bibin, divê weke hindikahiyeke bi serê xwe werin dîtin û bi vî rengî muamele bi wan re were kirin (19). Întegrasyoneke ku divê ji dîwarê hindikahiyeke din bibihure, ne mumkin e bi ser keve, lewra komeke din a koçberan ne bi tenê di warê çandî de guhertî ye, pêvajoya wê ya întegrasyonê jî guhertî ye ango dîrokeke întegrasyonê ya wê bi xwe heye (20). Ji ber ku di navbera herdû komên koçber de aloziya siyasî heye, rewş zehmettir e.

Li gorî vê bi tenê eger mirov kurdan ji nava koma tirkan derxe û weke hindikahiyeke bi serê xwe karibe di nava civaka alman de tevî maf û erkên pêve girêdayî hemûyan bicih bike û di vê yekê de bi ser keve, mirov dikare pêşiyê li avakirina cot-getoya civakî ya kurdan bigire.

Perspektîf

Tedbîrên ku di qewlê demdirêj de wê pêşiyê li “rewşa cot-getoyê” bigirin, bi tenê bi çareseriyeke siyasî ya esasî mumkin in. Tawîzên di siyaseta herêmî de ku xwe bi tevahî disipêrin hîmê çandî, eger şertên wê yên siyasî li qada dewletê neyên zelalkirin, her kêlî dikarin werin astengkirin û paşve werin girtin.

Siyaseta alman xwe nade ber ku kurdan weke gelekî bi serê xwe nas bike, lewra ev yek wê bibe sedem ku rewşeke aloz di qadên diplomatîk de bi hevparê wê yê bazirganî û NATO’yê Tirkiyeyê re çêbibe. Lê belê ji ber vê nasnekirinê her derxistina pêş a nasnameya neteweyî ya kurd heta ku bi tenê li ser qada çandî be jî, tê krîmînalîzekirin. Ev yek rê li ber tepisandineke çandî vedike û tehlûkeya “cot-getobûna” kurdan di xwe de dihewîne.

Tirsa ji ber anîna rewşa aloz a di navbera tirk û kurdan de bi vî awayî kir ku rewşeke aloz a di navbera kurd û almanan de peyde bibe, ji ber ku bendeke nikaribin jê bibihurin li pêşiya koçberên kurd tê danîn.

Werger ji almanî
Lokman Turgut

---

(1) Li gorî Saziya Statîstîkan a Federal a Almanyayê, 31.12.2008.

(2) Li ber bigire: Bauböck, Rainer; “Drei multikulturelle Dilemmata (Sê dîlemayên gelek-çandî)“ in: Ostendorf, Berndt (edîtor.); Civaka gelek çandî, München 1994, rûpel 237-255.

(3) Niha şêniya kurdên li Almanyayê di navbera 500 heta 800 hezarî ye. Zehmet e mirov hejmareke misoger û zelal bi lêv bike, lewra gelek kurd ne li gor nasnameyên xwe yên etnîkî, li gorî nasnameyên alman, tirk, iraqî, îranî yan jî sûriyeyî û heta wek welatiyên Lubnan, Ermenistan, Gurcîstan di statîstîkên fermî de cîh digirin.

(4) Li ber bigire: Lockwood, David; “Soziale Integration und Systemintegration (Întegrasyona Civakî û ya Sîstemê)”; in: Wolfgang Zapf (edîtor) Theorien des sozialen Wandels (Teoriyên veguherîna civakî), ji rûpel 7 û pê ve.

(5) Li ber bigire: Nieke, Wolfgang: “Situation ausländischer Kinder und Jugendlicher in der Bundesrepublik Deutschland: Vorschule, Schule, Berufsbildung, Freizeit, Kriminalität (Rewşa zarok û ciwanên biyanî li Komara Federal a Almanya: Beriya dibistanê, dibistan, perwerdeya pîşeyî, dema betlanê, krîmînalîte)” in: Lajios, Konstantin (edîtor.): Die zweite und dritte Ausländergeneration. Ihre Situation und Zukunft in der Bundesrepublik Deutschland (Nifşê duyem û sêyem ê biyaniyan. Rewşa wan û paşeroja wan li Komara Federal a Almanyayê), Opladen 1991, rûpel 18.

(6) Redkirineke xwe dispêre aîdiyeta komeke diyar, li ber bigire: Chaliand, Gérard; Kurdistan und die Kurden (Kurdistan û Kurd), berg 1, Göttingen 1988, ji rûpelê 21 û pêve.

(7) Li ber bigire: Nieke, pirtûka li jor bahsa wê hatî kirin, rûpel 16.

(8) Li ber bigire; Hoffmann, Lutz; Even, Herbert; Soziologie der Ausländerfeindlichkeit. Zwischen nationaler Identität und multikultureller Gesellschaft (Civaknasiya neyartiya biyaniyan. Di navbera nasnameya netewî û civaka gelek-çandî de), Basel 1984, pirtûka li jor bahsa wê hatî kirin, rûpel. 137; Heckmann, Friedrich, pirtûka li jor bahsê hatî kirin., rûpel 210; Bischoff, Detlef; Teubner, Werner; Zwischen Einbürgerung und Rückkehr-Ausländerpolitik und Ausländerrecht der Bundesrepublik Deutschland (Di navbera siyaseta welatîkirin û ya vegera biyaniyan de û mafê biyaniyan li Komara Federal a Almanyayê), Berlin 1992, ji rûpelê 194 û pêve.

(9) Ji bo agahiyên berferehtir binêre li Cherif Vanly, Kurdistan und Kurden (Kurdistan û Kurd) berg .3, “Die kurdische Diaspora in Europa (Dîasporaya kurd li Ewrûpayê)“, rûpel 57-72.

(10) Li ber bigire: Liebe-Harkort, Klaus: “Die Deutsche Rezeption der türkischen Kurdenfrage (Têgihiştina almanan a pirsgirêka kurd li Tirkiyeyê)“ in: Govara ji bo Lêkolînên Turkolojiyê (Zeitschrift für Türkeistudien -ZfTS), sala 7. 1994, defter 2, ji rûpel 221 û yên paşê.

(11) Li ser rewşa kurdên koçber binêre li Kizilhan, Ilhan; Der Sturz nach oben. Kurden in Deutschland. Eine psychologische Studie (Ketina ber bi jor ve. Li Almanyayê kurd. Lêkolîneke psîkolojîk), Frankfurt (Main) 1995; Wicker, Hans-Rudolf (edîtor.): Türkei in der Schweiz? Beiträge zur Lebenssituation von türkischen und kurdischen Migranten und Flüchtlingen in der Fremde (Tirkiye li Swîsreyê? Gotarên li ser rewşa jiyanê ya koçber û penaberên tirk û kurd li xerîbiyê), Luzern 1993; Kurden in Deutschland streben nach Anerkennung ihrer Identität (Kurdên li Almanyayê ji bo qebûlkirina nasnameya xwe têdikoşin), epd Dokumentation, hejmar 12/97, 3’ê Adara 1997’an; Kurden im Exil, Ein Handbuch kurdischer Kultur, Politik und Wissenschaft (Kurd li xerîbiyê, pirtûkek li ser çand, siyaset û zanista kurdî), berg 1, Berliner Institut für vergleichende Sozialforschung û yên din weşand., Berlin 1991; Ghaderi, Cinur; Eine sozialpsychologische Betrachtungsweise der kurdischen Situation (Nêrîneke civakî-psîkolojîk li rewşa kurdan); in: Kurdistan heute/Zeitschrift des Kurdischen Informations- und Dokumentationszentrum e.V. (NAVEND), hejmar 23, Kanûna 1997’an / Çileyê1998’an, rûpel 28-29.

(12) Ji bo vê mijarê li ber bigire Taylor, Charles; Multikulturalismus und die Politik der Anerkennung (Fire-çandîtî û siyaseta qebûlkirinê), Frankfurt am Main 1997, rûpel 29.

(13) Reşad Özkan: “Zwischen Integration und Assimilation – Zur Situation der Kurden in München (di navbera întegrasyon û asîmîlasyonê de – derbarê rewşa kurdan li Munîhê de)”, München 1999. Ev xebat weke karê mastirê di beşa Zanistên Siyasî ya Înstîtûya Geschwister-Scholl a Zanîngeha Ludwig-Maximilians li Munîhê hat çapkirin û nêzî 300 rûpelan e. Ev karê lêkolînê weha hatiye avakirin: Piştî destpêkeke teorîk di beşa sereke de şertên giştî yên kar û jiyanê ango derdora civakî û siyasî ya kurdan li Munîhê ji nêz ve di ber çavan re tê derbaskirin. Ev yek bi nirxandina lêkolîneke xwe disipêre ezmûn û hevpeyvînan pêk tê. Ev lêkolîna ezmûnî û hevpeyvîn , nivîskar li gorî lê hat di nava civaka kurd a li Munîhê de pêk anîn. Ev xebat wêneyekî rewşa kurdên li Munîhê ya meyila wê ber pêve heye nîşan dide û di serê pêşî de wê bi pêwendiya pirsa li “avakirineke cot-getoyê” dinirxîne û bersivdayîna heman pirsê mijara sereke ya vê xebatê ye.

Balkêş e ku heta îro xebateke din a lêkolîneke civakî ya evqasî berfereh nîne ku bi taybetî bi rewşa kurdên li Almanyayê re bi awayekî zanistî eleqedar bûye.

(14) Li ber bigire: Köksal, Sema; Refah Toplumunda “Getto“ ve Türkler (Di civaka xweşhalî de “geto” û tirk), İstanbul 1986, rûpel 11 û 32 û yên paşê.

(15) Li ber bigire: Elwert, Georg; “Die Angst vor dem Ghetto (Tirsa ji getoyê)“ in: Bayaz / Damolin / Ernst, Heiko (edîtor.): Integration. Anpassung an die Deutschen? (Întegrasyon. Ahenga bi almanan re?), Weinheim û Basel 1984, rûpel 53.

(16) Li ber bigire: Hoffmann / Even, pirtûka li jor bahsa wê hat kirin, rûpel 136.

(17) Derbarê dîroka qedexekirina zimanê kurdî binêre li Rumpf, Christian; “Das Sprachenverbot in der Türkei unter besonderer Berücksichtigung ihrer völkerrechtlichen Verpflichtungen (Qedexekirina ziman li Tirkiyeyê bi liberçavangirtina berpirsiyariyên wê yên li gorî qanûnên navneteweyî)” in: Orient, sal 30, hejmar 3, Îlon 1989, rûpel 413 - 426.

(18) Li ber bigire: Mönch, Roland; “Über die Notwendigkeit eines kurdologischen Instituts in Deutschland (Li ser pêdiviya bi înstîtuyeke kurdoljiyê li Almanyayê): Kurdistan-AG/ASTA-FU (edîtor.): Kurdologie, Berlin 1994, rûpel 21: “Almanya ji bo nêzî nîv milyon kurdî ji zû ve veguherî maleke demdirêj. Bi tenê eger siyasetên dij-kurd ên mîna li welatên Kurdistan parçekirine pêk neyên, Almanyaya ku ji koçberbûna wan bi awayekî her weha berpirsiyar e, ji wan re bibe welat.”

(19) Li ser mijarê binêre li Saydam, Abubekir; “Eine neue Chance, die nicht verspielt werden darf. Einführung des muttersprachlichen Ergänzungsunterrichts (MEU) in NRW (Şensekî nû ku divê neyê berba kirin. Destpêkirina dersa zimanê dayikê ya temamker li NRW’yê)” in: Informationsbulletin Kurdistan (IBK), hejmar 74, Îlon/Cotmeh 1997, rûpel 12- 15; Lankisch, Heidi: “Kurdische Namen in der Bundesrepublik Deutschland (Li Komara Federal a Almanyayê navên kurdî)” in: Kurdistan heute/Zeitschrift des Kurdischen Informations- und Dokumentationszentrum e.V. (NAVEND), hejmar 4, Sibat / Adar 93, rûpel 41-43.

(20) Binêre li Norbert Elias/John L. Scotson; Etablierte und Außenseiter (yên cihê xwe girtî û yên li derve mayî), Frankfurt/Main 1990.

QEYRAN LI AWÛSTRALYAYÊ ÇAWA XUYA DIBE?

Li Gladstonê kar li dijî wargehê

MATHIEU O'NEIL

Ji bo yekî ewrûpî, têgeha navenda endustriyel tê wateya febrîqeyên dorgirtî û ewrên li ser bajarên bakurî. Û tew, bi awa-yekî moderntir, mirov li megapolên çînî yên di nav mijê de difikire, koça ji gundan û çemên ku bi bermayiyên kîmyewî ve tije bûne tên bîra mirov. Ji ber wê, gava ku mirov di rojeke tavî de digihije Gladstone'ê, vî bajarê paqijiyê yê Queensland'ê ku di nava ronahiya rojê de ye, mirov di cih de sar dibe. Lengergehek û peraveke ku bi kompleksên endustriyel ve bilind bûne. Em panorameyekê bi lez çêbikin: di navê de, bajar û lengergeh; aliyê bakur, çiyayên komira ku ji nava erdê anîne; aliyê başûr, bênderên zadî û febrîqeya çimentoyê. Li bakurê wan hemûyan, hersê bixorîkên santrala elektirîkê ya ku hersal dûmana çar milyon ton komir berra hewayê dide. Li paş santralê, bi erebeyê bîst deqîqeyan dûrî bajêr, devera Yarwun'ê heye ku Orica (nîtrata amonyûmê û siyanura sodyûmê çêdike) û rafîneriyeke alîmunyû- mê ya nû tê de ye. Deh deqî-qeyan ber bi başûr ve, li ber pe-rê avê megarafîneriya Queens- land Alumina Limited (QAL) heye. Jê bi dûrtir, li ser girava Boyne'ê, febrîqeya hesin û polayan, Boyne Smelters Limited heye ku % 20'ê alîmunyûma awûstralî çêdike. Dawiya panoramayê.

Bajar lokomotîfa welêt ya afirandinê ye

Li seranserê dunyayê, daxwaza maddeyên xam yên endustriyê ketiye, lê gelo ev ketin dê bandora xwe li Gladstone'ê jî bike ? Ew Gladstone'a ku ji teqîna awustralî ya aborî, ku ji derxistina dewlemendiyên binerdê dihat, têra xwe îstifade kiribû. Gelo aborîzan behsa wê dikin ku duwanzdeh hezar û pêncsed kar dê wenda bibin û pênc hezarê wan jî ji çîriya pêşîna 2008'an heta bi nîsana 2009'an li Queensland'ê dê pêk werin Li Gladstone'ê, niha bêhna herkesî fireh e. Gellek febrîqeyên wan yên bin erdê hene û febrîqeyên çînî yên polayan jî pedivî bi enerjiyê ve hene : digel qeyranê jî, komir dê were, alîmunyûm dê bê çêkirin, keştiyên heta ber dev tije dê bi rê bikevin û hertişt dê weke berê be. Serokwezîra Queensland'ê Anna Bligh û serokwezîrê federal Kevin Rudd, ku herdu jî ji partiya karkeran in, diçin û tên û behsa planên vejînê û tedbîrên ku girtine dikin; bêkarî % 5'î bihuriye (ev çar sal in ku ewqas bêkarî peyda nebûbû). Lê na, dîsa jî ne xema wan e û xelk li Gladston'ê ji paşerojê hêvîdar e.

Herêm bi rastî jî xwedan lengergeheke weha ye ku li ser deryayeke bilind e, lê belê bi xêra giravekê ji oqyanûsê tê parastin, îklima wê germ û zuha ye; û herweha cihê wê jî ji bo çûyin û hatina bi têrênê ve gellekî baş e. Ji bilî van qozan, hin xebatên avakirinê yên giring jî dewam dikin, weke firehkirina rafîneriya alîmunyûma Yarwun'ê, an jî xebatên ku tavilê tên pêkanîn, weke lengergeha komirê ya nû ya li Wiggins Island'ê û termînaleke îxracata gaza xwezayî. Ji ber ku weke xerentiyeke li hember qeyranê tê hesibandin, birêvebirên dewletî û yên federalî li Gladstone'ê dezgeheke taybetî, Gladstone Economic and Industry Development Board (GEIDB), daye bicîhkirin ku rêyê bi ber pêşketina herêmê ve bixe. Li gora Birêz Gary Scanlan'ê birêvebirê vê dezgehê, bajar dikare bikeve nava çalakiyeke weha ku li Awûstralyayê wekî wê tunebe, ji bilî bakûrê rojavayê Eyaleta Awustralya-Rojava: *"û li wira jî... li sê çar herêman e, lê, li vira, bi tenê li herêmekê ye."*

Endustriya navdar Gladstone herweha ji bo tûrîzmê jî bûye qozekî nû: bi xêra wê, *grey nomads* tên vira. *Grey nomads* ew kesên teqawîtbûyî ne ku bi karawanan digerrin û li gora werzan cih diguherin. Ji bo wan, serdana deverên dîtinê tên organîzekirin. Birêz Tony Beers'ê ku nûnerê herêmî yê mezintirîn sendîkaya Queensland'ê ye, ku navê wê Australian Workers Union (AWU) e, gava ku behsa bajêr dike, dibêje ku ew lokomotîfa Awûstralyayê ya afirandinê ye û bi temamî *"Qibleya Endustriyel e."* Bi xêra *"şiyana xwe ya adapteya li gora guherînan, ev bajar her mezin dibe û ji bo Queensland'ê û ji bo neteweyê xwe her çê dike."*

Lê belê, digel axavtinên ku pesnê cudaheziyên endustriyel didin, weha xuyaye ku dewlemendiya Gladstone'a ku pêncî hezar kes lê dijîn, ji salên 1960'î ve ye ku ji binî ve bi metal û alîmunyûmê û bi Rio Tinto'ya ku wan çêdike ve girêdayî ye. Boksîta ku ji erda Weipa'ya li bakurê Queensland'ê bi keştiyên komirê tê, li rafîneriyên QAL'ê dibe alîmunyûm. Ev avahî, borî û tanqêrên rengesor ku bi awayekî ecêb di nav hev re derbas dibin û di nava wan re mijeke spî bilind dibe, nîşana mezinahî û saxlemiya şîrketê ye jî. Li gora xwediyên wê, *"giringtirîn rafîneriya cîhanê ye."*

Ev tevahiya kîmyewî di pey re li febrîqeyên Boyne'yê dibin alîmunyûm û enerjiya ku lê dice jî nêviyê wê enerjiyê ye ku santrala elektirîkê peyda dike. Agahiya xebatan ya li ser duqatkirina rafîneriya Yarwun'ê, ku di Tîrmeha 2007'an de hate dayin, giringiya vê endustriyê dipeyitîne. Ji ber wê ye ku herkes li ber ket gava ku Rio Tinto'yê, roja 7'ê Nîsana 2009'an, da zanîn ku li kargehên Yarwun û Boyne'ê nêzî şeşsed kes dê ji kar bên derxistin.

Li Gladstone'ê, hema hema hemû nîştecîhên mêr îşligên şînê vekirî li xwe dikin. Li ser îşligên karkeran xetên birqokî yên ji bo ewlekariyê hene, li ser yê karmendên birêvebiriyê jî logoya şîrketê heye. Birêz Cale Dendle'yê berdevkê meclîsa şaredariyê bi gumlegê xwe yê şîn eşkere dike: *"Heta ku agahdariya derxistina ji kar bi fermî nehat dayin, gellek kesan digot qey dê bûyereke piçûk be û kes dê lê ecêb nemîne; niha gellek kes şaş mane. Bê guman dê encamên vê jî hebin."* Agahî ne ewqasî zelal in. Li gora plana destpêkê, pêncsed û heftê karkerên ku ji bo şîrketên taşeron dixebitîn û panzdeh karkerên kargeha Yarwun'ê û bîst jî ji Boyne'ê dê ji kar bihatana derxistin. Hejmara dawîn dikare bigihîje heyştsed karkeran û belkî ji hezarî jî zêdetir be.

Xanim Maxine Brush'a endama meclîsa şaredariyê dibêje *"em fêr bûne ku kar carinan baş û carinan jî xerab be."* Ji ber wê, bajar li gora leza projeyan hatiye avakirin: rafîneriya QAL'ê di dawiya salên 1960'î de; febrîqeya hesînan û polayan di destpêka salên 1980'î de; piştî wan jî, Orica, nûkirina santrala elektirîkê, mezinkirina lenger-gehê, çîmentoya Awûstralyayê, û axir, Rio Tinto Yarwun. Birêz Scalan dibêje *"Her cara ku yek ji van projeyên mezin pêk hat, di encama wan de çerxeke "boom and bust" jî qewimî."*

Di awayê normal de, çalakî dest pê dikin, hêdî hêdî bi leztir dibin, digihîjin asta leza xwe ya dawîn, di pey re girantir dibin heta ku avakirin bi dawî dibe. Birêz Scalan dibêje *"Di rewşa niha de, ji dêleva ku hêdî hêdî giran bibe, dibêje tereq û disekine! Matmayin ji ber wê ye ku ev agahî ji nişka ve hat"*, lê ev matmayin herweha ji ber hejmara karkeran e jî ku dê ji kar bên derxistin: *"Pêncsed kes, hejmareke bilind e... Ev rasterast du hezar kesan têkildar dike û, kes nizane bê wekî din digihîje heta çend kesan."* Li gora Gary Thompson'ê rojnameya herêmî ya *Gladstone Observer*, *"herçend taşeron biçin jî, yên mayî dê kêmtir bixebitin. Lê belê, heyameke xelkê vira ya mezin heye ku tu carî tecrubeyên weha nejîyane, ev panzdeh sal in ku qeyran çênebûne."*

Li navenda alîkariya civakî, tedbîrên rewşa ku dikare were hatine wergirtin û ev tedbîr bi civîneke agahdarkirinê dest pê dike. Xanimek lodeke broşuran nîşan dide ku ew ê li beşdaran belav bikin (temiyên hiqûqî û yên aborî ji bo jin û mêran, ji bo kirêdaran û hwd.) û axavtineke naskirî dike: *"Berê jî ev hatiye sere me."* Li hêla sendîkaya însiyatîfê jî eynî peyv in: Ji bo Xanim Sandra Wiseman, *"kar baş an xerab bibe jî, em berê fêrî van rewşan bûne! Xelk dê ji kar bên avêtin... lê bi taybetî taşeronên ku ne ji vira ne dê di vê rewşê de bin. Ew fêr bûne."*

Gelo kesên ku dê ji kar bên avêtin çawa li vê meseleyê dinerin? Weke ku dihat texmînkirin, ew di vê mijarê de ras-terast dipeyivin, weke ku bar- meneke klûba babirkan dibêje: *"Rewşa mêrê min tim baş bû, lê gellekên din hene ku ne di heman rewşê de ne. Herkes di nava tirsekê de ye."*

Û hemû taşeron jî ne biyanî ne. Li gora Bob'ê ku ji bo şîrkete lokal ya taşeron dixebite, *"%80'yê xelkê li ser êgir e û nizanin bê siberojê dê çi were serê wan"*. Ew dibêje ku pirraniya

karê ku şîrketên taşeron dikin karê Rio Tinto'yê ye: *“Hin karkerên me hene ku mekîneyên xwe paqij dikin. Gava ku xebata Rio'yê kêm bibe, ya me dê dewam bike : bandora wê ji jorê heta jêrê li hemû bajêr bibe.”*

Heger hewil bidin ku bibin sendîkayî, karker wê ji karê xwe bibin

Ji hêla xwe ve, birêvebiriya Rio Tinto'yê dibêje ku li dunyayê, bazara alîmunyûmê % 60 kêm bûye û ji ber wê jî tu rêyên din li ber wan namebû. Dibêjin ku ew bi armanca dayina deynê xwe yê Alcan'ê a li Kanadayê bidin ku di Çiriya Paşîn a 2007'an kirrîbûn, xelkê ji kar derdixînin. Mesrefeke 38 milyar dolarî ya ku kiribû ku Rio Tinto li cîhanê bibûya ye-kem şîrketa afirandina alîmunyûmê. Koma wan hewil daye ku çavkaniyên xwe bilindtir bike û ji bo vê jî şîrketa çînî Chinalco jî xistiye nava bazara xwe. Li gora Beers'ê sendîkalîst, birêvebiriya Rio'yê di Çileya Pêşîn a 2008'an eşkere kiriye ku *“heger peymana wan ya bi Chinalcoyê re ji aliyê hikumetê ve nehataya qebûlkirin, ew ê mecbûr bimana ku du hezar û pêncsed karkerên li Queensland'ê ji kar derxistana... Şantajeke rezîl!”*

Axir, birêvebiriya Rio Tinto'yê hevkariyek bi BHP'ya nîv brîtanî û nîv awûstralî re pêk anî û bi vî awayî kula çavê hikumeta federal ya Birêz Rudd derman kir. Lewre, hikumetê him dixwast ji bo Çînê weke *zhengyou* (hevalê dilsoz) bimaya û him jî ketibû nava şerma ku bihêle ku Chinalco li ser maseya bazarê him bibûya bikir û him jî firoşkarê maddeyên xamyên endustriyê. (1) Eşkerekirina vê peymanê, li Gladstone'ê, bû cihê kêfê ji ber ku dihat gotin ku rafîneriya Yarwun'ê dê bihataya girtin. Bi qasî ku Thompson dibêje, xelk piştî eşkerekirina yekem ditirsiyan, lê rewş belkî niha ne ewqasî xerab be: *“Herçend hin kes ji kar hatibin avêtin jî, hê bajêr dewlemendiya xwe ji dest nedaye.”* Ma gelo ev encama qeyranê ya bingehîn e? Hat dîtin ku qedera Gladstone'ê bi temamî bi ya Rio Tinto'yê ve girêdayî ye.

Li gora Birêz Beers, *Gladstone Observer* xwe amade dike ku hin nivîsên rexnegir li dijî vê koma endustriyel biweşîne. “Rio”yê, yan bi temamî yan jî beşek ji wan karên ku ji wan re dibêjin “pênc qerase”yên (the Big Five) Gladstone'ê bi dest xistine: febrîqeya Boyne'ê, herdu rafîneriyên alîmunyûmê, santrala elektirîkê û hin ocaxên komirê. Ev kom rasterast patrona hemû karkerên bajêr e; lê bi awayê ne endîrekt jî hemû şîrketên lokal bi wê ve girêdayî ne. Hêviyên li ser hêzên cuda ji avakirina terminala îxracata gaza avî tê kirin, herçend ew terminal dê heta dawiya 2010'an pêk neyê jî. (2) Ji bo nuha, hêza Rio'yê xelkê aciz dike. Thompson dibêje ku *“îroj gellek acizî ji ber vê hene, bê guman ji ber ku li gora gellek kesan Rio Tinto'yê guh nedaye erkên xwe yên axlaqî yên li hember civatê... Rio bi tenê bi Rio'yê ve alaqedar dibe.”*

Ev tiştê ku li Gladstone'ê jê re dibêjin “modela Rio'yê” – pêywendiya rasterast ya di navbera patron û karkeran de, beyî ku sendîka tev lê bibe – encama pêvajoyekê ye ku di 1993'an de dest pê kiriye; Birêz Paul Keating, serokwezîrê Partiya Karkeran, derfetên bazara di navbera şaxên endustriyê (*industry bargaining*) û kargehan (*enterprise bargaining*) de wê hingê kêm kirin. Sê sal di pey wê re, John Horward'ê ku gellekî konservator bû desthilatdarî wergirt û da ser rêyeke din: êdî behsa “*industrial relations*” (pêywendiyên civakî yê li şaxan) nabe, lê belê behsa “*workplace relations*” (pêywendiyên civakî di warê kargehan de) dibe.

Bahram Hajou, (Couple)

Bi bidestxistina serweriya Senatoyê ya di 2004'an de, ko-servatoran derfeta pêkanîna bernameya xwe ya bi nave *Work Choices* bi dest xist. Mafê sendîkayan yê ketina kargehan hate bisînorkirin; zagonên ku karker li dijî jikaravêtina deradetî diparastin êdî bi tenê ji bo şîrketên xwedan zêdetirî ji sed karkeran dihatin pejirandin. Karkerên îmzekirina peymaneke AWA qebûl nedikir jî êdî karîbûn *“ji ber sedemên teknîkî”* ji kar bihatana avêtin.

Li gora Birêz Beers, li Gladstone'ê bi tenê peymaneke hevpar heye. Li QAL'ê: *“Li Boyne û Yarwun'ê, hema hema bi awayekî eşkere ji karkeran re tê gotin ku heger hewil bidin ku bibin sendîkayî, ew ê ji kar bêne avêtin.”* Dîsa jî, ew bi bîr dixe ku Gladstone bûye yek ji giringtirîn devera liberxwedana karkeran ya li dijî *Work Choices*'ê, lewre şeş hezar xwepêşander li dijî vê reformê daketin kolanan û dijberiya wan bû yek ji sedemên ku ji ber wan di 2007'an de hikumeta Howard ket.

Weke ku zanîngeh jî di bin bandorê de be

Zagoneke karî ya nû ya bi nave *Fair Work* bi serkê-şiya Julia Gillard'ê hate pejirandin ku Gillard wezîra per- werdehî û karan e û herweha duyem xurttirîn navê hikumeta niha ye. Êdî hema karkerek bi tenê jî daxwazê bike, sendîka dê karibe bikeve kargehan û herweha parastina li dijî jikaravêtinên deradetî jî ji bo wan şîrketan e ku bi kêmanî xwedî panzdeh karkeran in.

Dîsa jî, Rio Tinto'yê derfetên Work Choices'ê heta dawîn bi kar anîne. Thompson dide zanîn ku heta demeke nêzîk jî “*sendîka nikarîbûn têketana kargehan ji bo dîtina ka bê çi li wira tê kirin an jî ji bo bazara bi birêvebiran re. Pêwîst bû ku bi karkeran re li derve bipeyivîyana... Ji serê pênc salan e ku ev cara yekem e ku sendîka êdî dikarin têkevin febrîqeya Boy-ne'ê û “perdeya hesinî” derbas bikin.”*

Jim'ê ku em di balafairê de lê rast hatin taşeroneke û ji Tazmanyayê ji bo paqijkirin û tamîra mekîneyên febrîqeya Boyne'ê hatiye Gladstone'ê. Dide zanîn ku ew û hevalên xwe mecbûr in ku gava ku derkevin

bajêr, heman îşligan li xwe bikin. *"Ji bo çi? Ez nizanim. Belkî naxwazin ku kes bizane bê çend karkerên serbixwe li cem wan dixebite..."* Rast e, gellek karkerên ku peymana AWA'yê red kir, mecbûr hatin hiştin ku bibin taşeron. Li Gladstone'ê, Rio Tinto'yê piştgirî da wegirtina karkeran ya bi awayê taşeron, teva taşeronên demkî. Bi vî awayî, şîrket êdî ne bi îzina karkeran, ne bi tendurustiya wan û ne jî bi baca wan ya dewletî re serê xwe diêşîne û ne jî mesrefên jikar-derxistinê dê li serê wê bibin bela.

Weke ku zanîngeh jî di bin bandorê de be. Li Central Queensland University'ê navendeke lêkolînên muhendîsiya metalên sivik heye ku nave wê Process Engineering and Light Metal Centre (PELM) e û bernameyên wê bi hevkariya şîrketan tê avakirin, da ku *"bi awayekî zelal alîkariya pêşketina wan bike"*(3). Lê belê, hevkariya şîrketan li vî sînorî nasekine. Weke mînak, li Leo Zussino Building'ê (4) navendeke konferansan û buroya berpirsê kampusê heye… Li Rio Tinto'yê jî, People & Organization Support Capability Development heye. Li avahiya wan herweha Navenda komira safî (Gladstone Centre for Clean Coal) heye. Li salona ketina wê, modeleke piçûk ya bi dengine balkêş, bi sê beşan, ji dewra antîk heta dema me behsa dîroka komirê dike. Li wira, em hîn dibin ku lengergeheke wan ya ku gellekî dişibe ya Gladstone'ê heye û ji mêvanan re tê gotin ku bikaranîna komirê ya bi peydakirina elektirîkê *"roj bi roj bikarhatîtir dibe û gemarkirina wê jî kêmtir xeternak e."*

Şaredarê Gladstone'ê yê konservator, Birêz George Creed, bi awayekî zelal nîşan da ku ew li dijî projeya hikumeta federal ya bicihkirina bazara komirê ye ku ev proje Emission Traiding Scheme (ETS) e û dê heta 2010'an bê bicihkirin. Li gora wê, ev proje dê paşeroja bajêr bixe xetereyê û di demeke xerab de hatiye pêşniyarkirin: "Dê ziyana wê li tiştekî û kesekî neyê ku mirov salek an du salan bisekine, lê belê heger bixwazin tavilê wê bi cih bikin, dikare gellek tahdeya wê li me bibe"(5). Li meclîsa şaredariyê, fikrên cuda hene. Li gora Birêz Dendle, "*bazar mekanîzmayeke çavdêrîyê ya weha ye ku hêza xwe îspat kiriye*." Dîsa jî, *"gelo ew ê karibe derfeta çareseriya wan pirsgirêkên ku ji mirovan nayên jî peyda bike? Û gelo Awûstralya dê bikare bandorê lê bike? Ji bo min, nîqaş divê li ser van pirsan be."* Brush'a endama meclîsa şaredariyê piştgiriya bazara komirê dike, lê belê baweriya xwe bi awayê pêkanîna wê nayne. Bername gellek tawîzan dide şîrketên komirê (6). Ji xwe, navkokiyên polîtîkaya wargehê ya hikumeta Rudd ne ev bi tenê ye (7).

Li gora nifûsa xwe, Awûstralya yek ji wan welatan e ku mezintirîn gemarkirên cîhanê ne (8). Lê dîsa jî hikumet dixwaze bere bere îxracata komirê zêde bike. Sala 2008'an, Birêz Peter Garrett'ê wezîrê federal yê wargehê li biryara mezintirkirina şiyana lengergeha Gladstone'ê bi xwedî derket: *"Endustriyeke me ya komirê ya gellekî giring heye, him di warê aborî de û him jî bi taybetî di warê sazkirina karan de."* Bê guman, di ber re got ku hesabê bandora vî karî ya li ser wargehê jî hatiye kirin û da zanîn ku hikumet gellekî li ser bernameya komira safî disekine û bala xwe dide teknolojiyên peydakirin û perçekirina komirê (9). Lê belê, ev teknolojî dê nikaribin heta 2015-2020'an jî bên bicihkirin û ew ê qet nikaribin bibin berdêla karbona ku Awûstralya dê di vê navberê de bera ezmanan dabe.

Ji ber ku bi derseda veguheztina şûşeyên bîrayê û ya bicihkirina panoyên tavî dilxweş in, Awûstralî niha li dijî vê rewşê dernakevin… heta hişkesaliya pêş. Birêz Beers, ji AWU'yê, weha dibêje: *"Ez sala 1967-1968'an hatim Galdstone'ê, gava ku rafîneriya alîmunyûmê hê nû li ser cihê mez- bexaneyên kevin hatibû avaki-rin. Zanîngeh ji aliyê lengergehê ve hate avakirin. Komir nebûya, me ê nikarîbûya ev hemû pêk bianiyana... Ma niha kî dê rabe û gazindên xwe jê bike?"*

Hejmara losemiyan bi awayekî anormal zêde ye

Thompson diyar dike ku, rast e, toza komirê "çavkaniya gemareke berbiçav e: mirov nikare wan bênderên ku li wî alîyê çemî ne di ser guhê xwe re biavêje. Lê gellek tozên sipî jî hene ku li hewayê ne, lê xelk wan nabînin..." Ew balê dikişîne ser ku "heger îroj bi xwe rafîneriya QAL'ê bihataya avakirin, ew ê li perê avê nehataya avakirin; ew ê li nava çolê bihataya avakirin." Xanim Lilian de Torres'a lêkolînera PELM ku li ser "endamên organîk" yên gemara rafîneriyên Gladstone'ê yên alîmunyûmê dixebite, zêdetir ji heyştê maddeyan tê de dîtiye, weke aseton û tolûwanê; lê nuha, heta dawiya cerribandinên xwe ku dê di 2010'an de bigihîjin encamekê, naxwaze li ser xerabiya wê bipeyive.

Adara 2009'an, Clean Air Society'a ku dezgeheke serbixwe ye civîneke agahdariyê li ser kalîteya hewaya Gladstone'ê li dar xist. Di eslê xwe de, Ajansa Parastina Wargehî ya Queensland'ê (Environment Protection Agency, an jî EPA) mesrefên vê civînê dane. Lê belê, li gora professor Dolay'ê ji Zanîngeha Queensland'ê û endamê Clean Air Society, EPA'yê *"nexwast tev lê bibe"*, û daxwaz kiriye ku *"encam zêde belav nebin."* çima? Ji ber ku herçend xelkê Gladstone'ê "*digel ku ji deverên din bêtir agahdariyan werdigirin*" jî, divê li hember bandora xerabkir ya agahiyeke li ser vê "civata rîskê" ku ew jî endamên wê yên baş in, bêne parastin.

Di navbera 1996'an û 2004'an de, heyştê û du nimûneyên losemiya lîmfoyîd ya kronîk pêk hatine, digel ji bo bajarekî ne pirr mezin yê Queensland'ê ev hejmar diviya çardeh bûya (10). EPA'yê biryar daye ku encamên lêkolîna di 2010'an de eşkere bike. Gava ku mirov ji prosefor Doley'î dipirse ka gelo gemarên rafîneriyên alîmunyûmê dikarin tendurustiya xelkê xerab bikin an ne, ew balê dikişîne ser ku "xemên" li ser vê yekê li Wagerup'ê, li Eyaleta Awûstralya-Rojava, li ser "navxweyên organik" yên çalakiya rafîneriyan hatine gotin. Dîsa jî, ew dide zanîn û dibêje ku peydakirina sedemên kanserê dijwar e.

Li gora Birêz Beers'ê sen-dîkalîstê AWU'yê, *"rast e ku li Gladstone'ê bermayiyên xeternak û pirsgirekên gemara hewayê hene."* Lê ew lê zêde dike û dibêje ku *"şîrket ji bo ku van kêmaniyan sererast bikin gellekî li ber xwe didin, û êrîşkirina endustriyekê bi tenê li gora min xeletiyek e... Temam, hin komên zextker yên kêmhejmar nîqaşan derdixin. Lê ez ji we re bêjim: heger hûn biçin Brisbane'ê û hûn li ser kolaneke sereke bisekin, gelo hûn ê çi bikişînin kezeba xwe?"*

Rojnameger John Pilger'î berî niha bi çend salan weha dinivîsand: *"Tav vernîka Awûstralyayê ye"* (11) Ev peyv diviya li salona meclîsa şaredariya Gladstone'ê li cihekî baş bihataya nivîsandin. Li vî bajarê ku dirûvê kartpostalan dide, qeyrana aborî dê peymana di navbera endustrî û sendîkayên ku tim dixwazin zêdetir kar bikin de xerab neke. Ji bo ku balafirên cîhanê bikarin bifirrin, tim jortir û dûrtir biçin, li kendavê mîrekiyên petrolê hene, li Gladstone'ê jî belkî kanser he-be. Heta kengî?

Werger ji fransî
İbrahim Seydo Aydoğan

GLADSTONE
Mezinahî: Herêma Gladstone'ê 143.7 km² ye, bajarê Gladstone'ê 67.1 km² ye.
Nifûs: sala 2008'an li herêmê 57587 kes dijiya, li gora hejmartinên sala 2006'an li bajêr 32400 kes dijîn.
Derseda bêkariyê: Li Queensland'ê, di tebaxa 2009'an de % 5.7 bû; li Gladstone'ê, sala 2006'an (hejmarên dawîn yên ku tên zanîn) % 5.4 bû.

AWÛSTRALYA BI HEJMARAN
Mezinahî: 7 686 850 km²
Paytext: Canberra
Nifûs: 21 902 828
Nifûsa çalak: 10 773 600; % 49'ê nifûsê (di nêviyê sala 2009'an de)
Derseda bêkariyê: % 4.5 di nêviyê sala 2008'an de, % 5.8 di nêviya sala 2009'an de Hesabê % 10 ji bo sala 2010'an tê kirin, li gora Dezgeha Hevkarî û pêşketina aborî (OCDE).
Berhemên navxweyî brut (PIB): 416.2 milyar dolar (287.5 milyar euro) sala 2000'î; 766.8 milyar dolar (529.8 milyar euro) sala 2008'an.
Derseda mezinbûnê: + % 2 sala 2007'an; + % 1.5 sala 2008'an; + % 0.6 nêviyê sala 2009'an
Para warên çalakiyê di PIB'ê de:
Cotkarî: % 3.8 (2005); % 3 (2007)
Endustrî: % 26.3 (2005); % 26.4 (2007)
Xizmet: % 69.9 (2005); % 70.6 (2007)
Meaşê mehane yê orte ji bo karmend û karkeran:
3117 dolar (2150 euro) ji bo zilaman, sala 2007'an
2192 dolar (1512 euro) ji bo jinan, sala 2007'an.

(1) Adara 2009'an, hikûmetê rê li ber girt ku China Minmetals şîrketa Oz Minerals bikirre. Chinalco hewil dide ku li Vietnamê bi cih bibe ku ew dever li cîhanê sêyemîn rezerva giring ya boksîtê ye. Bixwîne: Jean-Calude Pomonti, "Le Vietnam, la Chine et la bauxite", Les blogs du "Diplo", 3 Tîrmeh 209.

(2) Şîrketa awûstralî, BG'yê, roja 13'ê Gulana 2009'an peymanek sazûmankariyê eşkere kir ku bi China National Offshore Oil Corporation (CNOOC) re hatiye kirin.

(3) Richard Clegg, birêvebirê PELM, http://pelm.cqu.edu.au

(4) Leo Zussino serokê desthilatdariya lengergehî ya dezgeh-kilîta pêşketina Gladstone'ê ye û serokê Gladstone Economic and Industry Development Board'ê ye.

(5) Matthew Franklin û Lenore Taylor, "Labor heartland turns on ETS", The Australian, Sydney, 17 mars 2009.

(6) Rosslyn Beeby, " Green paper gives coal power free pass", The Canberra Times, 17 Tîrmeh 2008.

(7) Bixwîne: Laurence Mazure, " Mafyayeke bandora zextê Awûstralyayê gemarî dike", Le Monde diplomatique, Gulan 2009.

(8) Anne Davies û Brian Robins, "Greenhouse gases: we are among worst polluter", The Sydney Morning Herald, 15 Çiriya Paşîn 2008.

(9) Petrina Berry û Evan Schwarten, "Garrett defends increased coal exports", The Australian, Sydney, 28 Tîrmeh 2008.

(10) Melanie Petrinec, "Study of chronic disease numbers", The Gladstone Observer, 6 Sibat 2009.

(11) John Pilger, Distant Voices, Vintage, London, 1994.

RÛSYA - VLADÎVOSTOK

Bajarên ku bi taya civakî girtin

JEAN SABATÊ*

Krîzê derbeke xirab li Rûsyayê xist: Paşveçûna hilberîna pîşesazî û berhemên li nava welêt hilberandî; kêmbûna mûçeyan û zêdebûna bêkariyê. Belê krîz bi awayekî gelekî guhertî li gelek kategoriyên bajar û herêman dixe.

Vladîvostok bajarekî 'êşkence' lêkirî ye. Serê pêşî ji ber cihê xwe yê cografî 'êşkence' lêkirî ye. Mirov bajêr weha bîne ber çavên xwe; tevî derdora xwe herêmeke serjimara wê şeşsed hezar e, li keviya nîvgiraveke 30 kîlometroyan dirêj e, û bi tenê du rê diçinê. Riyeke bi fitlonek, ji du xetan û tijî kortal – ev kortal jî ne kortalê piçûk in, dişibin çalan – riya din çar xetên wê hene lê asêmana maşînan di vê riyê de êdî bûye gotina pêşiyan – ji Moskovê jî xirabtir e, ev jî têra xwe rewşê vedibêje.

Hemin, efsaneyek jî heye: ev hemû tên jibîrkirin di çarçoveya vê pêkhatina neqişandî de ya ku ev herêmên benderan ên bi benderan bi awayekî tekûz hatine parçekirin, nîşan didin. "Qiloçê Zêrîn"a vir – ev navê bajêr ê bi rûsî ye – di navbera benderên eskerî, yên bazirganî de dabeş bûye, berê wê li Rojhilatê tengavê dinêre û tûreşkên hûrik yên li derdora wê navên wê yên efsanewî ne: Dîomede, Ulysse, Ajax, Patrocle... Bajar harîqulade ye, lê belê gelekî bi ser mirov de tê. Li bajêr peravên deryayê hemû ji aliyê avahî û dezgehên benderan ve hatine dagirkirin û ketina qadên wan jî qedexe ye. Di encamê de di nava bajêr de bi tenê peraveke 300 metroyan dirêj û çend cihên li gelemperiyê vekirî hene di nava herêmeke pîşêsaziyê ya napolîten de.

Bi ser de jî ji aliyê şaristaniya maşînên ajotinê ve êşkence lê tê kirin. Tê gotin, ji mirovan bêhtir maşîn li bajêr hene û dema mirov lê dimîne mêyl dike ji vê yekê bawer bike. Kaoseke bi vî rengî kêm caran hatiye dîtin û ji ber ku ji sedî 99.9'ê maşînan, dîreksiyonê wan li aliyê rastê ye, zêde girîng nayê dîtin ku maşîn li aliyê rastê diçin. Weke bajarên Rûsyayê hemûyan, kesên ku bajar hunandin (urbanîstan) pêş nedîtin ku wê girse bi giştî bibin 'xwedî maşîn' û wan bi rastî jî hewl neda ku xwe li gorî vê sererast bikin. Ji ber çavtênebûn û hesûdiya mirovan jî êşkence li bajêr dibe. Li Rûsyayê, bajar û herêma deryavaniyê (bi rûsî *Primorskii Krai*) weke deverên herî zêde mafya û karên nelirê lê heyî navdar in. Li cihê cih mirov çavdêriyê dike ku rayedarên payebilind ên bajêr van salên dawiyê bêhtir bi parvekirina her tiştа ku dikare bibe berjewendiyê milkekî spekulatîf, mijûl bûn û ne bi çêkirina peyarê, lûleyên avê yan jî kanalîsazyonê û hwd.

Encam mirovan matmayî dihêlin: dilê mirovan bi rewşa avahiyan, binesazî, ting û sergo dişewite – dema ku mirov nû çav pê dikeve, mirov bi zehmetî tîne ber çavên xwe ku mumkin e li ser riyên hesinî û girêdanên li ser van riyan, yên evqasî xwaromaro, mirov tramwayan biajo. Taxeke sihê ya ji sedsala 19. û destpêka sedsala 20. ya li navenda bajêr, hêjabû were restorekirin. Divê mirov pirtûka piçûk a ku têde Joseph Kessel behs dike çawa sala 1919'an weke sûbayê pîlot yê bê-balefir di Vladîvostokê re derbas dibe: dîmenekî ji jor ve mirovan heyranî xwe dihêle, di dinayayekê de ku ji hev dikeve (1)... Ji taxa kevin a Çîniyan ku di pirtûkên destpêka sedsala bihurî de em rastî wêneyên wê yên gelekî xweşik tên, ji komek xaniyên ji tuxleyan yên yek yan jî du qatî pêve tiştek nemaye îro. Ew jî îro ketina şûna gunehkaran, lewra hin kes dixwazin taxê hilweşînin (cihê wê gelekî baş e, li navenda bajêr e).

Bahram Hajou, (Wahre Liebe! War es Liebe!)

Daxwazên milk û siyaseta koçberiyê li rasta hev tên. Ji dema ku Kessel behsê dike û vir ve, di 1938'an de Çînî kirin der (piştî şerê gola Xanka) û Koreyî di 1939'an de hatin tehcîrkirin (beriya "şerê mezin ê niştimanperweriyê"); bi saya nîqaşên li ser tehlûkeya nijada zer (Çînî, Koreyî û hwd) yên ku çapemeniyê bi awayekî fereh cih didayê û rayedarên herêmî jî ji bo hilbijartinan ji xwe re weke delîl bi kar dianîn, îro di 2009'an de hejmara asyewiyan li bajêr ji destpêka sedsala 20. kêmtir e, Herweha ji hejmara asyewiyên îro li Moskovê jî kêmtir e. Divê mirov bêje ku bajarê heta 1992'an li biyaniyan qedexe, baş hatibû parastin. Hin kes xwe jê venadin û bi nostaljiyê behsa van demên pîroz dikin yên ku têde bajar girtî, paqij û têr kulîlk bû... Ew ji bîr dikin destnîşan bikin ku wê demê bajarên bi vî rengî ji pîvanên taybet ên tedarîkkirina pêdiviyan sûd werdigirtin ku ev dever dikirin deverên têra xwe xwedî îmtiyaz.

Bi hewes û daxwazên siyasî jî êşkence li bajêr tê kirin. Di 2012'an de, Vladîvostok wê mêvandariya civîna bilind a Hevkariya aborî a Asya-Pasîfîkê (APEC) bike. Ev bûyereke girîng e, lewra Rûsyaya serdema Sovyetan demeke dirêj nedihewandin nav vê forûmê. Kremlîn dixwaze vê civînê veguherîne gaveke mezin a stratejiya xwe ya nû ya Asyayê. Waliyê niha Sergey Darkîn dixwaze vê mijarê ji bo ku pêngavekê bavêje bi kar bîne û pêşniyara avahîsaziyeke gelekî mezin a binesaziyê kir, li gorî rêveberên herêmî, ji bo ku bajarê xwe bikin Vancouver (2) a herêmî ev proje

* Lêkolîner, nivîskarê pirtûka bi navê *La nouvelle Russie (Rûsyaya nû)*, Armand Colin, 2007

tên pêşniyarkirin.

Encam: salên projeyên xapînok ku yek ji ya din buhatir. Hotelên şeş stêrkî, lidarxistina kongreyên luks û beriya her tiştî tunelek û du pirên nehitî: yek li ser nîvgiravê ya din jî girava mezin Rûskî, ya ku li başûrtir e, li aliyê din ê Tengavê, bi parzemînê ve dike. Pirgirêk ew e ku ev girav hema bêjin ne şên e: çend avahiyên eskerî yên ku gihane xirakirinê, çend xaniyên darî yên Rûsî (Daça) û peravên tên hezkirin ên herêmê, lewra li ser derya japon in; cihê ku jê herikên okyanûsê benderê qirêj dikin. Dîsa jî ev der erdekî bi tevahî li gorî dilê spekulatoran e...

Çapemeniya rûs xwe bi çar lepan avêtiye ser vê pira ber bi valahiyê (*nîkûda*) ve. Ji bo ku vê pitika têra xwe buha xilas bikin, rêveberên bajêr pêşniyar dikin ku avahiyên ji bo vê projeyê bidin zanîngeha paşerojê ya federal a li herî rojhilatê Rûsyayê. Ev fikir dibe sedem ku zanîngeh fikaran bikin: ji bo ku mirov di ser du piran re biçe giravê çiqas dem divê? Lewma ji ber vê bernameya ku dike alîkariyên maddî yên dewletê biherikin bajêr, ji bo vekirina riyên ji ber çûnûhatina zêde asê û ji bo çareserkirina pirsgirêkên welatiyan, ti tişt li bajêr nehatiye kirin. Û êdî xwendekar û dersdarên li navend û bakurê bajarê mezin dimînin, ma kî wê ji wan bixwaze ku biçin li kampûsa li ser giravê, ya dûrî her tiştî, dersan bixwînin yan jî bidin?

Ji niha ve em pêşdîtinên reşbînan dibihîzin: xwendekar wê zanîngeha xwe biguherin û xwe li zanîngehên li nava bajêr dimînin (hemin, ev hevrik in) qeyd bikin – yên ku ji niha ve simbêlên xwe şor dikin. Divê haya serokê Rûsyayê Dimîtrî Medvedev ji pirsgirêkê hebe. Di hevpeyvîneke beriya demeke kurt de ew ji bo Vladîvostokê weha peyivî: “Ev bajarekî gelekî xweş î tekûz e, gelekî xweşik e, lê hat qetilkirin; lê kanalîzasyoneke normal jî nîne; her tişt kevin e û li ber rûxînê ye...” Li gorî wî dîsa jî civîna bilind ji bo bajêr şensek e, ji bo destpêkirina karên cidî ‘*bahaneyeke*’ baş e (3). Pirsa rastî ev e, gelo ev ji bo bajêr şensek e yan ji bo rêveberên wê?

Hinan behsa guhertina walî jî kir, lê Vladîmîr Pûtîn di Îlona bihurî de hate bajêr û destek da walî. Waliyê beriya niha Borîs Yeltsîn, kesayetiya sembol a salan, ku weke serekê mezin ê li ber çavê raya giştî yê mafyaya masîgiriyê dihat terîfkirin, ji aliyê Vladîmîr Pûtîn ve ji wezîfeyê hatibû girtin, ji bo ku di cih de ji aliyê wî ve weke wezîrê ... ‘masîgiriyê’ were destnîşankirin. Em behsa waliyê niha bikin; li gorî şertên ku Medvedev ferzkirin, divê rêveberên herêmî hemû, hatinên maddî yên xwe û hevjînên xwe biweşînên. Rojnameya moskovayî *Novaiya Gazeta* kite bi kite her tişta ku waliyê niha hewl da di bin nav û hesabên bankeyan ên cur bi cur ên li derveyî welêt de veşêre (4), weşand. Şerê siyasî gelek caran li “*kompromatan*”, ango gotegot û gunehbariyên ne mumkin e werin piştrastkirin, dişkin.

Di heman demê de hikûmetê beriya demeke kurt gelek tedbîrên parastinê qebûl kirin da ku bi hewara gelek sektorên aboriya Rûsyayê yên di krîzê de biçe. Lê bandora van tedbîran ji bo vê herêma bi awayekî giştî berê xwe dayî îxracatê, berepaş bû û li dijî hilberînê bû. Tedbîrên li dijî firotina derve ya hesinê kevn û qurmên daran, kontrola şidandî ya li ser ketina masiyan a benderê: van hemûyan aktîvîteyeke aborî ya ku ji ber dûrbûna ji navendên sereke yên welêt jixwe êdî nazikbûyî lawaztir kir û di nava xelkê de fikra ku ‘Moskov serê xwe ji aliyê herî rojhilat ê Rûsyayê naêşîne’ bihêztir bibe. Bi ser de jî, xelkê bajêr, weke ku li vir tê gotin, “bi piyên xwe” ango bêyî ku bifikirin tevdigerin: koçberiya ber bi herêmên din yên welêt ve gihişte asta rekorê û serjimara bajarê Vladîvostokê bi xwe jî timî kêm dibe.

Di nava vê çarçoveya ji niha ve aloz de di Kanûna 2008’an de hikûmetê biryara zêdekirina bacên li ser ‘ji derve kirîna’ maşînên hatî bikaranîn (destê diduyan) da, 11ê Çile jî ev biryar kete meriyetê. Vê dilopê kir ku sewîl bi ser ve biçe, û bû sedema xwepêşandanên protestoyî yên ku di rabihuriya nêzîk de nehatibûn dîtin. Komeleyeke nefermî ya bi navê TIGR (“Koma hevalan a welatiyên çalak ên Rûsyayê”) û partiya komûnîst a Rûsyayê serkêşiya vê tevgerê kir, belê ev tevger ji wan bi gelekî bihurî. Di 14ê Kanûnê de bêhtirî deh hezar xwepêşandarî navenda bajêr bi tevahî dagir kir û hinên din jî bi awayekî neserketî hewl da ku balefirgehê dagir bikin. Ji sînorên wan derbas kir, ji destê milîs û OMON’ê – polêsên taybet ên komara Rûsyayê – ti tişt nehat, bi tenê karîbûn girîngiya xwepêşandanê û hejmara endamên meclîsa herêmî yên tevlî vê tevgerê bûyîn kêm bikin. 15 û 17’ê Kanûnê, nîşanên grîngiya rewşa aloz xwe dan der; meclîsa herêmî û Dûmaya (meclîsa giştî ya) bajêr bi awayekî fermî ji serokdewlet Medvedev û serokwezîr Vladîmîr Pûtîn xwestin ku vê biryara xwe ji nû ve di ber çavan re derbas bikin (5).

Berferehiya vê tevgera nerazîbûnê, mirov dikare bi grîngiya kirrînên herêmê yên ji derve ve ji bo aboriyê, rave bike. Li gorî maşînên li welêt hatîn hilberîn yên ku bi kalîteya xwe ya nivî navdar in, ajovanên maşînan li Rûsyayê bi gelekî zêde maşînên ji derve hatî kirrîn tercîh dikin. Elîtên, bi xwe jî ji BMW, Mercedes yan jî Porsche Cayenne pêve naajon, jî qet berê xwe nadin maşînên xwe yên netewî. Li herêma li herî rojhilatê Rûsyayê, li tevahiya Sibîryaya Rojhilat yek kargeha bi tenê ya hilberîna maşînan nîne. Li vande- veran pirsgirêk du caran zehmettir dibe, lewra divê maşîn ji aliyê ewrûpî yê Rûsyayê werin anîn. Ev yek jî buhayê maşînan zêde dike. Lewma jî, ji sedî 90’ê maşînên li vir tên bikaranîn yên japonî yan jî koreyî ne (ango dîreksiypnê wan li aliyê rastê ye), û para bêhtir jî maşînên berê hatine bikaranîn in. Ji bo tedarîkkirina maşînan ji tevahiya aliyê Asya yê Rûsyayê re sektoreke rastî ya aborî pêk hatiye.

Ji deryavan, karkerên benderan û bazirganan yên ku ji Asyayê malên xwe dikirin û wê de, û ji vê bazara mezin a salê bi deh hezaran maşînî û wê de, ev pîşesaziyeke rastî ye. Hin jê ji bo ku xwe ji rêzikên her diçe bêhtir zorê li wan dikin, xilas bikin, kaportaya jeepên japonî ji hev dixin û parçe dikin ji bo ku ‘weke parçe’ wan ji derve bikirin û li Rûsyayê bi hev ve bikin, dema vê dikin jî her şêwaz lihevanînê jî pêşkêşî kesê ku wê di dawiyê de maşînê bikarbîne, dikin. Li herêma “deryavaniyê” behsa nêzî sed hezar karî tê kirin. Taybetmendiya vê sektorê jî ew e ku pirraniya wan ji fîrmeyên piçûk û mazinahiya navî yên serbixwe pêk tê. Ji ber ku ji rayedarên federal û herêmî nayê kontrol bikin, hewldana ji bo ku vê sektora têra xwe otonom bînin ser rê, bi ser nakeve. Jixwe ev kes jî hîç xerîbê vî şerî nînin.

Moskovê zû bersiv da vê lehiya civakî. Li gorî adetê erza rayedarên herêmî hat şikandin. Rêveberên herêmî diviya vegerin ser reaksiyona xwe ya pêşî û dest pê kirin rave bikin ka çiqasî biryara hikûmetê aqilane ye û bi vî awayî nerazîbûna welatiyên xwe du caran li berê zêde kirin. Duyemîn xwepêşandana TIGR’yê ji bo 21’ê Kanûnê hatibû plankirin, vê carê OMON’ê bi şîddetê xwepêşandêr ji hev belav kirin. Kanalên televizyonê yên netewî xwe li vê serhildanka herêmî kerr kir û xwe bi pesindayîna çend tawîzên Kremlînê pêşniyar kirî razî kirin: Alîkariyeke ji bo veguhestina maşînan – yên ji cihê li Rûsyayê lê tên hilberîn ber bi herêmên herî li rojhilat - da ku buha bibin weke hev û ji bo xwendekar û teqewîtan erzankirina buhayê bilêta balefiran ji bo çûna aliyê ewrûpî yê welêt. Vê yekê pêşî li xwepêşandanin din negirt. Destpêka Çile dema ku biryara behskirî kete meriyetê dîsa xwepêşandan hebûn, lê belê sermayê û OMON’ê alîkariya berpirsiyaran kir da ku pêşiyê li belavbûna avêtina keviran bigirin.

Dîsa jî li cihê cih ti tiştî çareserbûyî nîne. Gelek pisporên rûs, tedbîrên parastinê yên hikûmetê ji bo ji îflasê xilaskirina hilberînerên maşînan yên rûs girtî, rexne dikin: tevî alîkariyên madî yên gelekî mezin jî, van tedbîran heta niha ti encam nedaye. Ji ti kesî nehat, xeleka barê wê giran a bertîlxwurî, xemsarî û aboriya tê birêvebirin, bişkîne. Ev jî rave dike çima ev fîrme, tevî ku yên berhemên wê bi kar bînin naxwazin jî, wê hilberîna maşînan dewam bikin.

Di rojên destpêkê yên Gulanê de rojên xweş di dawiyê de dîsa hatin. Lê belê di navbera xwepêşandanên 1’ê Gulanê û pîrozkirina serketina 9’ê Gulanê de yên ku tên kontrolkirin, ti xêr di rewş û hewayê de nebû. Êdî karê benderê kêm bû: kêmbûna kar gelekî xwe li ser baca li ser bazirganî û veguhestina bi keştiyan, da hiskirin. Niha her kesî serê xwe tewandiye û li bendê ne krîza aborî bi dawî bibe û bi rezervên xwe niha debara xwe dikin. Hin hene ku hêvî dikin piştî vê dema zehmet hikûmet vê biryara xwe betal bike yan jî nerm bike û bi vî awayî bazar û kar dîsa baş bibe. Lê pirraniya mirovan reşbîn in û ji niha ve ya herî xirab pêş dibînin: Ev dem wê aboriyeke nazikbûyî, lawaztir bike ku organîzekirina civîna bilind a APEC’ê jî nikaribe wê xilas bike. Li gorî wan em ê pêleke nû ya çûna rûsên ji herêmê ber bi aliyê ewrûpî ve bibînin û yên ku wê pêşî biçin jî yên herî ciwan û dînamîk in.

Di heman demê de krîzê çiveke siyasîtir da xwe. Ji Çileyê 2009’an û vir ve, komîsyoneke Dûmaya (Meclîsa) federal raporek nivîsî û di vê raporê de amadekar û organîzatorên xwepêşandanan bi sîxurtiya hêzên biyanî hatin gunehbarkirin: “*Mirov dikare xwepêşandanên girseyî li dijî zêdebûna mişa bacgehê weke çalakiyeke organîzekirî ya bêîstîqrarkirina rewşa civakî li gelek herêmên Rûsyayê binirxîne* (...), *ev çalakiyên ku li gorî yek senaryoyê tên birêvebirin, xwepêşandanên şoreşa porteqalî tînin bîra mirovan.*” Û digihêje wê encamê ku ev çalakî ji aliyê “*teknologên biyanî*” ve hatine manîpule kirin, û “*armanca wan a sereke ew e ku hewl bidin herêma herî li rojhilat a Rûsyayê jê veqetînin* (6).”

Tevî ku rast e ku hin alên porteqalî ji aliyê hin xwepêşandaran ve hatin hejandin jî, bi berferehî hat nîşandan ku ev gefxwarina qaşo ya veqetînê ya rûsên herêma herî li rojhilat, bi tenê reşeyeke ji aliyê beşeke elîta herêmî ve dihat hejandin bû, ji bo welatiyan li aliyê xwe mobîlîze bikin û ji bo bikin ku waliyê berê bireve. Lê belê li Moskovê bêguman nayê tercîh kirin ku bi rastî rewşa fikrê herêmî weke ku ji aliyê raporeke Vîktor Larîn ve hatî eşkerekirin, were gotûbêjkirin. Larîn rêveberê Înstîtûya Dîroka Vladîvostokê ye. Encama bersiva xelkê herêmê di dema anketekê bi awayekî têra xwe zelal de dayî pirsa “*tehlûkeyen sereke yên li dijî berjewendiyên Rûsya û herêmên wê yên herî li rojhilat çi ne*” ev e: ji bo ji sedî 47’ê wan tehlûkeya pêşî “*siyaseta xirab a Moskovê*” ye. Bi tenê ji sedî 37’ê wan behsa “*hêza eskerî ya Çînê*” û ji sedî 36’an behsa “*hegamonîperestiya Amerîkiyan*” kir (7).

Werger ji fransî
Lokman Turgut

(1) Joseph Kessel, Les temps sauvages (demên hov), Gallimard, Folio, Parîs, 1978.

(2) Bajarê benderê yê ku elementên xwezayî cih ji bajarbûnê (urabnîzasyon) re dihêlin. Vancouver van salên dawiyê têra xwe pêş ket. Ew sêyemîn bajarê mezin e ku biqasî Kanadayê girîng e.

(3) Kommersant, Moskov, 5’ê Hezîrana 2009’an.

(4) “Les gouverneurs se sont privés de tout (Walî ji her tiştî cudagirtî ne)”, Novaïa Gazeta, 1’ê Tîrmeha 2009’an.

(5) Interfax û Kasparov.ru, 18’ê Kanûna 2008’an.

(6) “Et c’est parti (Û destpê kir)”, Nezavisimaïa Gazeta, 16’ê Çileyê 2009’an.

(7) Andreï Kalatchinski, “L’Orient rougeoie (Rojhilata soringî)”, Ogoniek, 18’ê Gulana 2009’an.

ROJHILATA DÛR

Ji ber çi Japonya tûş bû?

ODEIRA NAMIHEI*

Watedar e ku serokwezîrê nû Hatoyama Yukio (Partiya Demokrat a Japonyayê) piştî serketina xwe ya dîrokî ya 30'ê Tebaxê, Birêz Kamei Shizuka wek Wezîrê Dewletê yê Karûbarên Darayî û Postayê wezîfedar kir. Wezîfedarkirina Birêz Kamei Shizuka wek wezîrê dewletê yê karûbarê darayî û postevaniyê ji aliyê serokwezîrê nû Hatoyama Yukio ve (Partiya Demokrat a Japonyayê), watedar e. Ew bi xwe, yek ji dijberên herî qewîn ê şexsîkirina postê, sembola reformên desthilatiya kevn a lîberal, e. Lê belê Brêz Hatoyama, li dijî Dewletên Yekgirtî yên Amerîka diviya ji bo pêşxistina bazara hundurîn û peyitandina serbixwetiya Japonyayê hîna pêştir biçûya.

"Em netirsin û ji dahatûyê bawer bin." Serokwezîrê nû yê Japonyayê Birêz Hatoyama Yukio ev gotin, ne dema axaftina xwe ya 9'ê Îlona 2009'an a derbarê berendamyiyê de, ne jî roja piştî serkeftina dîrokî ya partiya xwe, (Partiya Demokratîk a Japonyayê / PDJ), lê belê dema hilbijartina 30'ê Tebaxê li ser hegemonyaya PLD'ê kirin. Wî ev gotinan, bi mebesta cihçêkirina xwe ya di qada polîtîk a japonî de, sala 1988'an, ji stranekê girtibûn.

Wê demê, PLD hêj li welêt serdest bû. Welatê giravan di nava dewlemendiyê de bû. Şirîkatiyên japonî ji bo kirrîna "Le Mondê (1)" xwe amade dikirin û tevahiya welêt wek serbilindiyêkê didît ku rojavayî dixwazin "modela japonî" ji nû ve biafirînin. Bi tevayî, gel dida ser a ku dewletê kifş kiribû: wan derfet dabûn aboriyê ku hilkişe pêlika dudan a cîhanî, û dewlemendiya afirandî, bi hawekî heqane ji aliyên dezgehên ku roleke serastker a civakî dilîstin ve, dîsa dihate belavkirin. Lê teqîna nepoxa spekulasyonê ya destpêka salên 90'î ku tarûmarbûna giran a hawîrdora navnetewî, Japonya avête nava qeyraneke nedîtî. PLD'ê xwest wê derman bike, bê serketin.

* Rojnameger

Çi dema ku "bêkartî", "bêstarî" û "xizanî" bûn gotinên dewamî di rûpelên rojnameyên welatê giravan de, rêveberiya lîberal a demokrat, destê xwe avête kerta cîhanîkirinê. Di bin zextên Dewletên Yekgirtî de, wê lez da guhertina pergala aboriyê bêyî ku tevdîrên civakî li gorî vê tevgêrê bêne stendin. Qedera ku li pêşiya bi hezaran xebatkarên demdemî yên ji aliyê kargehan ve hatibûn derxistin, gel bi tevayî matmayî hist. Dema ku Kanûna 2008'an, japoniyan dît ku bi sedan ji van kesan li parkeke Tokyo'yê bi rojan kamp vedane, baweriya xwe bi pêdiviya guhertin û di berçavderbaskirina civakê anîn (2). Berpirsiyarên Partiya Demokrat bi vê pêdiviyê serwext bûn. Bi bernameyeke xweş a li ser parvekirina dewlemendiya welêt ji nû ve, wan, soza alîkariya malbatan, piştgiriya çandiniyê, di ser de jî ya belaşkirina perwerdeya dibistana amadeyî, dan. Demokratên lîberal, wan ji aliyê xwe de, bi mebesta ku polîtîkaya wan feyde kiriye, daxwaza pêdiviya berdewamiya reforman kirin. Banga eşkerekirina mezinbûna pêşketinê ya berhemên hundurîn, di nîvê Tebaxê de, ku li gorî rîtma salane, her sêmehkên (trimestre) dudan % 3.7 – li gora biçûkbûna daketina mezin a dema sêmehkên çaran 2008 (% -13,1) û sêmehkên yekê 2009 (% -11,7)- dîsa jî têr nekir ku raya giştî ji ser a xwe dakeve.

Ber bi dawîbûna burokrasiyeke ezûez

Eşkerekirina hejmara betalan a Tîrmeha 2009'an, hema beriya hilbijartinê, ji bo destguhertina rêveberiyê, fikra di dilên hilbijêran de xurttir kir. Bi % 5,7'an, ji sala 1953'an vir de, seviya betaliyê tu carî hew qasî bilind nebûye. Bi taybetî xortên 15 heta 20 salî, % 9,9'ê wan bi awayekî fermî, dikevin ber vê betaliyê. Wek ku yek ji berdevkê wan ciwanên bêewlekarî Xanim Amamiya Karin dibêje, "ew hesta redkirinê li dijî PLD'ê gihîşt asta ku dawiyê lê bînin (3)."

Bi dengdana girseyî ji bo Partiya Demokrat, japoniyan daxwaza xwe ye parvekirinê û ya edaleta civakî anîn zimên. Wan dengên xwe dan gelek berendamên ciwan û yên ji aliyê PDJ'ê ve hatine nîşandan ku bi rastiya xwe, di qada polîtîkayê de qet ne dihatin naskirin; bi vî awayî xwestin xwîna nuh bidin vê çîna polîtîk a kal ku qet li pêdiviya guhertuna civakê hayil nabe (ji 18 endamên rêveberiya Hatoyama, serokwezîr jî tevê, 14 jê, ev cara pêşîn e ku wezîrtiyê dikin). Ew hêvî dikin ku ev guhertin, 1955'an û vir de, rûmeta pêşî ya vî navî, bihêle ku vê rewşa welêt serûbin bike û derbasî polîtîkayeke jixweewle ku jidaxwaza dilê hemwelatiyan e.

Di bernameye xwe ya hilbijartinê de, demokratan giraniya xwe dan ser hevberdana ku roj bi roj di nava gel de zêde dibe û ser rêveberiya ku zîrekbûna xwe ya berê wenda kiriye. Sazkirirna kargeheke stratêjiya netewî (KSN) ku rasterast girêdayî serokwezîr û Şêwirmendiya reformên reveberiyê bi mebesta ku baweriya gel ji nû ve li hember karmendan saz bibe ava kir.. Wê bi mebesta avakirina butçê û pêdiviyên lezgîn ên karmendên wezareta darayî -heta vê gavê pêk dihatin- pêdiviyên hewce, da dest berpirsên polîtîk. Bi dana rêveberiya BSN'ê ji bo Birêz Kan Naoto, ku bi vê fersendê bû cîgirê serokwezîr jî, Birêz Hatoyama peyameke pir girîng şand ji burokratan re. Wezîrê tendurustiyê yê kevn Birêz Kan, sala 1996'an, dema ku li ser wezaretê berbirsiyariya xwe ya derbarê hetika xwîna nexweşî têgeriyayî de, li xwe mikur hat, bi navûdeng ket. Bi eslê xwe "ji gel", ew mirovekî bi bawerî ye, bi vê helwestê, xwe ji metodên heta nuha, qut kir.

Birêz Okada Katsuya Wezarê Karê Derveyî welêt e. Karê wî yê bingehîn ew e ku navika welêt ji Dewletên Yekgirtî yên Amerîka bibire; bi eşkereyî jî têkiliyên xwe yên bi cîranên Asyayî re xurt dike. Mijareke pir nazik e ev, dema mirov dizane ku li Japonyayê bîst û pênc bargehên Amerîka hene (çel hezar leşker) û di ser de, ji şerê cîhanê yê dudan bi vir de, welatê giravan her tim li gorî biryarên ku li pişt Pasîfîkê hatine girtin, tev geriyaye.

Banga Birêz Hatoyama ji bo kêmkirina % 25 a afirnadina gazên ku asîman gemarî dikin ji niha heta 2020'an (li gorî sala 1990'î), ava sar bi ser Amerîkayê de anî, ev yek ewê bibe testa pêşîn. Japonya bi hêvî ye ku hesabê xwe, Berfanbara tê, di hevdîtinên Konfêransa Kopenhagenê de pêk bîne. Bicîhnanîna vê yekê, karê Birêz Ozawa Sakihito ye ku niha Wezîrê Hawîrdorê ye. Ev bijartineke di cih de bû ji ber ku vî bankedarê kevn salên 2004 û 2005'an li Odeya Nûneran, berpirsiyariya Karên Hawîrdorê bi rê ve biribû.

Ji bo dîsa rûyê gel bikene ev yek, ê têrê bike gelo? Ew qas jî na. Di nivîseka ku di rojnameya The New York Timesê de hatiye weşandin, nivîskar Murakami Ryu nebûna dilgermiya li hember encama hilbijatina 30'ê Tebaxê destnîşan dike. Di nivîsa xwe de dibêje, "ew tê gihîştin ku tu rêveberî nikanin hemî pirsgirêkên wan çareser bike. Ev tiş-

tekî baş e û nîşan dide ku Japonya êdî kamil bûye (4). Fikreke ku Xanim amamiya jî parve dike. Jina ciwan eşkere dike ku hatina PDJ'ê ser desthilatdariyê, ji aliyê van kesên ku dizanin dijwariya jiyanê û bêstarî çi ye ve, wek dermanê hemî derdan, nehatiye dîtin.

Li gorî diyardeyên netewî (5), rêjeya malbatên ku debara wan a salane di biniya 3 milyon yenî re ne (22.300 euro) sala 1997'an % 9,7 derbasî % 12,3 bû sala 2006'an. Di heman demê de, a malbateke xwedî-zarok, li dora, 7,6 milyon yen (57.200 euro), daket 6.9 yenî (51.300 euro). Ji bo çareserkirina vê kêmketinê, ji bilî gelekên dinê, soza, desteka malbatan serê zarok, salane 26.000 yen (195 euro) heta qedandina kolêjê, û belaşkirina perwerdeya amadeyiyê.

Her carê, ku para darayî ya rêveberiyê di çavên her kesî de kêm bû, bala hilbijêran pirtir çû ser daxwaza ku demokrata derdixist pêş di barê avakiririna civakeke bi rêkûpêktir. Binavkirina Birêz Fuji Hirohisa li ser karên darayî -berê jî sala 1993'ê û 1994'an wezaret bi rê ve biribû- ji bo "qanihkirina bazarê", ji fikara talûka ku mesrefên netewî bi derê şaş de here, û di ser de jî, ji bo japoniyan ku dildikirin bibînin dahatûya wan di destên kesên xwedîtecrûbe de ye. Ji aliyê xwe de, Birêz Kamei Shizuka, Wezîrê Dewletê yê Darayî û Postavaniyê, ku dema prîvatitiona postê de, di civîneke çapemeniyê de, ji nişkan ve: "Bi mebesta ji nû ve avakirina Japonyayê ku ji aliyê aboriya bazara serbest tarûmar bûye, di bin desthilatdariya min de çi ji destê min bê, ezê texsîr nekim (6).''

Her carê, pêdiviya wî yê hîna bêtir hebe ji bo anîna baweriyê û rakirina gûmanê. Partiya Demokrat eşkere soz da ku ewê zagona li ser karê endustriyê û bi wekalet ku rê li ber kontratên demdemî vedike, betal bike. Sala 2008'an zêdeyî %34,1ê şêniyan, bi meaşekî peymanî, bo demeke kifş, bi wekalet an dahnekî, dixebitîn (7). Bi taybetî Birêz Sekine Shukiro, Sekreterê Giştî yê Sendîkaya Karên bi Wekalet (haken yunion) encamên raporeke lêkonlînê li Kansayê (herêma Osakayê) ku li ser gelek nûnerên Partiya Demokrat çêbûye, eşkere kir ku li gorî wê gelek ji wan li dijî betalkirina wê ye (8).

Ev yek nîşan dide ku ev mijara bi çi rengî nazik, ewê reveberiya nû mejbûrî wêrektiyeke polîtîk a bêhempa bike. Ew hêvî dike ku "bêyî tirsandina kargehan" karibin van tevdîran têxin meriyetê. Ew gefan dixwin ku naziktiya kar û sinorê mehaneya herî kêm bibe mijar, bi asteke nayê ragirtin, ewê malên xwe ji welêt birevînin.

Ji bo bidestxistina derfetên armanca xwe, ji serokwezîr re tiştê dimîne ew e ku bendewarê rastderketina karên qeydkirî yên sêmehkên dudan, sala 2009'an, be. Ev yek girêdayî hilberîna li Çînê (xwe zûka ava kir bi saya belavkirina perên fona gelêrî) û rewşa rastîn a aboriya rojavayî. Dawiya dawîn, Japonya gelekî girêdayî bazarên derve dimîne. Daxwaza hundurîn hîna jî qelsok e. Hew başbûna kar û hatinî ewê kanibin kirrînê zindî bikin û rewşeka baştirîn û herdemî çêbike. Di nava vê sergêjî û li hember bendewariya hemwelatiyên xwe, gengaz e ku serkêşê reveberiyê yê nû mejbûr bimîne ku gotinên strana xwe di bîr de bîne: "Em netirsin û ji dahatûyê bawer bin. Em netirsin, bi dilekî azad û mişt aşîtî.'' Wisa carinan baştir e.

"Geisha" - Acrylic on Cotton - (Iris Christina Glerum) - Efekt LMD kurdî

Serokwezîrê ji malbateke navdar

Li Japonyayê polîtîka, pir caran, dîroka malbatekê ye. Her sê serokwezîrên dawîn Abe Shinzo, Fukuda Yasuo û Aso Taro, kur an jî neviyên wezîran bûn. Hemî ji endamên Partiya Lîberal a Demokrat (PLD) in ku ji sala 1955'an de desthilatdar e. Birêz Hatoyama Yukio, 16'ê Îlonê ji aliyê Dietê ve hilbijartî ser serê rêveberiyê, ne li derveyî vê rewşê ye, heger ne ku ew kur an jî neviyê wezîrekî ye û ku ew Partiya Demokrat a Japonyayê (PDJ) bi rê ve dibe. Lê belê, mîna yên dinê, wî jî di nava refên PJD'ê, partiya ku kalikê wî Hatoyama Ishiro di sazkirina wê de cih girtibû de, dest kesbê xwe kir.

Karên bertîlxwiriyê ku PLD sala 1980'ê gemarî kir û rêçûna wê ya kevnare ku li ser hevalbendiyê avabûyî, 1993'an, sala ku koalîsyoneke dijî PLD'ê ku serokê wê Birêz Hosokawa Morihiro bû, hat ser rêveberiyê, bû sedema terkkirina wî ya PJD'ê. Dema tecruba wî pir kin bû. Têkçûna wî, li polîtikayeka kesayeteke girîng a japonî ji du sed salî bi vir de, tê; Birêz Hatoyama deyndarê bijartina xwe ya 2009'an e. Heger wî parastina hevalbendiyê red kiribe, ji ber ku dewlemendiya wî ya şexsî pir e. Ew ji dewlemendtirîn malbateke Giravan tê û, bi birayê xwe Kunio re, ew jî, kesayeteke polîtîk di nava PJD'ê, şirîkê hinek sermiyanê Bridgestonê, di dinyayê de numara yekem e di warê lastîkan de, a ku ji aliyê dapîrê wî ve hatiye avakirin.

Piştî gelek hewldanên xwe yên bi fikrên cihê li nava PJD'ê destpêka salên 1990'î de, wî havîna sala 1996'an xwe avête nava projeyek gelekî mezintir bi avakirina PDJ'ê. Armanca wî avakirina partiyeke dijber a rastîn û zîrek ku kanibe PLD'a ku bi salan e bi kursiya desthilatdariya welêt ve zeliqiye, bixîne.

Bi saya piştgiriya nêzî 60 parlementerên ji tevgêrên cihê, wî, Partiya Demokrat ya Civakî, afirandina fikreke nû bi ser xist. Lê belê ev hebûn û tecrubeya Birêz Ozawa bû bêgûman a ku derfet da ku Birêz Hatoyama û partiya wî xwe bide ferzkirin. Destê veşirtî yê kevn li pişt PJD'ê, çend adetên wî yên xerab mabûn ji partiya wî ya rastîn. Çend çavdêr rola wî ya di rûxandina desthilatiya Hosokawa de sala 1993'an bi bîr tînin û bi fikar in ku karê wî yê wek sekreterê giştî yê PDJ'ê, tesîrê zêde li rêveberiyê bike. Birêz Hatoyama vêya baş dizane ku "siya vî piştgirî" (kage no don) hewce ye bi mebesta amadekirina PDJ'ê ji bo Sênatoriyala 2010'an, hilbijartineke kifşkirî ku piraniyê di her du Odeyan de bi dest bixe.

Li vir, hêvî dibe ku Birêz Ozawa wateya "malbatê" biparêze.

Werger ji fransî
Cemil Denli

(1) Pierre-antoine Donnet. Le japon achète le Monde, Le Seuil, Paris 1991.
(2) Manière de voir, no 5, Le Japon méconnu, Juin-Juillet 2009
(3) Shukan Kinyobi, Tokyo, 4 Septebre 2009
(4) The New York Timse, 7 September 2009
(5) Shukan Kinyobi, 28 Aout 2009
(6) Agence France-Presse, Tokyo, 16 Septembre 2009
(7) Nihan Keizai Shimbun, Tokyp, 13 Juillet 2009
(8) Hiseiki Rodo Tsushin, Tokyo, 25 Aout 2009.

PAKÎSTAN

Welatê ku dijminê xwe bi deste xwe çêdike

MUHAMMAD İDREES AHMAD*

Dema ku ez nîvê Îlona 2009'an gihîştim Peşawarê, bi êrîşeke neh roketan hisiyam ku ji banliyoya rojavayê bajêr, ji Hayatabadê dihat û berî wan, me dengê vîzîna wan bihîstibû. Armanca van roketan qereqoleke parastina sînoran bû ku erka wê parastina deriyê ketina herêma eşîra Xîberanê bû.

Hikumeta Pakîstanê, bi piştgiriya Amerîka, di sala 2002'an de dest bi şerrekî kir ku pê re operasyonên xwe yên leşkerî li herêma eşîrî ya di bin desthilatdariya federal (Federally Administreted Tribal Areas, FATA) de ye zêdetir kirin. Ev herêma ku li ser sînorê Afganîstanê yê bakurê rojavayê ye bi heft beşan û şeş herêman ve hatiye dabeşkirin û sê milyon nifûsa wê heye (% 2'yê nifûsa Pakîstanê ye). Talîbanên afganî piştî têkçûyina xwe vekişiyabûn wê herêmê – li Bakurê Wazîrîstanê, bi pêşengiya serokê xwe yê antî-sovyetîk Celaluddîn Haqqanî, û li Bajorê jî, bi pêşengiya Hizb-el Îslamî'ya Gulbiddîn Hikmetyar. Artêşa Dewleta Federal ku heta wê gavê xwe ji wan Afganên ku dostê Pakîstanê bûn re kerr dikir – lewre li dijî bandora Hindistanê ya ku li Afganistanê zêde dibû ew Talîbanî hêzeke baş bûn- asoxî ket Wazîristanê û da pey wan ''biyaniyan'' (1).

Ji ber ku eşîrên herêmê nexwast mêvanên xwe teslîm bikin, hikumetê avêt ser wan jî û ev jî bû sedema ku ew li dijî desthilatdariya navendî pişta xwe bidin hev. Hin grûbên milîtan yên cuda cuda jî tev li Talîbana pakîstanî bûn ku hê bi qasî ya afganî xurt nebûbû. Piştî wê, kevnetalîbaniyên ku bi kêrî wan nedihatin jî, an weke xayin hatin îlankirin an jî hatin kuştin.

Herçî desthilatdariya navendî ye, ew jî kete destê kesên mîna Nek Muhammedê karîzmatîk ku temenê wê hê nû bûye 27 sal, lê belê kevneçekdarê şerrê Yekîtiya Sovyetê û Afganistanê ye û bi tundî li dijî hebûna Amerîkiyan ya li vî welatî ye.

Di dema şerrê li dijî Sovyetan de, sîlehên çekdarên afgan di herêma eşîran re derbas dibûn, lê belê vê yekê tu bandor li sazûmaniya wan ya siyasî nedikir. Rustem Şah Mohmendê pisporê siyaseta pakîstanî dide zanîn ku wê demê li wê derê serhildan pêk nehatine, ji ber ku *''siyaseta hikumetê û hêviyên xelkê li gora hev bi rê ve diçûn.''*

Di sala 2002'an de, piştî dengdayineke dijber, li herêma Sînorê Bakurê Rojavayê Konseya yekgirtî ya çalakiyê (Muttahidda Maclîs-e Amal, MMA) hat ser hikum ku ji koalîsyoneke partiyên oldar pêk dihat û li dijî ''şerrê li dijî terorîzmê''(2) bû. Saziyên herêmê hemû têk çûn – bi taybetî buroya ''nûnerê siyasî'' ya ku ji dema Raj'a brîtanîk ya nîvê sedsala 19'an di navbera melîkên eşîran û hikumeta federal de peywendî ava dikirin. Sazûmaniyên eşîran yên adetî û fikra otonomiya herêmkî derb ji wê guherînê xwar û di encama wê de jî êdî ewlekariya herêmê xerabtir bû.

Di 2004'an de, piştî du êrîşên li dijî Muşerref ku bi ser neketin, hikumetê pênc hezar leşker teva helîkopterên şerrî şandin Wazîrîstanê. Lê belê, vê artêşê derbine mezin xwarin û hikumet bêgav ma ku bi Nek Muhammed re peymaneke aştiyê îmze bike. Dîsa jî, roja kuştina vî mîrî ya ji hêla hêzên amerîkî yên hewayî ve, 18'ê Hezîranê, agirbesta di navbera wan de xerab bû û Dewleta Federal berpirsiyariya vê kuştinê girt ser xwe – weke hercar – da ku kes nebêje qey Washingtonê desthilatdariya wê binpê kiriye

Salên piştî vê peymanê, du peymanên din jî hatin girêdan. Lê belê, di tebaxa 2007'an de, hêzên artêşa pakîstanî li Îslamabadê avêtin ser mizgevteke ku ketibû destê hevalbendên Talîbanê: ev êrîş, bû sedema kuştina gellek kesên bêsûc jî û di encama wê de pêleke terrorîzmê dest pê kir ku heta bi bajarên mezin yên din ve jî da ber xwe. Ji ber wê, artêşê jî bergiya operasyonên xwe firehtir kir û gihand herêmên Bajor, Mohmand û Xîberê. Şerrekî dijwar li wan deveran dest pê kir ku kesek bi ser neket, lê belê bi milyonan kes ji cih û warên xwe bûn û herweha nerazîbûna li hember hikumetê jî mezintir bû.

Di sala 2009'an de, hêzên artêşa pakîstanî bi xurtî ketin herêmê û dijberiya ku ji serê du salan ve ye ku li geliyê *Swat*ê hebû, gihişt qada xwe ya bilind; lewre Nîzama Hiqûqa Îslamî (Nîzam-e Adl) têk çûbû. *Nizam-e Adl* peymana aştiyê ya nû bû ku di nava hikumetê û partiya herêmê ya ku desthilatdarî bi dest xistibû de, Tevgera damezrandina şerîata îslamî (Tehrîk Nîfaz-e Şarîat-e Muhammadî, TNSM), hatibû danîn.

Heta sala 1969'an, hersê herêmên Malakandê ku ji Şîtral, Dir û Swatê pê dihat Mîrekiyên serbixwe bûn û hiqûqa wan ya xweser hebû ku ew jî awayekî din yê şerîeta geliyê Swatê bû. Gava ku tev li Pakîstanê bûn, hiqûqa wan jî rabû û hiqûqa neteweyî ket şûna wê, lê belê dozên ku dewam dikirin nehatin guhertin. Di mahkemeyên herêmê de, doz her dihatin taloqkirin û dosye hemû vekirî man. Ji ber vê rewşê, di salên 1970'yî de xelkê dîsa daxwaza vegera sîstema berê kir û Sofî Muhammad jî di sala 1989'an de bi damezirandina tevgera TNSM'ê tev lê bû.

Salên piştî van bûyeran, vê tevgerê du caran çek hilgirtin û ev jî bû sedem ku hikumet du caran tawîzan bide, da ku aramî were herêmê: di 1994'an de, dema hikumeta Benazîr Buttoyê, û di 1999'an de, dema hikumeta Nawaz Şerîfî. Lê belê tiştek jê derneket: TNSM her ku çû xurttir bû. Sofî Muhammad teva deh hezar çekdarên xwe çû Afganîstanê ku li dijî hêzên amerîkî şerr bike. Pirraniya wan çekdaran yan hatin girtin yan jî hatin kuştin û hêza wan êdî baweriya xwe di nava xelkê de wenda kir. Di vegera xwe de jî, Sofî Muhammad hat girtin û ket girtîgeha Dera Îsmaîl Xanê.

Sala 2005'an, Melle Fazlullahê zavayê wî TNSM ji nû ve çalak kir. Xetta wê radîkaltir bû û bi xêra tevlêbûyina milîtanên ku ji ber êrîşên amerîkî yên herêmên eşîrî reviyane jî xwe xurttir kir. Piştî ku di çileya pêşîna 2007'an de, bi pêşengiya Melle Fazlullah navê xwe jî guhert û bû Tevgera Talîbana Pakîstanê (Tehrîk-e Talîban Pakistan, TTP), di nava xizan û feqîran de hêza xwe bêtir belav kir û piştgir ji xwe re çêkirin: axavtinên populîst yê serokê wan Baytullah Mesûd û awayê wî yê bicihkirina heqiyê û rexneyên wî yên li birêvebirên feodal yên kevnar jî bû sedem ku gellek ciwanên nerazî jî tev li refên vê tevgerê bibin. Asif Ezdiyê ku analîstekî polîtîk e dide zanîn ku dewletê hêviya ciwanan şikand û weha dewam dike: *''Îslamîzma milîtan ya Pakîstanê ji ber tevgerên elîta feodal xurt bûye, lewre van kesan pişta xwe da dewletê û jê xwar û hêza xwe firehtir kir û bi vî awayî xelkên wekî din ber bi xizanî û bêhêvîtiyekê weha ve dehf dan ku her ku çû rewşa wan xerabtir bû.''*

Ciwanên ku di nava bêkariyê de vedigevizîn bi hejmareke bilind tev li refên Talîbanê bûn, ji ber ku li wira wan ê bikariya çek bi dest bixistana û perwerdehiyeke leşkerî bidîtaya, wekî din, medyaya taybetî ku gellekî xurt bû bandoreke polîtîk jî li wan dikir – û herweha şerrê ku Talîbanê li dar dixist di nava xelkê de weke şerrê li dijî birêvebirên feodal dihat naskirin. Asif Ezdî dide xuyanî ku ''Li hin herêman gundiyên bê erd, li dijî dewlemendên xwedan erd serî hildaye'' û dibêje: *''Li welatekî weha pêk hatiye ku di destê xelkê xizan de tu derfeta çareseriya astengên civakî tuneye û hikumet û sîstema polîtîk û birêvebirên civakî li hember wan pişta xwe daye hevdu. Talîban jî ji ber tevlihevbûna vê kîna şoreşger û oldar di nava xelkê de xurt bûye.''*

Her ku bandora TTP'ê di nava xelkê de xurttir dibû, pêxwas û sûcdarên piçûk jî tev li Talîbanê dibûn. Armanca wan ew bû ku xwe ji cezakirina Talîbanê biparêstana lê belê herweha bi xêra wê, ew ji çekên wê û peywendiyên wê yên xurt jî îstifade dikin da ku raqîbên xwe û xelkê bi temamî ji xwe bitirsînin.

Dîsa jî, li gora şiroveya xwe ya îslamî ya tund, Talîbanên herêmê çûyina keçikan ya dibistanan qedexe kir û ji sedî zêdetir dibistan jî dan ber bombeyan; vê yekê piştgiriya ku xelkê dida wan kêm kir – TTP'ê bi xwe jî bi berdevkiya Mele Omar nîşan da ku ew ne piştgirê van celeb biryaran e.

Bi armanca kêmkirina bandora TTP'ê, hikumeta paştû ya Sînorê Bakurê Rojavayî di sala 2008'an de Muhammed serbest berda. Hikumetê bi awayekî fermî dev ji şîddetê berda û di encama hevdîtinan de, di sibata 2009'an de, li gora peymanê, Nîzama hiqûqa îslamî jê derket: dijminahî xelas bû û sîleh hatin danîn û Dewleta Federal dadgehên îslamî yên şerîetê jî pejirandin. Ev peyman heta 14'ê Nîsana 2009'an jî ji aliyê hikumeta navendî ve bi rêya parlamentoyê ve nehat qebûlkirin û

* *Rojnameger û yek ji damezrînerên malpera "Pulse"*

piştî derbasbûyina bayê normaliyê, diyar bû ku aşîtî dîsa jî nehatiye geliyê Swatê; ji ber ku herdu aliyan jî xatirê wê peymanê negirt û sozên xwe negirtin.

Nirxandinên rojavayî û hevalên wan yên li vî welatî di cih de li dijî qanûnên nû derketin û ew rexne kirin: wan da xuyanî ku Pakîstan hatiye devê newalekê ku hindik maye ku hemû hêza wê ya nukleer bikeve destê Talîbanên ku gihiştine heta bi sedf kîlometreyan dora paytextê. Zexta li ser Îslamabadê her ku çû zêdetir bû. Meha gulanê, gava ku milîtanên TTP'ê êrîşeke provakator bi mitoran bir newala cîrana Bunerê, medyayê ev bûyer weke destpêka meşa bi ser paytextê ve nirxand û ji ber wê, tankan ajot ser wan.

Artêşê ew milîtan ji herêmê derxistin, lê belê, ji ber vê operasyonê sê milyon sivîl ji cih û warên xwe bûn. Gellek ji wan kesên ku nereviyan di nava bombardimanan de hatin kuştin. Nûneriya Neteweyên Yekbûyî ya penaberan (UNHCR) ev bûyer şermezar kirin û bal kişand ser ku ew bi zorê dikare çarîkeke alîkariya pêwîst bi cih bîne. Pirraniya penaberan li cem malbatan, li cem nas û dostan an jî li cem dilxwazan hatin bicihkirin. Hikumetê tu alîkarî û çareserî pêşniyar nekirin û pirraniya alîkariyên ku ku jî derve hatin jî ketin bêrîka siyasetmedarên bertîlxwir. Birêvebirên Sîndhê û yên Pencabê li rojhilatê Pakîstanê gellek astengî danîn ber ku penaber nikaribin bên û li herêmên wan bi cih bibin – vê yekê jî hêla şerrî ya etnîk derxist holê, lewre Paştûyan bawer kir ku armanca van hemû bûyeran civata wan bi xwe ye.

Lê belê, rewş ne weke ya dema operasyonên leşkerî yên bi ser herêma eşîran de bû, lewre vê carê operasyon ji aliyê xelkê Pakîstanê ve hat pejirandin (li gora gellek sondajên ku havînî hatin pekanîn, piştgiriya xelkê % 41 bû (3)) û ji aliyê birêvebirên siyasî, artêş û medyayê ve weke serkevtinekê hate hesibandin. Hemûyan digot ku pêwîst e ku şerrê milîtan û xerabkaran li Malakandê were kirin, lê belê dîsa jî kesî ji wan zordarî nediparast. Rahimulah Yusufzayê rojnameger ku nirxandêrekî navdar e, dide zanîn ku, *''karîbûn rê li ber [şerrî] bigirtana, lê belê Pakîstan ne hêzeke azad û serbixwe ye. Dewletên yekbûyî û welatine din zor li Pakîstanê kir û ji ber gellek sedeman jî hikumetê li ber xwe neda.''* Li gora wî, milîtan, tu carî, ne ji bo welêt û ne jî ji bo hêza wî ya nukleer nebûbûn gef: *''Hikumet bi xwe jî dibêje ku ji pênc hezaran zêdetir Talîban tunene; geliyê Swatê di destê wan de bû, ketin nava Bunerê jî – ma gelo wê çend zilam di destê wan mabin ji bo meşa bi ser paytextê ve?''*

Nifûsa Pakîstanê sed û heftê û sê milyon e û ji van yek milyon zilam di nava artêşê de ne û herweha hêzên wê yên hewayî yên xurt jî hene. Yasufzay dibêje ku ''Ne Talîbanan karîbû bigirtaya ser paytextê û ne jî armanceke wan ya weha hebû. Ew bi tenê li Malakandê dijiyan; û li wira bi xwe jî, ji heft bajaran bi tenê li sê bajaran bandora wan hebû.'' Herçî Nîzama hiqûqa îslamî ye, erê wê derî li şerîetê vedikir jî – weke peymanên ku herdu hikuletên berê yên laîk jî îmze kiribûn -, ji herdu hêlan jî tawîz dihatin dayin. Axir, hin kes hene ku bawer dikin ku Muhammedî dê karîbûya, bi xêra bandora xwe, ev pirsgirêk çareser bikiraya û cih li tundrewan teng bikiraya.

Kenvewezîr û nirxandêrê pakîstanî Roedad Xan li ser rêyên çareseriyê ku hikumetê danîne ber xwe pirsan jî xwe dike: *''Me tu carî şerrekî ji vî şerrî belasebebtir nedîtibû ku parastina wî û qanekirina wî jî ewqasî dijwar be. Li hember metodên serhildêran yên nehiqûqî, heger mirov bi tenê darê zorê bi kar bîne, zehmet e ku mirov bi ser bikeve: pêdiviya milîtanan pê tuneye ku bi ser bikevin, ew bi tenê dixwazin şerrê xwe dewam bikin.''* Û Rustam Şah Mohamad jî ku nirxandêrekî din e, weha dipirse: ''Heger armanca oprerasyonê şerrê li dijî dijminên Dewletê bûya, diviya rasterast êrîşî wan bikirana. Hingê çima hikumetê pêwîst dît ku hemû herêmê dagir bike? Bi bikaranîna hêza hewayî û bombekirina bê sînor, şik tê de nîne ku tahde dê li gellekî li xelkê were.'' Hikumet bê guman li geliyê Swatê bi ser ket, lê belê, li gora Mohmand, ev dikare bibe serkevtineke weha ku li serê wê bibe bela heger ''sedemên civakî, aborî û siyasî yên ku Talîban ji ber wan derketine neyên çareserkirin û heger hikumet bi berfirehî deverên xerabkirî jî nû ve nede avakirin.''

Nakokiyeke siyasî ya din jî, li gora Yusufzayî, ev e: Girtina endamên *şûrayê* ku komîteya şêwirmendiya Talîbanê ye û berpirsên pakîstanî ew jî bo danûstendinan meha îlona bihurî vexwendibûn. Herweha taktîka ku milîsan li hember Talîbanê çekdar bikin (dijberê ''komîteya hişyariyê'' ya Îraqê) jî nehat hesibandin ku li herêmeke weha, helwêsteke bi vî rengî dikare di ser heyaman re bibe pirsgirêkeke din. An jî, hilweşandina xaniyan ku rejîma pakîstanî li geliyê Swatê dabû ber xwe, lewre xaniyên wê deverê ji aliyê malbatine gellekî mezin dihatin bikaranîn. Xerabkirina malên wan ya ji ber kurekî wê malbatê ku qaçax e, bi tenê dikare bide sedem ku hin endamên din jî tev li serhildêran bibin.

Herçend li herêmê mirov bikare behsa aştiyeke hessas bike jî, ji cerga ku şerr bi dawî bûye û heta nuha, ji dusedî zêdetir gumanbar an jî sempatîzan ji aliyê hêzên ewlekariyê ve an jî ji aliyê milîsên lokal ve beyî lêpirsîneke kûr hatine kuştin; ji ber wê, di nava xelkê de tirseke daîmî heye. Yusufzay dide zanîn ku, *''Erê, berê, xelk ji Talîbanê ditirsiyan, lê belê îroj ew di nava tiseke weha de dijîn ku ew jî ji artêşê tê. Artêş kê bixwaze dikare etîketa Talîbanê bi dû wan bixe.''* Hema hesabê mirov bi kê re hebe, mirov dikare wî bi sempatîzaniya Talîbanê sûcdar bike û giliyê wî bike. *''Xaniyê we hatiye xerabkirin, hûn hatune girtin, û sibê jî termê we diavêjin nava zeviyan. Ziravê xelkê qetiyaye, ew newêrin dengê xwe jî derxin.''*

Meha Çiriya Pêşîn a borî, berî ku operasyona leşkerî li Başûrê Wazîristanê were kirin, çalakiyên Talîbanan zêde bûbûn. Bi pêşengiya Hakîmullah Mesûdê 28 salî, Talîbanan êrîşî Hangû û Kohat û Şangla û Pêşawarê kiribû û bi pirranî xelkê sivîl kuştibûn. Gava ku desthilatdariya navendî bombardimana hewayî zêde kir û rê li ber operasyona artêşa erdê vekir, êrîşên Talîbanan jî gellekî girantir bûn. Sempatîzanên wan yên ku ji Pencabê hatibûn êdî ceger dikir ku êrîşan bibin ser navenda artêşê ya li Rawalpindiyê jî.

Di heman demê de, êrîşên helîkopterên amerîkî jî li herêmên eşîran dewam dikir. Li gora sondajekê ku ji aliyê *The News*'ê (4) hatiye çapkirin, ji nava heftsed û yek kesên ku ji 29'ê Çileya Paşîn a 2008'an heta 8'ê Nîsana 2009'an hatine kuştin, bi tenê çardeh kes bi piştgiriya Talîbanan ve dihatin tawanbarkirin. Bi vî awayî, raya giştî jî êdî şikê ji vê siyasetê dike. (5)

Bi artêşa xwe ya ku derfetên wê ne zêde ne û bi alîkariya Amerîkiyan, Pakîstan hewla siyaseteke weha dide ku Amerîka û NATO'yê nikarîbû li Afganistanê bi cih bikira. Lê belê, operasyonên leşkerî çiqas dewam bikin, herêmên li ser sînor jî dê ewqasî ji bin destê wê derkevin, lewre hejmara kuştiyan zêde dibe û ewlekarî li wan herêman namîne. Serhildanê xwe gihandiye heta herêma derdora Pencabê jî. Lê digel vê jî, elîtên pakîstanî û herweha nirxandêrên rojavayî hê jî hêviya xwe ji tunekirina hemû Talîbanan nabirrin. Dengên ku li dijî şerrî bilind dibin jî di cih de bi sempatîzaniya Talîbanan tên tawanbarkirin.

Vê operasyona leşkerî ya dawîn ku bi bîst û heyşt hezar leşkeran ve li Wazîristana başûr hate birêvebirin, bû sedema koçeke mezin ya nû: ji sê paran parekî xelkê koç kiriye. Digel ku Talîbanan piştgiriya xwe ya di nava xelkê de her ku diçû wenda dikir, nûneriya Associated Press da xuyanî ku penaberên ku nerazîbûna xwe ya li hember hikumetê dianîn zimên diqêriyan û digot *''Bijî Talîban!''* Ji dêlva ku dilê wan û fikra wan qezenc bike, hikumet wan ber bi dijminên xwe ve dişîne; û erê, Talîban zêde nayê hezkirin, lê rewşa hikumetê jê xerabtir e. Fikra ku Pakîstan li ser hesabê Amerîkayê vî şerrî dike hê jî di nava xelkê de heye – êrîşa li Wazîristanê beyî alîkariya helîkopterên Amerîka hate birêvebirin (6).

Li gora rojnameger Siyed Salîm Şahzad, bûyerên van heft salên dawîn eşkere kiriye ku çi cara ku operasyoneke leşkerî li dijî Talîbanê çêdibe, Talîban di encama wan de xurttir dibe. Ew dibêje ku digel ku ji geliyê Swatê derketibûn jî, vaye Talîbanî dîsa lê vedigerin û li hev dicivin; *''gava ku berf bidê û hemû rêyên sereke yên alîkariyê bigire, Talîbanan dê hemû herêmên ku berê ji dest dabûn ji nû ve xistibin destê xwe''* (7). Hêviya medyayê û ya nirxandêrên rojavayî jî ji ber vê rewşê kêmtir dibe.

Di sala 2002'an de, li Hayatabadê gellek penaberên afgan hebûn. Di nava wan de yên herî xizan li waroşên Kaça Garhiyê bi cih bûbûn ku li ser rêya Camrûd û Xîberê ye. Lê gellek kesên din jî li bajêr ji xwe re dikan vekiribûn û li gellek taxan jî çûyin û hatin û bazirganî di destê van penaberan de bû – havînan hin ji wan ji ber germahiyê diçûn Afganistanê.

Îroj gellek Afgan ji ber sedemên ewlekariyê terka Hayatabadê dikin: li her derê kontrolên leşkerî hene, hejmara kesên ku tên revandin zêde dibe – û, bi tenê ji nîvê meha îlonê heta nîvê meha çiriya pêşîn sê êrîşên xwekuj û çar jî êrîşên roketan pêk hatine.

Roja ku ez bi dengê roketên ku bi ser Hayatabadê dihatin ve hisiyam, roportaja ''Foreing Police'' ya AfPak Channel'ê bi sernavê *''Everything's coming up roses in Pakîstan''* (Li Pakîstanê hertişt bi kulîlkan tê xemilandin) dihat weşandin. Êrîş dixistin stuyê Mangal Bagh Afrîdiyê serokê tevgera qedexekirî Laşkar-e Îslamê. Ev kes berê hevalbendê hikumetê bû û gellek caran hatibû tawanbarkirin ku qaçax û sûcdaran ji Xîberê derdixe û bi vî awayî ji konvoyên NATO'yê re hêzeke parastinê dide peydakirin. Weke ku xuya dibe, hevalbendî zû xerab dibin – ev jî dîsa eşkere dike ku gerek mirov çekan nede milîsan.

Roja piştî van êrîşên Hayatabadê, nanê tennûrê bûbû 15 rûpî, lê belê roja berî wê 2 rûpî bû – digel ku meaşê xelkê weke xwe dimîne, enflasyon û bêkarî her ku diçe bilindtir dibe. Li kolanan, kesî behsa xeteriyên li ser jiyana civatê nedikir: herkesî gazindên xwe bêtir ji buhabûna jiyanê dikir.

Werger ji fransî
İbrahim Seydo Aydoğan

(1) Graham Usher, ''Peywendiyên xeternak li başûrê Asyayê'', Le Monde diplomatique, Çileya Paşîn 2009.

(2) MMA piştî hilbijartinên Sibata 2008'an ji hev belav bû. Bixwîne: Jean-Luc Racine, ''Pakîstan, karê dijwar hê maye », Valîza dîplomatîk, Le Monde diplomatique, 27 sibat 2008.

(3) Sondajên ''Gallup Pakîstan », Islamabad, yên 26-27 Tîrmeh 2009, yên ''Gallup - Al Jazeera'' yên 13'ê Tebaxê http://english.aljazeera.net/focus/2009/08/2009888238994769.html

(4) The News, Islamabad, 10 Nîsan 2009, http://www.thenews.com.pk/top_story_detail.asp?Id=21440

(5) Li welatekî ku şerr lê heye ev rewş dikarin pêk werin, lê li gora sondajeke Gallupê ku tebaxa 2009'an hatiye pêkanîn, % 59'ê Pakîstaniyan bawer dikir ku gefa sereke ji Amerîkayê hatiye, digel ku % 18'ê wan bawer dikir ku sedem dijberiya kevn ya Hindistanê re ye û % 11'ê wan jî (herçend ev hejmar jî zêde bûye) digot ku sedem Talîban in. Herçend sondaj dide zanîn ku % 41'ê xelkê piştgiriya operasyona leşkerî ya li geliyê Swatê dikir jî, % 43'yê xelkê daye zanîn ku ew çareseriyeke siyasî tercîhî operasyona leşkerî dikin.

(6) Julian Barnes û Greg Miller, ''US aiding Pakistani military offensive'', Los Angeles Times, 23 Çiriya Pêşîn 2009.

(7) Syed Saleem Shahzad, ''A new battle begins in Pakîstan'', Asia Times, 19 Çiriya Pêşîn 2009.

DRONE - LI AFGANISTAN

Şerê teknolojîk a Amerîka

LAURENT CHECOLA û EDOUARD PFLIMLIN*

Ulrisch Laderner, (Leşkerekî teknolojîk!) - Efekt LMD kurdî

5'ê Tebaxa 2009'an, berev saet 01:30'ê sibehê, drone'eke (drone: firokeya biçûk a biqumanda) amerîkî du fuzeyên Hellfire (agirê cehnemê) bi ser Laddahê de, gundekî veder ê Wezîrîstana Başûr (Pakistan) barandin. Xaniyê nîşanlêgirtî, xaniyê Mewlana Îkramûddînê berpirsê dînî bû ku dihate zanîn ku piştgiriya Talîbanê dikir. Di nav danzdeh qurbaniyên êrîşê de Beytullah Mehsudê serokê karîzmatîk ê Talîbana pakistanî jî hebû.

22'ê Hazîrana 2009'an, berpirsên amerîkî kuştina Saadê kurê Ûsame Bîn Ladînî ragihandibû lê ji hingî ve ronkirineke zêdetir nehatiye kirin. Herwiha, 1'ê Çileyê, ragihandina kuştina Osama El-Kîniyê serokê çalakiyên derekî yên El-Qaîdeyê ku ji ber berpirsyariya wî ya di êrîşên li dijî balyozxaneyên Amerîkayê yên Kenya û Tanzanyayê di 1998'an de dihate daxwazkirin, bûbû hoy û cihê rizamendiya rayedarên amerîkî. Christine Fairê ji şîrketa Randê û pisporê herêmê, balê dikêşe ser wê hindê ku *''drone tesîreke girîng li têkoşîna li dijî El-Qaîdeyê dikin, lewre bi xêra wan, serok û kesayetên wê yên girîng têne kuştin, endamên wan têne dehfdan berev derveyî herêmên di bin desthilatiya eşîran de û herwiha behre û qabiliyeta wan a operasyonel her tengtir dibe.''*

Ev çend mehên dawî ne ku êrîşên bi firokeyên bêpîlot (bi îngilîzî UAV, ji bo ''Unmanned Aerial Vehicle'') gelek zêdetir bûne li herêmên Pakistanê yên eşîrkî. Milîsên El-Qaîdeyê, Talîbanên efxanî an jî pakistanî... drone, bi bihayekî kêm, şerekî bêwest û rawest dikin li dijî hemû serhildêran. Û bêguman jibeynbirina dijminê pakistanî yê herî mezin bûye nimûneya herî eşkere ji bo serkeftina vê stratejiiyê, ku jixwe gelek hedefên ''pir girîng'' jî li ber ketibûn.

Lê belê, serkeftina nisbî ya van êrîşên nîşangirtî, ku di 2004'an de li Pakistanê dest pê kirin, herwiha bû binasê gelek ziyanên duqolî jî. Êrîşên ku ji serê salê ve gelek zêdetir bûne –heftiyê êrîşek–, bû binasê wê hindê ku hejmara kuştiyan, sivîl, serhildêr û berpirsên girîng ên terorîstan hemû di nav de, bigihe çarsed û sî û du kesan (netîceyên heta 30'ê Îlona 2009'an). Bi tenê di Hazîran-Tîrmeha 2009'an de -qonaxa herî xwînî-, sed û pênceh kes hatibûne kuştin, di halekê de ku sala 2008'an, sî û şeş êrîş bûbûn sebebê kuştina sêsed û hevdeh kesan. Hedefa yekem a drone'an, ew herêma çiyayî ya Başûrê Wezîrîstanê, li Rojavayê Pakistanê ku Mela Nezîr, Mehsud û cemaeta Haqqanî, navê kevnefermandarekî afganî, lê desthilatdar in.

Çend hezar kîlomêtre dûr ji wê derê, ji binkeya Creechê re li Nevadayê (Dewletên Yekgirtî), Central Intelligence Agency (CIA) drone'an bi rê ve dibe. Menzilekî dorgirtî û teng, pir ji ekranan, klawyeyek û joystickek (destikê ji bo yariyên vîdyoyî)... Cîhaneke bêtirs û bêrîsk e ku ev pîlot van firokeyan lê bi kar tînin. Bi gewdeyê xwe yê dirêj û zirav, berev pêşiyê ve fitilok ji bo wergirtina antena satalaytê, bi perrên xwe yên teng û serikên wan ên xwar, ev firoke dişibine kêzikên bêmirês û nerihetker.

Ev şerê ji dûr ve kêşeyan durist dike: *''Ev cûre şer, 'kiryara nihayî' ya şervanan, yanî kuştinê (...) bi temamî diguhore. Gelo şerê bi van firokeyên drone da-*

* Rojnamevan

negeriyaye kiryareke banal a ofîsê, hetta yariyeke vîdyoyî? Pentagon, pîlotên xwe, bo çar heta şeş heftiyan, bi awayekî pîlankirî dişîne ser meydana şerî da ku rê nede rîska rûdana reftarên xemsar û ziyandar.” (1)

Lê belê, meseleya rîska xemsariyê di rastiyê de meseleyeke duhemî ye, pêşî xemên aborî hene : perwerdekirin û gihandina pîlotekî şerî li 2,6 milyon dolaran li ser Amerîkayê dibe mal, lê ji bo pîlotekî firokeyên drone bi tenê 135 hezar dolaran dimezêxin. (2) Lê kêşe ne tenê ev e.

Micah Zenkoyê pisporê polîtîkayê ji saziya Council on Foreign Relations [Lijneya Pêwendiyên Derekî] dibêje ku *“ji cerga havîna 2008’an, rêveberiya Bushî biryar girtibû ku CIA’yê veguherîne hêzeke hewayî ya dijserhildêr ji bo alîkirina hikûmeta Pakistanê “*. Û di dirêjiya axaftina xwe de dibêje ku *“êrîşên CIA’yê bi dizîka ne, bi vî awayî rêveberî xwe ji ihtimala genge-şeyeke rasteqîne li ser karîgeriya wan diparêze”* . Herwiha diyar bû ku şirketa ewleyiyê ya taybet Blackwater, ku navê wê di nav gelek skandalên li Îraqê de hatibû, û ji hingî ve wekî *Xe* binavbang bûye, hinek erkên têkildarî drone’an bi awayekî pir bi dizîka û deryasayî bi cih tîne. (3)

Avantaja drone’an ji serbixweyiya wan tê. Yên herî zêde têne bikaranîn Predator’ên bi navê MALE (Moyenne altitude longue endurance [Bilindahiya navîncî karîgeriya dirêj]) in ku şirketa General Atomics wan çêdike. Drone’eke MQ-1 Predator A dikare zêdetir ji 24 saetan li hewayî bisekine, yanî gelek dirêjtir ji firokeyeke şerî, û bi vî awayî bide dû liv û bizavên dijminî. Herwiha, yeke MQ-9 “ Reaper “ (daskêş, merg), ku du caran ji wê mezintir û çar caran jê girantir e (4,7 ton) û deh caran jê zêdetir dikare çekan hilgire, bi dû re diçe û destekê didê. Yeka wan 8 milyon dolaran e, anku gelek erzantir ji firokeyeke şerî. Modêla dawî, Predator C “Avenger” [tolhilder], bi xêra reaktora xwe xwedanê lezeke 740 km/s ye beramber 400 km/s ya “Rea-per“ê.

Bi vî awayî, rayedarên amerîkî di nav çend salan de bûne muptelayên firokeyên bêpîlot. Di navbera 2002 û 2008’an de, hejmara drone’ên wan, ji sed û şêst û heft firokeyan gihişte zêdetir ji şeş hezaran. Herçend ev enflasyon serê pêşî ji ber zêdebûna hejmara modêlên sivik be jî, ku naskirin û teşxîspêdanê hêsan dikin, mîsîlavêj jî têra xwe zêde bûne. Sala 2002’an, hejmara Predatoran bîst û du bû, lê sala 2008’an ew hejmar gihiştibû sed û nehan ; û herwiha divê bîst û şeş Reaper jî li wê hejmarê bêne zêdekirin. Bi daneyên raportekê ku Çileya 2009’an hatiye amadekirin diyar dibe ku di 2008’an de sercemê firokeyan qederê çarsed hezar saetan firrîne, anku bêtir ji du caran zêdetir ji hejmara saetên sala 2007’an.

Dewletên Yekgirtî her zêdetir çavkaniyên xwe terxan dike ji bo wan. Bo sala darayî ya 2010’an, rêveberiya Barack Obama 3,8 milyar dolar danîne ji bo pêşxistin û kirrîna drone’an, bi taybetî ji bo kirrîna bîst û çar Reaperan bo US Air Force’ê [Hêzên Hewayî yên DYE’yê] û pênc Global Hawk’an. Ev hemû zêdeyiya di wî warî de hevaheng e digel zêdebûna budçeya leşkerî ku di navbera 2002 û 2008’an de bi rêjeyeke % 74mezintir lêhat û gihişte 515 milyar dolaran. Bi taybetî, ji 2001’ê ve, pereyê ku ji bo robotên leşkerî tê terxankirin her sal du beramber zêde dibe, bi vî awayî rê li ber avabûna endûstriya robotên leşkerî vedike *(beşê di nav çarçoveyê de bixwîne)*.

Predatoran li binkeya bêbalûpal a Kandaharê, li başûrê Efxanistanê, bi kar tînin. Ji cerga lihevhatineke zimnî di navbera George W. Bush û Pervez Muşerrefê kevne-serokdewletê Pakistanê de, şik heye ku Washington ji binkeyên Pakistanê jî Predatoran bişîne. Imtiaz Gulê berpirsê Center for Research and Security Studies li Islamabadê wisa bawer e ku *“digel mirina Mehsudî, baweriya bi rêxistina Talîbanî bêtir şkestiye, û herwiha di navbera Dewletên Yekgirtî û Pakistanê de jî hevka-riyek berçav e.*” Christine Fairê ji Rand Corporationê dibêje ku *“artêşa Pakistanê doza drone’an û îmkana pêlîkirina tetîkê kir. Pakistanî qet nebe di çarçoveya pensîban de dijatiyê li êrîşên drone’an nakin, her wekî ku berê jî nedikirin.”*

23’yê Çileya 2009’an, bi tenê sê roj piştî dewr-girtinê, xelatgirê Nobela aştiyê fermana êrîşan da bi ser herêmên eşîrkî yên Pakistanê de. (4) Di êrîşa yekem de, li bakurê Wezîristanê, heşt kes hatine kuştin, û bi tenê piştî çend saetan, vê carê li başûr, heft kesên din hatine kuştin. 30yê Îlonê, sî û neh êrîşan li Pakistanê dabû, di demekê de ku di tevahiya sala 2008’an de, sî û şeş êrîş bi ser Pakistanê de hatibûne birêvebirin. Joseph Henrotinê pispor, balê dikêşe ser wê hindê ku *“Bush, derbarê Pakistanê de bitemkîn bû. Ji bo Obama û ekîba wî, kêşe giştî û berfireh e. Diyar e hêza agirî bi şêweyekî tê radîkalîzekirin: tiştê ku dikin “lêgerrîn û herifandin” e û herwiha li dû “mafê nêçîr û kuştinê” ne.”* (5)

Ji sala 2008’an ve, desthilata amerîkî hewl dide ku bi heceta bêîmkaniya mudaxelekirina rasterast a bi ser axa Pakistanê, bikaranîna berfireh a drone’an rewa nîşan bide. Serok Bush, ji ber nebûna înîsiyatîfê û ji ber bêbehreyiya rayedarên Pakistanê di kontrolkirina herêmên eşîrkî de bihêrs bûbû û lewma destûr dabû hêzên taybet ku mudaxeleyê li rewşa li Pakistanê bikin. Îlona 2008’an, komeke Navy SEAL’ên li Efxanistanê bicihbûyî sînorî dibezînin û, jin û zarok jî têde, qederê bîst kesan dikujin. Rayedarên Pakistanî bi zimanekî tund êrîş şermezar kirin û dane zanîn ku dexaleteke din bi tu awayî xweş nabînin. Û di encamê de Serok Obama dest ji wê derê kêşabû.

Diyar e firokeyên drone bi berfirehî cih digirin di nav pîlanên dahatûya artêşa amerîkî de. Wekî ku Henrotin diyar dike, *“ew dibe alîkarê leşkeran”*, lê *“cihê wan nagire.”* Li gorî raporteke US Air Force’ê (USAF), di 23’yê Hazîrana 2009’an de pêşkêşkirî, hêzên hewayî *“bi şêweyekî bêne bicihkirin ku bi-karin bi wan sîstemên drone’an kar bikin ku her bêtir serbixwe ne, modûler [destxweş ji bo ve-rêkxistina bi şêweyên cihê] û saxlem in û dikin ku hêzên leşkerî hêsantir xwe li şert û mercan biguncînin; bi vî awayî karîge-riya hêzên hewayî yên sedsala XXI’an dê bigihe asta xwe ya herî bilind.”* Raport herwiha eşkere dike ku *“drone wekî alternatîfekê têne hizirîn ji bo rêzeke wezîfeyên ku ji berê ve mirov bi cih tînin.”*

Gelo dê bigihe heta wê dereceyê ku cihê pîlotên şerî jî bigirin? Ihtimala vê yekê heye. Belgeya USAF’ê balê dikêşe ser wê hindê ku *“drone dê di dahatûyê de şikl û şêweyekî nû bidin qada şerî.”* Helbet ihtimala pêkhatina gelek netîceyên cihê jî heye û ew ihtimal pir ji şer û kêşeya Efxanistanê wêdetir in, ji ber ku tê heye ku ew drone di dahatûyê de barên nûkleer jî hilgirin. (6)

Hinek welatên din jî ber-nameyên drone’ên şerî an jî UCAV’ê (Unmanned Combat Aerial Vehicle), ku bi taybetî ji bo reşandina erdî û bombebaranê hetta ji bo lêkdanên hewayî hatine sêwirîn, dane ber xwe. Li vir jî dîsa Dewletên Yekgirtî li pêş e, nemaze bi projeya bombeavêja X-47 B ya Northrop Grummanê.

Berfirehkirina bikaranîna drone’an bi fonksiyonên din ên “ewleyiyê“, wekî têkoşîna li dijî tiryakê an jî penaberên qaçax jî herwiha bi awayekî ciddî tê pêşdîtin. Drone, li Franseyê ji bo operasyonên çavdêriyê hatine bikaranîn: bo nimûne, ji bo teqezkirina ewleyiya rêvingiya resmî ya Papa Benoit XVI li Lourdesê di berwarên 14 û 15 Îlona 2008’an de. Wan heyamên dawî, drone’eke biçûk a bi navê Elsa di ser esmanê Strasbourgê re firiya di hengava civîna NATO’yê de. (7)

Halê heyî, tesbîtên derbarê van firokeyan de divê bike ku rayedar hem ji aliyê operasyonel û hem jî ji aliyê stratejîk ve dîsa bihizirin. Gelo êrîşên nîşankirî bi rastî karîger in? Serhildêr, çi li Efxanistanê çi li Pakistanê, ji ber wan her bêtir bi hêza xwe bawer û serbilind dibin ji ber ku wisa dizanin ku dijminê wan newêre leşkerên xwe bişîne ji bo dana xwîna xwe. Û, piştî mirina Mehsudî, jêrsaziya terorîst, li ser 27 hezar kîlometreqare xaka herêma eşaîran, her wekî şert û mercên aborî û civakî yên tundrewiyê pêş dixin, mîna berê dimînin. (8) Li rexekî din, ev êrîş nerihetî û dijminiya gelê Pakistanî bihêztir dikin. Raya giştî, ku jixwe rêveber û desthilatdaran bi bêrêtî û gendeliyê tawanbar dike, gef û êrîşeke li ser meşrûiyeta desthilata neteweyî dibîne di van kiryaran de. Û di demekê de ku piraniya mezin a welatên cîhanê kredî û baweriyeke tekûz didine Dewletên Yekgirtî û Obama, li Pakistanê, piştgirî û raya bo serokdewletê nû, bi tenê pîçek ji dereceyên pir-kêm ên George W. Bush bilindtir e. Micah Zenko digihe wê qenaetê ku *“drone çareyeke destxweş e, lê belê wan meseleyên kûr çareser nake ku çareserkirina wan wext pê divê.”*

Wergera ji fransî
Ergîn Opengîn

Hema bêje pavaneke amerîkî

Şirketên amerîkî (Northrop Grumann û General Atomics) nêzîkî % 80’yê drone’ên ku li sertaserê cîhanê têne firotin çêdikin. Ev herdu şirket jî Global Hawk Drone’ên predator (ku dikarin durist sî û şeş saetan bifirrin û zêrevaniyê bikin) çêdikin.

Şirketên ewrûpayî (Thales, EADS, Dassault, Finmeccanica, Sagem, BAE Systems…) bi tenê % 4 û şirketên îsraîlî % 2’yê wan çêdikin.

Şirketên Rûsya, Hindistan, Îraq û Çînê xwediyê pareke % 5 in û nêzîkî % 20’ê wan, bi pênavê “raza leşkerî”, bi girêbestên nihênî têne firotin.

Diyar e ka Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê çend di rewşeke pêşeng de ye. Herwiha, ji bo deh salên tên, 62 milyar budçe hatiye terxankirin.

Di piyaseya drone’ên wekî Hale û Global Hawk de jî Amerîkî zal û serdest in. Herwiha bazara Global Hawkên NATO’yê jî di destên wan de ye. Di paşerojê de reqabeta eslî dê derheqê Male Drone’an de be. Du şirket reqabeteke xeşim dikin li dijî hev: yek EADS, ya din jî şirketa Spanyayê SDM. Di vê bernameyê de 2,8 milyar dolar hene: 1 milyar ji bo pêşxistinê û 1,8 milyar ji bo amrazên firrokeyan. Warekî din ê pir girîng jî UCAV (drone’yên şerî) e.

---

(1) Martin Crag, “Drones : le nouveau jeu de la guerre ” [Drone: yariya nû ya şerî], Hors-série Science & Vie Spécial Aviation, Parîs, 2009.

(2) Frédéric Lert, “ Drones recherchent pilots ” [Drone li pîlotên xwe digerrin], di heman berhemê de.

(3) Li ser vê mijarê vê gotarê bixwîne : “ Dans l’attente des drones civils ” [Li benda drone’ên sivîl], Air & Cosmos, Parîs, n°2187, 25 Îlon 2009

(4) “ CIA said to use outsiders to put bombs on drones “, New York Times, 20 Tebax 2009.

(5) Tim Reid, “ President Obama ‘orders Pakistan drone attacks “, Timesonline, 23 Çile 2009.

(6) Jospeh Henrotin, La technologie militaire en question. Le cas américain, [Teknolojiya leşkerî li jêr pirsyaran. Nimûneya amerîkî] Economica, Parîs, 2009.

(7) Nathan Hodge, “ Unleash the nuclear-armed Robo-Bombers “, Wired, 3 Hezîran 2009.

(8) Bixwîne, Najam Sethi, “Le Pakistan se retourne contre les talibans” [Pakistan li dijî Talîbanê radibe], Le Monde diplomatique, Hezîran 2009.

PIRTÛK

Gelo El-Qaîde bêhêz dibe?

Sê kitêbên girîng (1) ji bo têgihiştina werar û rûdawên cîhana hevçerx bi hev re hatine belavkirin; her sê nivîskar jî bi zimanê gelên ku bi meseleyên wan ve dadikevin dizanin (xalek ku gelek caran tê piştguhkirin). Jean Pierre Filiuyê dîplomatê bisporê ziman û kultûra erebî, profesorê Science Po'yê [zanîngeha zanistên siyasî li Parîsê] di Kursiya Rojhilata Navîn de, di kitêba xwe de dewama lêkolîna xwe ya li ser îdeolojiya cîhadbaweran [cîhadîst; misilmanên ku bawerî bi cîhadê tînin] pêşkêş dike (2). Les neuf vies d'Al-Qaida [Neh jiyanên El-Qaîdeyê] kawdan, mezinbûn û jêkbelavbûna rêxistinê qiset dike û her qonaxekê di nav qewimînên mezin ên navneteweyî de bi cih dike. Nivîskar nîşan dide ka rêxistinê çawa şer di warê înternetê de dîsa bi rêk xist lê di heman demê de hêz û desthilata xwe ya li ser zevî û zemînê jeografîk ê rasteqîne ji dest da; lewre ji ber tundrewî û serhişkiya xwe ya bîrî nema dikarî ji bilî Peştûyistana li Pakistan û Afganîstanê li tu cihekî din bihêwire. Bi ya Filiuyî, têkçûna El-Qaîdeyê li hember berxwedana nasyonalîst (sunnî) li Îraqê xaleke werçerxê bû. Bêdengî û pûtepê- nedana cîhana erebî bo gotara siyasî ya Bîn Ladînî û herwiha qebûlnebûna wî li bal piraniya misilmanan nîşanên teqez ên bê- hêzketineke xeşîm in.



Nivîskar sê senaryoyan lêkdide (hilweşiyan, parçebûn û êrîşa hêzên derekî) û bi tenê di halê êrîşeke li dijî dewleteke misilman de ihtimalê dide vesazkariyeke muhtemel a rêxistinê. Lê belê, stratejiya bombebarana hewayî ya bi ser Bakurê Pakistanê ji aliyê dewletên yekgirtî ve û ya bi ser gundên Afganî ji aliyê hêzên NATO'yê ve, herçend bi ya Filiuyî ''tearûz'' nebe jî, nabe sebebê dîsa piştgirîkirina li El-Qaîdeyê?

Qutbûna El-Qaîdeyê ji cîhana misilman herwiha mijara *L'Absolution*'ê [*Bexşîna gunehan*] ye ku Ayman Al-Zawahiriyê [Ayman El-Zewahîrî] duye- mîn kesê herî girîng ê El-Qaîdeyê nivîsiye û Jean-Pierre Milelli ew wergerrandiye. Wergêrê navhatî hewl dide deqên bingehî yên di nav mij û ewran de berdest bike û yekem berhema di wê rêzê de, bi kitêba *Al-Qaide dans le texte* (3), sala 2005'an belav bûbû.

L'Absolution bi şêweyê bersivekê ye bo berhema Seyîd Îmam El-Ezîz ya bi navê *Manifeste d'orientation du djihad en Egypte et dans le monde* [*Manîfestoya meyla cîhadparêz li Misr û li cîhanê*]. Ev kitêba ku di mijdara 2007'an de derketiye, rexne li çalakî û têkoşîna rêxistinê digire. Nîqaşa di kitêbê de zeîf û nivîşkan e lê belê destnîşan dike ku El-Qaîde ji rêya gelek alimên baweriya misilmaniyê dûr ketiye. Cihê mixabiniyê ye ku têbînî û şîrove lê nehatine kirin da ku nîqaşa teolojîk bêtir têgihiştinbar bikirana.

Le retour des talibans [*Vegera Talîbanê*] berhema Ahmed Rashidî ye ku navhatî yek ji çend bisporên vê rêxistina şagirdên rêya dînî ye û heta niha gelek berhemên xwe ji bo lêkdana wê rêxistinê terxan kirine (4). Bi ya rojnamevanê pakistanî, sê hoy karîger in di vegera wan de. Pêşî, korî û nebînayiya rayedarên emerîkî ku, piştî serkeftina xwe ya cotmeha 2001'ê, bi lez û bez hêz û bala xwe ji Afganistanê dane alî ji bo xatirê pîlanên xwe yên li ser Îraqê. Ew axa û begên şerî ku alî wan kiribûn di şerê li dijî talîbanan de, bi derçûna emerîkiyan dîsa hêz û desthilata xwe bi dest xistibû. Paşî, Hemîd Karzaî, ku serokdewletê resmî ye, bi wan re li hev tê, bi taybetî bi tucarên tiryakê re. Axirî, durûyiya daîmî ya Pakistanê û artêşa wê, ku hemû bal û hizra wê li ser Hindistana reqîb e, kirin ku Îslamabad alî talîbanê (hevalbendên wê yên herî dilsoz) bike da ku talîban li ser erdê wê xwe dîsa bi rêk bixe; û di heman demê de bi dewletên yekgirtî dida bawerkirin ku wê bi xwe jî gelek hewl dida ji bo girtina Bîn Ladînî. Tehlîla Rashidî tevahiya As-yaya Navîn bi xwe ve digire û kurteya netîceyên wî cihê nerihetiyê ne, lewre nîşan dide ku herêm dibe warê bicihbûn û bihêzbûna komên tundrew.

Ev kitêb hemû ji pêla serdest cuda dibin; lewre medya bi temamî di bin tesîra bisporên bazara reşbînî û felaketbêjan de ye. Divê em hewlên van du weşanxaneyan (Milelli û Delavilla) pîroz bikin ku deqên ciddî û belgekirî belav dikin li ser meseleyên aloz û dijwar. Lê belê, layenek dimîne ku bi têra xwe pûte pê nayê dan: artêş û dînamîkên wê. Diyar e divê li Fransayê jî mîna li Brîtanyayê navendeke War Studies [Lêkolînên Şerî] bê avakirin da ku ev tehlîl bikarin tesîr û tevkariyekê li prosesa dariştina siyaseta giştî bikin. Berhema Patrick Porterê ji Akademiya bergîriyê (London), *Military Orientalism*, digel beşeke balkêş li ser Afganistan û Talîbanê numûneyeke baş e di wî warî de. (5)

PİERRE CONESA

Wergera ji fransî Ergîn Opengîn

(1) Jean Pierre Filiu, Les Neuf vies d'Al-Qaida, Fayard, Parîs, 2009, 368 rûpel, 20 euro. Ayman Al-Zawahiri, L'Absolution: Des oulémas et des moujahidines de toute accusation d'impuis- sance et de faiblesse, Milelli, Parîs, 2008, 250 rûpel, 25 euro; û Ahmed Rashid, Le Retour des talibans, Delavilla, Parîs, 2009, 379 rûpel, 18,05 euro.

(2) Bo nimûne bixwîne, Les Frontières du jihad [Sînorên cîhadê], Fayard, Parîs, 2006 (nivîsareke nirxandinê di Le Monde diplomatique, Çileya 2007).

(3) Di bin dîrektoriya Gilles Kepel, Presses universitaires de France, Parîs, 2008.

(4) Bo nimûne bixwîne, L'Ombre des talibans [Siya Talîbanan], Autrement, Parîs, 2001.

(5) Hurst & Company, Londres, 2009, 263 rûpel, 14,99 paûnd. Herwiha vê gotara wî bixwîne ''Surprenante souplesse tactique des talibans en Afghanistan'', Le Monde diplomatique, mijdar 2009.

Le Monde Diplomatique kurdî
Ji aliyê Rûdaw Media GmbH ve tê weşandin

Edîtorê giştî
Faysal Dağlı

ALMANYA
Le Monde Diplomatique kurdî (kurmancî)

Designer
Mehmet Nazmi Demir

Şêwirmenda weşanê
Berîvan Aymaz

Rêvebirê hunerî
Hasan Hüseyin Deveci

Werger
İbrahim Seydo Aydoğan, Nurettin Akad, Cemil Denli, Ergîn Opengîn, Lokman Turgut

Asîstant
Semra Polat
Sharo İbrahim Garip

Tlf: 00 49 (0) 221 26 00 40 02
Fax: 00 49 (0) 221 26 00 49 81
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya

KURDISTAN
Le Monde Diplomatique kurdî (soranî)
Ji aliyê Rûdaw Media Company ve tê weşandin

Edîtora beşa soranî
Nazend Begîkhanî

Rêvebirê hunerî
Husên Hîmatî

Designer
Baxtiyar Mistefa

Werger
Muhsîn Ahmed, Amir Ahmad, Hardy Mohammed, Kawa Dastoorrah, Mesûd Diryaz, Ahmedê Mela

Asîstant
Selam Sadî

Tlf: 00 964 (0) 750 488 56 96
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media Company
Caddeyî 100 Metre, Hewlêr, Kurdistan / Îraq

FRANSA
Le Monde Diplomatique

Damezrêner
Hubert Beuve-Méry

Rêvebir
Serge Halimi

Sernûser
Maurice Lemoine

Cîgirên sernûser
Martine Bulardi, Philippe Rivière, Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh, Mona Chollet, Pierre Rimbert, Dominique Vidal

Rêvebirê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand, Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon, F-75013, Paris

ABONETÎ
Rudaw Media GmbH
Deutsche Bank
Konto: 245016101 - BLZ: 37070024
IBAN: DE21 37 07 00 24 02 45 0161 01
BIC: DEUTDEDBKOE
Almanya:
Salane: 40 Euro - 6 meh: 20 Euro
Dervayê Almanya:
Salane: 50 Euro - 6 meh: 25 Euro